12 - 13
Buhar-Havîn
2024

# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

- ÇEKÊN KÎMYEWÎ Û QIRKIRINA KURDAN
- SERKEFTINA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ NIVÎSANDINA DÎROKEKE NÛ YE
- ALOZÎYÊN DERXISTÎ YÊN LI ROJHILATA NAVÎN Û RÊGEHÊN WÊ
- QIRÊJÎYA JÎNGEHÊ Û ASOYÊN WIZEYA BERDÊL



Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Rakan Şêxî**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (12-13) Buhar-Havîn – 2024**

**NAVEROK**

**Gotina hejmarê ............................................................................ 4**

**Çekên kîmyewî û qirkirina Kurdan ....................................................... 5**

**Serkeftina Rojavayê Kurdistanê nivîsandina dîrokeke nû ye.................. 30**

Kurdyar Dirêî

**Alozîyên derxistî yên li rojhilata navîn û rêgehên wê ............................ 44**

**Qirêjîya jîngehê û asoyên wizeya berdêl.............................................. 83**

## GOTINA HEJMARÊ

**Xwendevanên hêja:**

Ev jimar, bi beşa duyem a lêkolîna **"Çekên Kîmyewî û Qirkirina Kurdan"** ku li ser bikaranîna çekên kîmyawî li dij gel, berxwedan û şoreşên kurdan li seranserî Kurdistanê di sedsala dawî de ta dema niha, her wiha peymanên navneteweyî yên têkildarî qedexekirin û sûcê bikaranîna van çekan.

Jixwe ji bo kurd ji rewşa komkujî û talankirinê rizgar bibin, pêwîst e derfetan çêkin, rewşa Rojavayê Kurdistanê piştî alozîya Sûrîyê, kurdan derfeteke mezin bi dest xistin; çi ne, dê çawa werin parastin û pêwîstîya bi şerê gelê şoreşgerî. Ev mijar di lêkolîna **"Serkeftina Rojavayê Kurdistanê Nivîsandina Dîrokeke Nû Ye"**, tên şirovekirin.

Êdî ev alozîyên ku Rojhilatê Navîn jiyan dike, nivîsa bi navê **"Alozîyên_Derxistî_Yên_Li_Rojhilata_Navîn_Û_Rêgehên_Wê"**, digire dest ku van alozîyan ji hêla pênase, taybetîyên giring, ravedavên giring, lêkolîn dike.

Êdî di dawiyê de nivîsa **"Qirêjîya Jîngehê û Asoyên Wizeya Berdêl"** ku wizeya rokê weke berdêla wizeya şewatek û pêwîstîya bikaranîna wê, lêkolîn dike.

**Sernivîser**

# ÇEKÊN KÎMYEWÎ Û QIRKIRINA KURDAN

(2 ji 2)

**Bikaranîna Çekên Mîkyewî Li Bakurê Kurdistanê:**

Ji nêzîka sed salî ve, ferwerîyên Tirkîyê yên li dû hev, alîyê herî zêde ne ku der heqê kurdan de çekên kîmyewî bi kar anîne, nemaze di dema serhildanên kurdî yên li dijî mêtingerîya desthilatdarîyên Tirkîyê de. Jixwe heya niha hîn jî li dijî şervan û sivîlên kurd bi kar tîne. Gava ku em li zanyarîyên ku ji dîmenan, hevdîtinan, govanîyên belgekirî, nîşaneyên heyî, bermahîyên cebilxaneyê, raporên navdewletî yên weşandî, belgenameyên ferwerî, daxuyanîyên ferwerîyan, daxuyanîyên kesên têkildarî mijarê û xizmên qurbanîyan, dinêrin û gava ku nirxandineke giştî ji van zanyarîyan re çêdikin û nirxê wê yê tekezbûnê li gorî rêbazeke heyî çêdikin, em digihêjin encamin berhiş ku ev zanyarî li ser bingeha pîvanên rast ên di asta rastîyê de ne ku dewleta tirk çekên kîmyewî bi kar anîne.

**Li jêrê em ê berztirîn pêşhatîyên dîrokî yên ku tê de dewleta Tirk çekên kîmyewî li diji kurdan bi kar anîne, pêşkêş bikin:**

**1. Komkujîya Agirî û Gelîyê Zîlan:**

Hatiye tomarkirin ku dewleta Tirk di dema serhildana Agirî û çemê Zîlanê de, gazên jehrî bi kar anîne û bi hezaran sivîl jiyana xwe ji dest daye. Her wiha gazên jehrî li dijî sivîlên ku xwe li şkeftan girtine, bi kar anîne. Li gor wê jî di reşnivîsa fermanên Derekê de ku sala 1993an[1] hatibû belavkirin, diyar dibe ku “Dersek der barê bikaranîna gazên jehrî li herêmên girtî (şkeft) û herêmên ku xelkê bi awayekî xwezayî diparêzin, di dema serhildana Agirîyê de, ji leşkeran re hatiye dayîn”.

[1] Dr.Nuri Dersimi; Kürdistan Tarihinde Dersim; Anl Matbaasi- Tilel Caddesi/Halep 1952. Linke: https://www.kurdipedia.org/files/books/2013/87781.PDF?ver=130291899930000000

## 2. Komkujîya Dêrsimê:

Bikaranîna gazên kîmyewî di kuşatra “Dêrsim”ê de bi rêya belgenameyên ku vê dawîyê hatibûn belavkirin, hatiye tekezkirin. Li gorî belgenameyên ku Mustefa Kemal Ataturk bi peyva “Nepenî” îmze kirine û piştî wê di rojnameya Dêrsimê de hatin belavkirin; hat eşkerekirin ku 20 ton gaza jehrî ji Almanyayê û balafirên ku wan bombeyan diavêjin ji Emerîkayê kirîne. Her wiha Ihsan Sebrî Çaglayancil ku di wê demê de wezîrê karê derve yê Tirkîyê bû, di hevdîtinekê de bi serokê Partîya Gel a Komarî “Kemal Kiliçdaroglu” re diyar kir ku “Elewîyên Dêrsimê mîna mişkan, bi gaza jehrî hatin jehrkirin”.[2]

Sala 2014an Navenda Lêkolînan a Dêrsimê (DAM) yekem belgenameya der barê bikaranîna gazên jehrî di kuşatra Dêrsimê[3] de, pêşkêş kir. Li gorî wê belgenameya ku dîroka wê 19.02.1942 ye, yek ji serokwezîrên berê, Ibrahîm Refîq Sîdam, di nameyê de ji bo serokê cengê giştî yê wê demê marşal “Fewzî Çakmak” re nivîsîbû ku gazên li Dêrsimê hatin bikaranîn hejmareke mezin a sivîlan kuşt. Her wiha belgenameyên ku her du lêkoleran “Hesnû Kurbay û Mehnûsu Gul” ku di rojnameya Dêrsimê de hatine weşandin, diyar dikin ku gazên jehrî ji Almanyayê sala 1937an hatine wergirtin. Belgenameya yekem daxwazê ji wezareta bergirîya niştîmanî dike ku balafir guleyan bireşînin, bişewitînin û bi bombeyên gazê bifetisînin. Piştî wê çavdêrê giştî yê çarem “Alp Dûcan” nameyekê ji serokwezîr re dişîne û tê de wiha dinivîse: “Daxwaznameya jimar 263 C 27.3.1973 **1-** Kompanîya balafiran îro gihaşt Ezîz û agahî ji me re hatin ku ji trênê derket. Ez dixwazim serokê ferwerîya me yê hêzdar ku erkên me hêsantir dike û me xurt dike, spas bikim. Tişta ku dihêle bêtir em minetdarê te bin ew e ku di her demeke zehmet de tu destekê didî me. **2-** Min bombeyên şewitîner ji fermandarê focê balafiran û bombeyên gaza şewitîner û fetisîner ji bergirîya niştimanî xwestine.

[2] Hüsnü GÜRBEY & Mahsuni GÜL; Zehirli Gazlar Nazi Almanyası’ndan Alınmış!; dersim gazetesi: 15 Mayıs 2019; Link: https://dersimgazetesi.net/editorun-secimi/zehirli-gazlar-almanyadan-bombardiman-ucaklari-amerikadan-alinmis/

[3] Pirha; Dersim Katliamı ile ilgili yeni belgeler ortaya çıktı: Dersim’de Nazi gazları; Yayın Tarihi: 11 Mayıs 2019; Link: https://pirha.org/dersim-katliami-ile-ilgili-yeni-belgeler-ortaya-cikti-dersimde-nazi-gazlari-171973.html/11/05/2019/

Li gor vê daxwaznameyê wezareta bergirîya niştimanî ji wezareta ferwerî û diravîyê pêkarekê distîne û biryareke din a nepenî tê standin…”[4]



dersim GAZETESİ

Yıl: 8 Sayı: 83 Mayıs-Haziran 2019 www.dersimgazetesi.org Fiyatı: 4 TL

ZEHİRLİ GAZ BELGELERİNİ AÇIKLIYORUZ

GAZLAR ALMANYA'DAN


UÇAKLAR AMERİKA'DAN

Bu gazı kullanacak uçaklara da ihtiyaç duyulacaktı. İlk uçaklar Marten cinsi olup ABD'den 1937 yılında 200.000 dolara satın alındı.

Dersim'de zehirli gaz kullanıldığını ilk **Nuri Dersimi** yazmıştı. Daha sonra Türk Dışişleri Bakanlığı, Senato üyeliği ve 12 Eylül 1980 darbesinden önce Cumhurbaşkanlığını vekâleten yürüten **İhsan Sabri Çağlayangil** itiraf etmişti (Çağlayangil 1990). Bugün de Dersim Gazetesi olarak **Hüsnü GÜRBEY** ve **Mahsuni GÜL**'ün araştırmalarına dayanarak tarihe not düşüyoruz.

T. C. MALİYE VEKÂLETİ

***Rojnameya Dêrsimê di hejmara xwe ya 38 gulan\hezîrana 2019an de – Belgenameyên bikaranîna gazê li Dêrsimê – Ji Almanya û Emerîkayê***



31.3.937

T. C. Dahiliye Vekâleti

| Geldiği yer | Tel. No | Tarihi | Şifre Numarası | Gurubu | Açanın adı |
|---|---|---|---|---|---|
| Elâziz | 1337 | 30/3/937 | 845/791 | 1200 | S.Erman |

| Telgrafhaneye verildiği | Tarih | Sa. | Da. | Telgrafhanece alındığı | Tarih | Sa. | Da. |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 30/3/937 | 19 | 35 | | 30/3/937 | 24 | |
| Kaleme geldiği | 31/3/937 | 7 | 10 | Kalemde açıldığı | 31/3/937 | 10 | |

Dahiliye Vekâletine

Yüksek Başvekâlete

T. C. BAŞBAKANLIK CUMHURİYET ARŞİVİ

C:27/3/937 gün ve 263 sayılı yüksek buyruklarına.


1- Tayyare Bölüğü bu gün Elâzize geldi. Çanakkaleden tertibine emir buyurulmuş olan Jandarmaların Balıkesirden bindikleri trenin dün hareket ettiği haberi de alındı. Her sıkıntılı zamanlarda vazifelerimizi kolaylaştırıcı ve bizleri kuvvetlendirici yüksek eli, yardımı yetiştirmekle minnetimizi artıran Hükûmetimizin kudretli başı siz büyüğümüze arzı şükrana müsaraat ederim.

2- Tayyare Alay Kumandanından yangın ve Millî Müdafaa'dan yakıcı ve boğucu gaz bombaları istedim.

***Daxwaznameya anîna gaza jehrî***[5]

[4] Heman jêdera borî.

[5] Dilşa Deniz; Re-assessing the Genocide of Kurdish Alevis in Dersim, 1937-38; Genocide Studies and Prevention: An International Journal 2020; Link: https://digitalcommons.usf.edu/cgi/viewcontent.cgi?article=1728&context=gsp



T. C.
BAŞVEKÂLET
KARARLAR MÜDÜRLÜĞÜ

Dosya işaretleri

Numarası
Tarihi
Yazan memur
Yazı tarihi
Muavin
Beyaz eden
Beyaz tarihi
Karşılaştıranlar
Sadra No.
Merbutatı
Sevk tarihi
Kaydeden
Düşünceler

mahremiyet ve hususiyetine binaen

Gizlidir

KARARNAME

Hava Silâhlanma Programının tahakkukunu temin maksadile muhtelif cins Tayyare bumbaları için muhtelif evsaftaki – Chloracetophenon, İperit ve saire gibi – gazlardan yirmi tonunun ve bunların bombalara konmasına mahsus komple otomatik doldurma tesisatının, Almanyadaki firmalarından, olan 150,000 liranın Almanya ile aramızda mevcut kliring mukavelesi hükmüne göre kliring yolile tediye edilmek şartile ve 2490 sayılı Artırma, eksiltme ve ihale kanununun 46 ıncı maddesinin (K) fıkrası mucibince pazarlıkla satın alınmasına izin verilmesi; Millî Müdafaa Vekilliğinin 26/7/937 tarih ve 871 sayılı teskeresile yapılan teklif ve Maliye Vekilliğinin 5/8/937 tarih ve 3930 sayılı mutalâanamesi üzerine İcra Vekilleri Heyetince 7/8/937 de onanmıştır.

Millî Müdafaa V.
Maliye Vekilliğine
Divanı Muhasebat Re.

Gizlidir

Hava ihtiyaçları için Almanyadan satın alınacak muhtelif Tayyare bumbalarına âit gaz ile bunların bombalara konmasına mahsus Komple otomatik doldurma tesisatının pazarlıkla satın alın-


...İcra Vekilleri Heyetinin kararnamesi sureti gönderilmiştir.

Millî Müdafaa, Maliye Vekillikleri ile Divanı Muhasebat Reisliğine yazılmıştır.

Başvekil n. Müsteşar

***Ew biryar vê yekê di nava xwe de dihewîne: “Ji bo misogerkirina pêkanîna bernameya biçekkirina hewayî dê bîst ton gazên cihêreng -mîna klorasîtofînon, Êbîrît û ji bilî wan- ji bo cûreyên cihêreng ên balafiran, her wiha pergala dagirtina otomatîk a temamkirî ji bo ku bixin wan bombeyan, werin peydakirin. Gava ku ji alîyê pisporê gazê û pisporê hewayî yê di bin destê balyozxaneya me ya li Berlînê de were kontrolkirin, dê ev yek bi rêya kompanîyên li Almanyayê bi pereyin ku ne bêtirî 150.000 lîreyên tirkî ye, were destnîşankirin; ku ev pere dê bi rêya pevguherînê li gorî peymana Meqase ya di navbera me û Almanyayê de û li gor beşa (k) a madeya 46’em a zagona bazaran a jimar 2490, werin dayîn; ew jî ji ber nepenî, taybetî û pêkanbûna kirîna bi rêya lihevkirina nepenî ev yek pêk tê. Pêşnîyara ku di nameya wezareta bergirîya niştimanî ya dîroka wê 26.07.1937 û jimar 871 de û nameya wezareta diravîyê ya dîroka wê 05.08.1937 a jimar 3930 de hatî pêşkêşkirin, encumena cîgiran di 07.08.1937an de pejirand”[6]***

[6] Pirha; Dersim Katliamı ile ilgili yeni belgeler ortaya çıktı: Dersim’de Nazi gazları; Yayın Tarihi: 11 Mayıs 2019; Link: https://pirha.org/dersim-katliami-ile-ilgili-yeni-belgeler-ortaya-cikti-dersimde-nazi-gazlari-171973.html/11/05/2019/



T. C.
BAŞVEKÂLET
KARARLAR MÜDÜRLÜĞÜ
Karar sayısı
2
7208

T. C.
BAŞBAKANLIK
CUMHURİYET ARŞİVİ


Kararname

Hava Silâhlanma programının tahakkukunu temin maksadile muhtelif cins Tayyare bombaları için muhtelif evsaftaki - Chloracetophenon, İperit ve saire gibi - gazlardan yirmi tonunun ve bunları bumbalara koymağa mahsus Komple otomatik doldurma tesisatının Berlin Büyük Elçiliğimiz emrinde Vekâlet Gaz Mutahassısı ile Ateşemiliter veya hava ateşemiz tarafından yapılacak inceleme üzerine verilecek kararla tayin edilecek Almanyadaki firmalarından, tahminî tutarları olan 150,000 lirayı geçmemek üzre Almanya ile aramızda mevcut kliring mukavelesi hükmüne göre kliring yolile tediye edilmek şartile ve mahremiyet ve hususiyetine binaen 2490 sayılı Artırma, eksiltme ve ihale kanununun 46 ıncı maddesinin (K) fıkrası mucibince gizli pazarlıkla satın alınmasına izin verilmesi; Millî Müdâfaa Vekilliğinin 26/7/937 tarih ve 871 sayılı tezkeresile yapılan teklif ve Maliye Vekilliğinin 5/8/937 tarih ve 3930 sayılı mutalâanamesi üzerine İcra Vekilleri Heyetince 7/8/937 de onanmıştır.

7/8/937

REİSİCUMHUR
K. Atatürk

Bş. V. Ad. V. M. M. V. Da. V
Ha. V. Ma. V. V. Mf. V. Na. V. V.
İk. V. S. İ. M. V. G. İ. V. Zr. V.



50
18

T. C.
MALİYE VEKÂLETİ
Bütçe ve Malî Kontrol
Umum Müdürlüğü
Şube : 2
Sayı : 13169/305
Eki 1930

Ankara : 5/8/1937
Zata Mahsustur
gizli ve aceledir

Başvekâlet Yüksek Makamına

I Tezkere

Özü :
Satın alınacak (20) ton gaz ve otomatik doldurma tesisatı hakkında.

Millî Müdafaa Vekâletinden Yüksek Makamınıza sunulup Maliyeye havale buyurulan 26/7/1937 tarihli ve 233/871 sayılı iliçik tezkere tetkik edildi.

Askerî zaruretler dolayisile gizli tutulması lâzımgelen şeylerin İcra Vekilleri Heyetinden karar alınmak şartile pazarlıkla mübayaa edilebileceği 2490 sayılı artırma ,eksiltme ve ihale kanununun 46 ıncı maddesinin (K) fıkrasile (R) fıkrasını takiben gelen bendinde tasrih edilmiştir.

Binaenaleyh,muhtelif cins tayyare bombalarımız için ihtiyaç görülen muhtelif evsafta (20) ton gazla , bunların bombalara konmasına mahsus bir adet komple otomatik doldurma tesisatının ( gizli satın alınması Yüksek Makamınızca da tasvip buyurulduğu takdirde) ( bedeli 150 000 lirayı aşmamak ve Almanya ile aramızda mevcut klering mukavelesi hükûmleri dairesinde tediye edilmek şartile ) Almanya Büyük Elçiliğimiz vasıtasile sözü geçen 46 ıncı maddenin (K) fıkrasına tevfikan Almanyadan gizli pazarlıkla satın alınması için İcra Vekilleri Yüksek Heyetince bir karar ittihazında Maliyece mahzur görülmediğini arzeylerim.

Maliye Vekâleti Vekili

Onay
5.8.37

İcra V. H.ine
5.8.937

BAŞVEKÂLET EVRAKI
Tarih
5.8.37 5576

1 — Bu yazı tarihinde tekid edilecektir.
2 — Her yazımıza ayrı ayrı karşılık yazılması, karşılıklarda yazımızın tarihinin mevcut ile numarasının ve şubesinin gösterilmesi rica olunur.

7.8.937

**Belgenameyin ku guhdana fermandarîya navendî ya Tirkîyê ji bo kirîna gazên jehrî eşkere dikin.[7]**

Yekemîn serokwezîrê Tirkîyê yê ku daxwaznameya jimar 871 dîrok 26.07.1937 a ji bo kirîna 20 ton gazên Klorasîtofînon û Êbrît û ji bilî ji Almanyaya nazî, her wiha kirîna alavên xistina gazan di nava bombeyan de pêşkêş kirî, Kemal Ataturk bû. Roja 5.08.1937an wezareta diravîyê kirîna van gazan bi rêbaza pevguherînê an ku kêm-zêde ku 150 hezar lîreyên tirkî derbas neke, ji Almanyaya ku di wê demê de têkilîyên bazirganîyê pê re geş bûn, pejirand.

Her wiha wezareta bi navê "wezareta bergirîya niştimanî" di 27.07.1937an de daxwaznameyek ji serokwezîr re şand da ku biryar ji alîyê ferwerîyê ve were standin. Li gor wê jî ferwerîya bi serokatîya Mustefa Kemal roja 07.08.1937an daxwaza 20 ton gazên Klorasîtofîton û Êbrît û ji bilî wan ji Almanyaya nazî kir. Daxwazname li ser kirîna gazan û alavên otomatîk ên ji bo xistina van gazan di nava bombeyan de, pêk tê. Êdî wezareta diravîyê rê da ku 150 hezar lîreyên tirkî yên ku wezareta bergirîya niştimanî xwestibû, bi kar bîne. Bi her rewşê, divê balafir jî hebin da ku van gazan bi kar bînin, lewre jî sala 1937an balafirên

[7] Heman jêdera borî.

(Martin) bi qasî 200 hezar dolar ji Emerîkayê kirîn. Her wiha erêkirin li ser girêbesta kirîna topavêjên (Hîngil) bi tevî berikên wê yên bi cûre û mezinbûnên cihêreng hat kirin. Ev hemû jî di bombebarandina Dêrsimê de hatin bikaranîn.

**3. Bikaranîna Çekên Kîmyewî Li Dijî Şervanên Tevgera Azadîya Kurdistanê:**

Piştî ku rewşa hundir a Tirkîyê aloz bû û desthilata lêdana leşkerî çareserkirina doza kurdî nepejirand, her wiha karên qirkirin û pişaftinê der heqê kurdan de dijwar kirin, êdî Pratîya Karkerên Kurdistanê (PKK) roja 15ê tebaxa 1984an têkoşîna çekdarî ragihand. Li beramberî vê yekê jî artêşa tirk bi awayekî nerênî bersiva vê serhildanê da; ew jî bi rêya xurtkirina cebilxaneya xwe ya gazên kîmyewî û ji alîyekî din ve ferman dan ku gazên jehrî werin bikaranîn. yekemîna belgenameya der barê vê yekê de vedigere nîveka salên heştêyî. Her wiha ev belgenameya navborî di hejmara 23an a tîrmeha 1989an a kovara "Ekîbîn Dogru" de hat belavkirin. Di vê belgenameyê de îmzeya general Nejdet Oztorun hebû.

Li gor vê belgenameyê; fermandarîya hêzên bejahî yên girêdayî desteya cengê ya giştî ya Tirkîyê, roja 25ê sibata 1986an ferman da ku "gava bê xwestin, bila gaza rondikrij û bombeyên dengî bi kar bînin" her wiha "tûnelan bi gazên jehrî tije bikin". Bi rastî jî piştî sala 1986an, artêşa tirk hişt ku bi sedan şervanên Artêşa Rizgarîya Gelê Kurdistanê (ARGK) bi rêbazên borî jiyana xwe ji dest bidin.

Bi tevî ku dewleta Tirk sala 1997an bû endameke rêxistina qedexekirina çekên kîmyewî jî û wê çaxê gotibû: "çekên kîmyewî li cem me tune ne" lê belê piştî çend salan hat diyarkirin ku di embarên wê de çekên kîmyewî hene û ev yek veneşart. Di belgefilmekê de ku li ser ekrana televizyona TRT sala 2004an der barê "Yekîneya Antî Teror" a girêdayî artêşa Tirkîyê de hatibû weşandin, tê xuyakirin ku leşkerên tirk gaza rondikrij taqî dikin; ew jî piştî ku bombeyan davêjin nava şkeftekê û piştî wê gaza rondikrij derdikeve û li gor wê jî dûmaneke zer derdikeve.




Pisporên ku ev dîmen dîtin wiha gumanên xwe anîn zimên ku ev dûmana zer a derdikeve, bombeyên kîmyewî bûn. Tê zanîn ku rêxistina qedexekirina çekên kîmyewî (OPCW) dihêle ku gaza rondikrij li dijî xwepêşanderan were bikaranîn, lê nahêle ku bi qaseyên mezin ev gaz were bikaranîn; çi ku dikare di deverên teng de bihêle mirov bimire. Ji ber vê sedemê bikaranîna vê gazê di qadên leşkerî de qedexe kiriye. Bi tevî vê jî, pir caran li dijî şervanên kurd hatiye bikaranîn, nemaze yên ku xwe li şkeftên çiyayên Kurdistanê girtine.

**Li vir em ê berztirîn bûyerên ku tê de hêzên Tirkî çekên kîmyewî li dijî şervanên Kurd bi kar anîne, bînin zimên:**

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li Balîkaya-Şernex 1999:**

Komeleya Mafê Mirovan a şaxê Diyarbekirê-Tirkiye, di raporeke xwe de ku di 11ê tebaxa 2011an de derket û bi sernavê “pêngava nakokîyê li Tirkîyê û bikaranîna çekên kîmyewî û byolojîk”, tekez kir ku li nêzî gundê Balîkaya yê nêzî herêma Silopîyê li Şernexê, bîst şervanên PKKê di pêngava ku Tirkîye di sala 1999an de pêk anî de, jiyana xwe ji dest da; ew jî piştî ku bi çekên qedexekirî (kîmyewî) êrîşî wan hat kirin. Ev nûçe di wê demê de di çapemenîyê de hat weşandin. Şervanên ku jiyana xwe di vê bûyerê de ji dest da, ev bûn: Ezîz Tanît, Irkan Ir Oglu, Seyid Bayrem, Hesen Bekir, Yûsif Toran, Wezîr Osman, Umer Qenber, Ebdirehman Mozî, Hemdî Yelmaz, Sîzan Elcan, Rehîm Arzu, Mizgîn Mihemed, Leyla Ibrahîm Hisên, Sîlva Bozdag, Mîsa Şîksa, Mihemed Elîko, Filît Mihemd Rîso, Kanda Kobanê, Nêrgiz Dêrik û Sosîn Efrîn.

Hikûmeta Tirkîyê vîdyoyek piştî şer tomar kir, paşê ew vîdyo li ser kenala Roj TV hat weşandin û tê de hin wêneyên girêdayî bûyerê hebûn[8]. Tê de hat diyarkirin ku hin leşkerên ku heya niha di artêşê de dixebitin, beşdarî vê bûyerê bûn. Her wiha leşkerekî ku beşdarî vî şerî bûbû, wêneyê pêngava ku tê de çekên kîmyewî hatine bikaranîn, bi dizî weşand. Di wêneyê de tê diyarkirin ku pêngav bi rêveberiya „Necdet Ozel" e. Di wê demê de Necdet cîgirê serokê erkanên giştî bû. Her wiha „Zekî Şolaq" ku fermandarê feyleqa heftem li Diyarbekirê bû, beşdarî vê pêngavê bûye. Di wêneyê de hin kesên din jî hene ku şkefta ku gerîlayan tê de jiyana xwe ji dest daye, navnîşan dikin.



***Wêneyê şkeftê li gel gerîlayên şehîd ên ku bi çekên kîmyewî şehîd bûn[9]***

[88] İNSAN HAKLARI DERNEĞİ DİYARBAKIR ŞUBESİ; TÜRKİYE'DE YAŞANAN ÇATIŞMALI SÜREÇTE KİMYASAL VE BİYOLOJİK SİLAH KULLANIMI İDDİALARINA DAİR (RAPOR); İHD DİYARBAKIR ŞUBESİ DÖKÜMANTASYON BİRİMİ- 26 AĞUSTOS 2011; Link:
https://ihddiyarbakir.org/Content/uploads/a3b24516-79fd-42c5-931d-13e75b5595b2.pdf

[9] Güncel Gerçek; 'Kimyasal Necdet' Artık Ordunun Paşası; Link:
https://guncelgercek.wordpress.com/2011/08/02/kimyasal-necdet-artik-ordunun-pasasi/

Komkujiya Balîkaya di nav lîsteya karên Encumena Fedralî ya Almanî di sala 1999an de ji hêla Partiya Sosyalîzm a Demokratîk a Almanî ve hat pêşkêşkirin û hat xwestin ku lêpirsîneke giştî di gilîyên bikaranîna madeyên kîmyewî de were kirin. Wê qebûlnekirina xwe anî ziman ku dewleteke endama Natoyê çekên kîmyewî li dijî rikberê xwe di dawiya sedsala bîstem de bi kar bîne. Her wiha saziya ``Banga Hanoverê`` ku navenda wê li Almaniyayê ye, peyameke nivîskî bo berpirsê karûbarên mirovî di Wezareta Derveyîn de ``Cîrdo Bob``` şand û tê de da diyarkirin ku kûpên gazê û termê şervanan li cihê bûyerê hatin dîtin. Wê saziyê tekez kir ku ew hay ji lêpirsînên saziyên navneteweyî yên der barê vê bûyerê de heye. Wê da diyarkirin ku gerek e hikûmeta almanî jî tev li lêpirsînê bibe û eger hat diyarkirin ku ev bûyer rast e, wê hingê ``Hevpeymana Cinêvê`` ya ku Tirkiye îmze kiriye, dê bi awayekî metirsîdar were binpêkirin. Biranşaydit got: ``Hûn hikûmet in, li gor erkê we di Wezareta Karê Derveyîn de, bi kêmanî ji te tê xwestin ku mîna dozeke mirovî hûn danûstandinê bi vê bûyerê re bikin.``

Parçeyên bombeyên ku li cihê şer hatin dîtin, ji hêla Heyva Sor ve hatin komkirin û bo peyamnêrê televezyona almanî ``ZDF`` hat radestkirin. Di lêkolîna ku beşa bijîşkîya şeriî di zanîngeha Miyonix de hat çêkirin, paşmayên gaza CS a qedexekirî di nav parçeyên bombeyan de hatin dîtin. Her wiha bernameya ``Kennzeichen D`` a ku radyoya kenala televezyona hikûmeta almanî ``ZDF`` weşand, ragihand ku ev bombe (sembola wê RP707 bû) ji hêla beşgeha almanî ``Buck & Depyfag`` hatiye çêkirin û di sala 1995an de bo Tirkiyê hatiye firotin. Jixwe Part Stîş (endamê parlementoya Ewrûpî) bi rêya pirseke nivîskî ya xwedî hejmar ``E-1204/00`` ku ev pirs arasteyî Encumena Ewrûpî kir, amaje bi vê babetê kir. Pirsa wî jî di bin serenava ``Bikaranîna topên almanî di êrîşeke kîmyewî de ku artêşa Tirkiyê pê rabûbû.``[10]

Her wiha Ajansên Nûçeyên Navneteweyî (her wekî Esoşîtid press û Roytirz û ji bilî wan) romalkirineke berfereh der barê karên li dijî mirovahiyê yên ku hatin kirin de, pêşkêş kir.

[10] [10] WRITTEN QUESTION E-1204/00- by Bart Staes (Verts/ALE) to the Council; Subject: Use of German shell bodies in a chemical attack carried out by the Turkish army; Link: https://www.europarl.europa.eu/doceo/document/E-5-2000-1204_EN.pdf

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li Tişokorca (Çelê) 2009:**

Di şerên ku li herêma Tişokorca (Çelê) de li Hekariyayê (Colemêrg) di îlona 2009an de qewimîn, piştî ku êrîş bi çekên kîmyewî li dijî wan hat bikaranîn, heşt şervavên PKKê (du ji wan jin bûn) jiyana xwe ji dest da. Rêxistinên mafên mirovan wêne û madeyên ku komkujiya kîmyewî belge dikin, bo Almanyayê şandin da ku binihêre ka ew wêne rast in an na.

Piştî ku kesên pispor dît ku tu lîstik di wan wêneyan de tune ye, zanayên nexweşiyan di nexweşxaneya zanîngeha ``Îbindorf`` de li Hamborgê li wêneyan venihêrî û di 20. 7. 2020an de rapora xwe derxist û tê de bijîşkan da diyarkirin ku banora kîmyewî ya zelal di wêneyan de bi vî awayî ye: ``beşa jorîn a laş û dest û rûyê zuha mîna pelên gulaçê (برشمان), ev ji bandora germahiyê ye. Dibe ku sedema neşewitîna pora rû û singê bandora medaya kîmyewî be…``

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li Cîlî Karoka 1999:**

Di cotmeha 1999an de piştî êrîşeke artêşa Tirkiyê bi ser gundê ``Cîlî Karoka`` yê girêdayî gundê Kokarso (Arbêt) li herêma Tetwanê li Bedlîsê de, 27 şervanên PKKê jiyana xwe di rewşeke nezelal de ji dest da. Nasnameya kesên ku di vî şerî de jiyana xwe dest da, nehat diyarkirin û ew di goreke komî de hatin veşartin. Piştî mehekê ji vî şerî malbata ``Sîbil Koşokbîlizîkçî`` nameyek bo Komeleya Mafên Mirovan a li Diyarbekirê ``IHD`` pêşkêş kir û tê de da diyarkirin ku ew di wî şerî de hatiye kuştin û alîkariya zagonî ji bo vegerandina termê wê dixwaze. Lê belê malbatê heya demeke dirêj nikarîbû termê keça xwe vegerîne. Mafnasan ev derenghiştina radestkirina termê wê weke palpiştekê li ser bikaranîna gaza kîmyewî dît. Tevî hemû destpêşxeriyên ku IHD pêşkêşî nivîsgeha dozgerê giştî kirin jî lê tu lêpirsîn der barê bikaranîna çekên kîmyewî de nehatin kirin

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li girtîgeha Bayrem Paşa- sala 2000:**

Li gor ajansa nûçeyan BIA-net, di dîroka 5ê reşemiya 2003yan de, li girtîgeha Bayrem Paşa çekên kîmyewî hatin bikaranîn. Colîzar Kîsîçî û Bîrsin Karis ku her du girtiyên wê girtîgehê bûn, gilînameyek li dijî desthilatê bo dadgeha giştî pêşkêş kir û ew tewanbar kir ku wê bi dehên bombeyên gazê û cûreyên cûr bi cûr li dijî girtiyan bi kar anîne.

Kars û Kîsîçî tekez kir ku şeş girtiyan jiyana xwe ji dest da û ew çend mehan li nexweşxaneyê man. Kars got ku tevî borîna du salan hîn jî dermankirina wan berdewam bû. Nameya Kîsîçî ev hevokên han hewandin: ``Em weke Colîzar Kîsîçî û Bîrsin Karis di 19ê kanûna pêşîn de li girtîgeha Bayrem Paşa bûn. Di wê demê de di sala 2000î de pêngavek li girtîgehê hat pêkanîn. Em wê demê li beşa C-1 bûn. Dema em razayî bûn, gule û bombeyan beşa me hingaft. Em rastî bi hezaran bombeyên cûr bi cûr hatin. Di dema ku me dixwest em ji wê beşa girtîgehê derkevin, em bi gaza reş hatin êrîşkirin. Hin hevalên me ku hejmara wan şeş bû, mirin. Em jî bi birînên giran birîndar bûn…`` Altan Sabsîs (yek ji leşkerên tirkî yên ku wê demê di erkê de bû) got: ``Bi bombeyên gazê yên cûr bi cûr ku kesî nas nekir ka ew bûmbeyên çi ne, destwerdan hat kirin û kesên xwestin xwe radest jî bikin, ji wê beşa girtîgehê nehatin derxistin…``

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li gundê Cîlîncîkê 2001:**

Şêniyên gundên derdorê yên ku pêngava leşkerî dît, gotin ku artêşa tirk êrîşî gundê Cîlîncîkê li herêma Yedîso li Bîngolê ji 12 heya 23yê gulana 2001ê ve kir û di encamê de 20 şervanên PKKê jiyana xwe ji dest da. Wan tekez kir ku di vê êrîşê de çekên kîmyewî hatin bikaranîn. Wan malbatên şervanên şehîdbûyî agahdar kirin û wan malbatan jî berê xwe da rêxistinên mafnasî û wan rêxistinan jî xwe spart komîteyên lêpirsînê yên taybet ku ji derveyî çarçoveya dedweriyê bûn û di encamê de ew gihaştin encamên metirsîdar der narê bikaranîna çekên kîmyewî de.

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li Bişêrî Batman 2003:**

Şewitandinên kûr li ser laşê 7 şervanan hat dîtin. Ew şervan di tebaxa 2003yan de li gundewarên herêma Bişêrî Batman hatin kuştin. Pisporan tekez kir ku sedema wan şewitandinan, bikaranîna çekên kîmyewî ye.

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li çiyayê Cûdî 2005:**

Di navbera 31ê avdarê û 7ê nîsana 2005an de, pênc şervanên PKKê di pêngava hêzên Tirkîyê de jiyana xwe ji dest da.Yek ji wan kesên jiyana xwe ji dest da, Nortin Colmiz (26) bû. Malbata wê nameyek bo şaxê Komeleya Mafê Mirovan a li Stenbolê şand da ku alîkariya wê di lêpirsînê de bike. Apê Colmiz ``Ilhamî Colmiz`` got ku li gor ku me bihîst, çekên kîmyewî di vî şerî de hat bikaranîn…armanca wan jê çi ye ku heya niha term radest nekirine? Em termê keça xwe dixwazin.

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li Diraçêtê 2006:**

Ajansa Feratê (ANF) li gor jêderên xwe got ku di pêngava ku di 26ê reşemiya 2006an de artêşa tirk pê rabû, çekên kîmyewî hatin bikaranîn. Ev pêngav li gundê Bakiwan û Xorîza li herêma Darçêtê li Mêrdînê pêk hat. Ajansê nasnavê her heft şervanên ku di vî şerî de jiyana xwe ji dest dan, eşkere kir: Idrîs Eykot Ozel, Xalit Şîks Elî, Idrîs Emîr, Fewzî Hisko, Hisên Ozkaya û Irkîn Ikînçî.

Umer Ikînçî (birayê mezin ê Irxîn Ikînçî) di gotinên xwe de wisa anî ser ziman: ``Birayê min Irkîn Ikînçî di salên 2001-2006an de tev li PKKê bû. Wî jiyana xwe li Mêrdîn-Darçêt ji dest da. Li gel her şeş hevalên xwe yên din di şerê ku rûda de, jiyana xwe ji dest da. Tevî ku wî jiyana xwe ji dest dabû, lê heya wê kêliyê em pê nehisiyabûn. Rayedarên polîsan em agahdar kirin û ew birin teqîgehê. Me li wir rewşa wî kesand, laş û mirûzê wî gelekî zer û sar bûn. Em guman dikin ku çekên kîmyewî li dij hatine bikaranîn. Me alîkarî ji Komeleya Mafên Mirovan li Diyarbekirê xwest da ku di vê kêşeyê de bikole…``

- **Bikaranîna fosfora spî di şerê li Dêrsimê de 2010:**

Hêzên tirkî bombeyên fosfora spî di pêngava leşkerî ya ku di gulana 2010an de li gundewarên Dêrsimê pê rabû de, bi kar anîn. Di encamê de heft kesan jiyana xwe ji dest da. Di nav kesên jiyana xwe ji dest da de, Orgur Otantiş bû. Bavê wî Hisên Otantiş di gotinên xwe de wisa got: ``Di dîroka 26.4.2011an de li gundewarên herêma Bolumorê li parêzgeha Dêrsimê, me ji çapemenîyê bihîst ku heft kesên din jiyana xwe ji dest da…Ez çûm nexweşxaneya Erzirûmê ya hikûmetê da ku termê kurê xwe wergirim û laşê wî binasim. Hikûmetê ez birin teqîgehê da ku îfadeya xwe bidim. Berî ez derbasî teqîgehê bibim, wan kevlûjank dan min û gotin li xwe bike. Min xwe bi ser termê kurdê xwe de tewand û ew ramûsand. Lê kesên li wir qîr kirin û gotin çima tu wî radimûsî? Piştî ku min kurê xwe ramûsand lêva min û hinek ji devê min pûç bû û dilê min rabû. Vê pûçbûn û dilrabûnê nêzî hefteyekê domand. Rengê laşê wî di gelek aliyan de ji rengê termên din cuda bû û di hin aliyên leşê wî de deqên reş hebûn. Ew deq dişibiyan şewitandinê…``

- **Bikaranîna çekên kîmyewî li Colemêrgê (Geliyê Kazanê) 2011:**

Di şerên ku di navbera 22 û 24ê cotmeha 2011an de li gundewarên herêma Çelê li Colemêrgê li newala Kazanê çêbû de, 36 şervanên Yekîneyên Jina Azad (Star) û Hêzên Parastina Gel jiyana xwe ji dest da. Termê şervanên şewitî çend

rojan di teqîgeha terman a Meletîyê de man. Hejmarek zanyarî û belge der barê bikaranîna çekên kîmyewî de ji hêla artêşa tirkî ve di vî şerî de ji bo raya giştî hatin pêşkêşkirin. Şervanekî Gerîla ku ji vî şerî rizgar bûbû got ku bêhna fêkî ji dûmana teqînê dihat. Çavdêrê navneteweyî û perlmantoyê almanî û çavdêrê berê yê çekên byolojîk di NY de ``Dr. Can Van Ekîn`` lêpirsînek der barê bikaranîna çekên jehrî de pêk anî û palpişt di herêma ku pehnahîya wê 2 km in de, berhev kirin. Paşê wî wisa ji ANFê re got: ``Me palpişt ji deverên ku çekên kîmyewî li wan hatine bikaranîn, bi dest xistin. Me paşmayên bombeyên ku giraniya wan yek ton e, li wir dîtin.``

Ji bo ku li ser babeta bikaranîna çekên kîmyewî ji hêla artêşa tirkî ve were tekezkirin, hejmarek rojname û kovarên almanî yên mîna ``Dîr Şpîgel, Dî Fîlit û Yemût`` û hin rojnameyên din raporên belgekirî ji hêla berevanên mafên mirovan û ramyarên almanî ve weşandin û doza zelalkirinê di vê derbarê de kirin û ev yek weke sûcan dîtin.

Kovara ``Dîr Şpîgel`` bikaranîna çekên kîmyewî li dijî şervanên PKKê girt dest û nûçeyek bi sernava ``Tê gotin ku Tirkîye kurd bi çekên kîmyewî kuştine`` weşand[11]. Tê de behsa wêneyên termên şervanan ên parçebûyî kir. Di axaftina xwe ya ji bo rojnameya ``Dîr Şpîgel ``, hevseroka Partîya Kesk a Almanî ``Klodîya Ros`` got: ``Ji bo rêgirtina li ber van bûyeran, gerek e lêpirsîn der barê termên endamên PKKê de were kirin…`` her wiha wê wisa got: ``Em li benda daxuyanîyeke fermî ji hêla Tirkîyê ve ne ku tê de bide diyarkirin ka ku wê çekên kîmyewî bi kar anîne yan na.`` Ji alîyê xwe ve cîgirê Partîya Yekîtîya Demokratîk a Xiristiyanî ``Robirêxt Bolînz`` tekez kir ku tev li gotina Klodîya dibin lê rêya herî baş ji bo pêkanîna vê yekê, lêpirsîneke navneteweyî ye.

Her wiha Ota Zabif (ji partiya Sosyalîzm a Demokratîk û serokê komîteya Çavdêrîya Mertalên Almanî) daxuyanîyek der barê vê mijarê de ji bo ``TAZ`` şand û amaje kir ku gerek e ev bûyer were zelalkirin. Ji alîyekî din ve wezîrê derveyîn ê Almaniyayê ``Xîdo Fîstirfîlêh` got ku ev tişt berovajî zagona navneteweyî ye.

Her wiha rojnameya Berliner Tageszeitung ku rojnameya pêşîn bû ya ku babeta bikaranîna kîmyewî di nav rûpelên xwe de weşand û behsa nerînên

[11] DER SPIEGEL; Türkei soll Kurden mit Chemiewaffen getötet haben; 12.08.2010; Link: https://www.spiegel.de/politik/ausland/kaempfe-in-ostanatolien-tuerkei-soll-kurden-mit-chemiewaffen-getoetet-haben-a-711506.html

Desteya derveyîn a Tirkî kir, got ku agahî û belge der barê bikaranîna çekên kîmyewî li dijî şervanên PKKê de li bal wê hene.

Zanîngeha Hamborg raporek der barê bikaranîna çekên kîmyewî ji hêla hêzên tirkî ve pêşkêşî komîteya ``Jidestderxistina Çekan`` li Bondistaxa almanî kir. Wê jî ev doz arasteyî Bondistaxê kir. Ota Zabif (serokê komisyonê û berdevkê fermî yê Partiya Demokratîk a Sosyalîzm a Karûbarên Derve) da xuyakirin ku doz hê di nav lîsteya karên wan de ye û wan wezîrê derveyîn ê almanî ``Xîdo Fîstirfîlêh`` agahdar kir da ku doznameyekê bo Komîteya Çavdêrîya Çekên Kîmyewî (OPCW) bike da ku bi lêpirsînê rabe.

Edîtorên nûçeyan û nivîskarên sereke yên kovara Nyozoîk li Rûsiya (Êlîna Tişîrnînko, Êlîzabit Mastinî, Bolîn Irîmînk) dosyeyek bi navê ``Kîmyewî û mirin`` pêşkêş kir û got ku ``Vê carê kurd û tirk`` û wisa lê zêde kirin: ``Her kesî çesipand ku artêşa tirk çekên kîmyewî bi kar tîne.``

Kovara ``Nyozîk Etart`` da diyarkirin ku berpirsên dadwerîyê yên ku li termên qurbaniyan venihêrîn, agahî veşartin û agahîyên pêwîst pêşkêşî malbatên endamên PKKê yên ku jiyana xwe ji dest da, nekirin. Kovarê da zanîn ku hişkatîya ku li dij laşê qurbaniyan hatiye bikaranîn, bi rêya çekên kîmyewî pêk hatiye û wê wisa got: ``Wêneyên her heşt şervanên kurd mûyê laşê mirov radikin, serê wan şikestî ye, çavên wan parçebûyî ne, lebatên wan ên zayendî parçebûyî ne, hinavên wan ji zikê wan derketî ne…parçeyên li ser çerm, şewitandin, helîna tirşiyan û edab ji nîşayên ku balê dikişînin. Paşmayên şewitandin û qelişandinê li ser birînan hebûn. Ev term li deverekê hatin dîtin ku jê re `Tişokorca` tê gotin. Ew di îlona 2009an de hatin dîtin. Ev kes li herêmên çiyayî yên bajarê kurdî ji hêla dewleta Tirk ve hatin kuştin. Dema li termê wan hat venihêrîn, pisporên bijîşkîya şerîî xizmên wan agahdar nekirin ku paşmayên şewitandin û helandinê li ser termê wan hene. Lê berevanên mafên mirovan ên kurd karîbûn bi pisporî wan wêneyan bikişînin.``

Ji alîyekî din ve û berovajî angaştên dewleta Tirk ku ew dibêje min dev ji çekên kîmyewî berdaye, kovara Berevanîya Birîtanî `` Jane's Defense Weekly`` di hejmara xwe ya ku di mijdara 2003yan de derket de got ku beşgeha çêkirina

kîmyewî û mîkanîkî ``MKEK``[12] ku alavên leşkerî ji bo dewleta Tirk çêdike, bombeyên (CS) pîvan 120 mlm hilberandiye. Tevî ku hevpeymana Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî di sê xalên xwe de tekez dike ku gerek e gazên kîmyewî yên jehrî di şerên navxweyî û raperînan de neyên bikaranîn jî, lê dewleta Tirk pabendî vê hevpeymanê nebû û ev bombe di şerê xwe yê bi ser Kurdistanê de bi kar anîn (li gor rapora rêxistina Human Rights Watch[13]

Di pêşangeha IDEF de, Dewleta Tirk bombeyên CS ên ku pîvana wan 120mlm e di pêşangehên çekên xwecihî û biyanî de li Enqerayê di îlona 2005an de pêşan dan. Di sala 2010an de jî li pêşangeha Kîb Tawn li başûrê Afrîkayê (ADD) pêşan dan.

Di demeke ku Tirkî serweriya Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) dikir, ``Maykil Krolî`` (kordîneyê projeya ``Biradford`` a çekên ne zorkuj) di hemû raporên xwe yên di navbera salên 2013-2018an de rexne kiriye ku lêpirsîn piştî daxuyanîya Tikîyê nehatiye kirin; jixwe Tirkîye di daxuyaniyên xwe de gotibû ku wê ew çek rûxandine. Dr. Maykil Krolî berpirsiyarîyên Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî anîn bîra wê lê kesî besiva vê banga wî neda. Her wiha wî di raporeke xwe ya ku di 2016an de nivîsiye, rexne kiriye ji ber ku tu mekanîzmeyeke sizakirinê li ba Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî tune ye. Wî Emerîka û Tirkî weke kesên tewan li dor wan hene, bi nav kirin. Wî diyar kir ku dozên li dij binpêkirina dewleta Tirk ji peymanên Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî re di şerê xwe yê li dij şervanên kurd de, nehatine şopandin û lêpirsîn li dor wan nehatine kirin. Ji ber wê jî dibe ku ev tişt (bikaranîna çekên kîmyewî) zêdeyî carekê pêk hatibe.[14]

---

[12] Machines and Chemical Industry Corporation (also known as Makina Ve Kimya Endustrisi Kurumu (MKEK) AS) http://www.mkek.gov.tr/english/company_introduction2.htm
Ownership: state-owned holding company

[13] [13] Human Rights Watch Arms Project; WEAPONS TRANSFERS AND VIOLATIONS OF THE LAWS OF WAR IN TURKEY; November 1995; Link: https://www.hrw.org/legacy/reports/pdfs/t/turkey/turkey95n.pdf

[14] [14] Dr Michael Crowley, Professor Malcolm Dando; A STUDY OF CONTEMPORARY DUAL-USE CHEMICAL AND LIFE SCIENCE RESEARCH POTENTIALLY APPLICABLE TO INCAPACITATING CHEMICAL AGENT WEAPONS; Biochemical Security 2030 Project, Department of Politics, Languages and International Studies, University of Bath, United Kingdom; OCTOBER 2014; Link:
https://www.opcw.org/sites/default/files/documents/PDF/Down_the_Slippery_Slope_Final_LQ.pdf

**Bikaranîna çekên kîmyewî li Rojava:**

**1. Bikaranîna çekên kîmyewî di êrîşa bi ser Şêx Meqsûd de 2016:**

Çeteyên Ehrar El-Şam, Cebhet El-Nusra, girûpên Artêşa Islamê, Sultan Murad û Tevgera Nûredîn Zengî û ji bilî wan çekên kîmyewî di êrîşên xwe yên bi ser herêmên kurdan de bi kar anîn, bi taybet li taxa Şêx Meqsûdê ya Helebê (di navbera 8-12ê gulana 2016an de). Ev çekên kîmyewî du caran bi piştgirîya Tirkîyê hatin bikaranîn. Di encamê de hejmarek kes şehîd bûn ku di nav wan de zarok jî hebûn. Şeş sivîl û şervanên YPGê nîşaneyên mîna bêhçikandin, pûçbûn, sorbûna çavan û kuxîna dijwar li wan hatin der. Piranîya raporên ku hatin weşandin, gotin ku Tirkîye çekên qedexekirî dane komên çekdar. Yek ji wan raporan a Rêxistina Lêborîna Navneteweyî bû. Rêxistinê gotibû ku wê palpiştên xurt der barê binpêkirinên metirsîdar de, ji şahidan berhev kirine û wê navê ne kêmî 83 sivîlan (30 ji wan zarok) bi dest xistine ku tev jî ji ber êrîşên bi ser Şêx Meqsûdê de hatine kuştin. Ew jî di navbera reşemî û nîsana 2016an de. Her wiha nêzî 700 sivîlî birîndar bûn (li gor nexweşxaneya meydanî ya xwecihî)

Di daxuyanîyeke ku ji hêla fermandarê koma Artêşa Islamê ve derketî de, hat gotin ku fermandarekî meydanî çekên qedexekirî di şerê xwe yê bi ser Şêx Meqsûdê de bi kar anîne û li ser vê yekê hesab dê jê were xwestin. Di daxuyanîya ku bi navê Servan Islam Elûş (berdevkê fermî yê Artêşa Islamê) hatibû îmzekirin, hat gotin ku ``Fermandarekî meydanî yê Artêşa Islamê li Helebê çekên qedexekirî bi kar anîne``. Her wiha da diyarkirin ku ``ew fermandar ji bo dadgeha leşkerî ya girêdayî Artêşa Islamê hatiye guhestin.

Her wiha Dr. Welat Memo (rêveberê nexweşxaneya Ş. Xalid Fecir û yek ji hemdemên êrîşên kîmyewî yên bi ser taxê de) ji ajansa Noth Press'ê re da diyarkirin ku di sala 2013an de taxa Merûf a li Şêx Meqsûdê rastî gaza kîmyewî hat. Di encamê de sê welatûyan jiyana xwe ji dest da, yek ji wan zarokeke ku hê temenê wî nebûbû çar sal û bavê wî yên çilsalî û jineke sihsalî bû. Her wiha 15 kesên din birîndar bûn û bo nexweşxaneya Efrînê hatin veguhestin. Memo wisa gotina xwe domand: ``Di sala 2016an de, Şêx Meqsûd careke din rastî êrîşa bi gazên jehrî hat. Di wê demê de gelek rewşên fetisînê gihaştin nexweşxaneyê. Lê me nikarîbû cûreya gaza hatiye bikaranîn nas bikin, ew jî ji ber derfetên kêm ên nexweşxaneyê di wê demê de û ji ber ku taqîgeh tê de tune bû. Lê belê

venihêrîna li nexweşan tekez kir ku ew rastî gazên jehrî hatine, çimkî nîşaneyên mîna verîşandin, sorbûn, bêhnçikandin û lerizandinê li wan hatin xuyakirin.``

Ji alîyê xwe ve Rewşen Mûsa (hevseroka Şaredariya Gel li Şêx Meqsûd û Eşrefiya Helebê û yek ji govanên bûyerê) got: ``Cara pêşîn ji ber fetisîna wan bi gazên jehrî, çend welatiyan jiyana xwe ji dest da, lê girûpên çekdar di sala 2016an de careke din tax bi gazên jehrî topbaran kir.`` her wiha wê wisa got: ``Gelek birîndar ji nav sivîlan çêbûn û tevî derfetên nexweşxaneyê yên kêm, ew ji hêla tîma nexwşxaneyê ve bo nexweşxaneyê hatin veguhestin.``

Enton Liwîd (rojnamegerekî rojnameya Taymiz e) got ku di 26ê nîsanê de ew li Şêx Meqsûd bû û li wir sê kes hatin kuştin. Wî wêneyên nexweşan pêşan dan. Di wan de hat diyarkirin bê çawa kef û kênc ji devê wan derdikeve û dilerizin. Jixwe ev nîşaneyên gaza siniran e. Her wiha wî got ku 12 kesên gihaştine qurbanîyan, ew jî nexweş ketin. Wî got ku kesên rastî topbaranê hatin bi lez hatin guhestin da ku çareserîya etrobînê bibînin.

**2. Bikaranîna çekên kîmyewî di êrîşa bi ser Efrînê de 2018:**

Rewangeha  Sûrî ya Mafên Mirovan (SOHR) di 20ê cotmeha 2018an de ragihand ku artêşa Tirk dest bi êrîşên xwe yên dagirker bi ser Efrînê de dest pê kirin û wê di êrîşên xwe yên asîmanî yên bi ser gundên Bilbil û Şerayê de çekên qedexekirî bi karî anîn. Rewangehê (navenda wê li Birîtanyayê ye) li ser zimanê jêderên bijîşkî yên li Efrînê got ku şeş kesan zehmetî di bêhndanê de kişandin û bîbika çavê wan fireh bûbû. Ev jî dide diyarkirn ku çekên kîmyewî hatine bikaranîn. Her wiha YPGê got ku di encama topbarana tirkî ya bi ser gundekî li bakur û rojavayê herêmê li nêzî sînor de, şeş kes rastî kêşeyên bêhndanê û hin pirsgirêkên din hatin. Ev jî dide diyarkirin ku êrîşeke bi gazê pêk hatiye.

Di 16ê reşemiyê de balafirên tirkî çekên kîmyewî li dijî sivîlan li gundê Ernede yê girêdayî navçeya Şiyê  bi kar anîn. Der barê rewşa kesên rastî gaza kîmyewî hatine de, Dr. Mihemed Heyder wisa da zelalkirin: ``Di dîroka 16.2.2018an de nêzî saet heştê şevê, şeş kesên ku rewşa wan ji hev cuda bû, gihaştin nexweşnaxeyê; çar ji wan rewşa wan navîn bû û rewşa duyan zehmet bû. Ji rewşa derveyîn a nexweşan diyar bû ku ew rastî gaza kîmyewî hatine; çavên wan rondik dikirin, çermê wan sor bûbû, bêhna wan çikiyabû û şewat di gewriya wan de hebû. Navê sivîlên ku rastî gaza kîmyewî hatibûn ev bûn: Ebdirehman

Şalîk (29 sal), Mihemed Reşîd Hesûn (33 sal), Wedah Mistefa Xelîl (35 sal), Ehmed Mihemed Hemo (38 sal) Ednan Şalîko (35 sal) û Mihemed Arif Heqî (43 sal).








Her wiha Meclisa Çapemeniyê ya li Efrînê jî ev yek bi rêya daxuyaniyekê tekez kir: ``Tirkî gaza klor a jehrî li gundê Erdene yê girêdayî navçeya Şiyê îro bi kar anîn. Piştî bikaranîna çekên kîmyewî em dibînin ku ev êrîş kete qonaxeke nû ya binpêkirin û bêrêzîyê û hemû zagonên navneteweyî derbas kirin.`` Meclisê bang li tevahî sazîyên navneteweyî yên têkildar û rêxistinên têkildarî mafên mirovan kir da ku lêpirsîneke navneteweyî ya bêalî û dadmend der barê vê bûyerê de pêk bînin û meclisê amadebûna xwe ya ji bo alîkarîyê anî ziman.

### 3. Bikaranîna çekên kîmyewî di şerê bi ser Serê Kanîyê de 2019:

Gelek sazî û desthilatan belge kir ku di 9ê cotmeha 2019an de dewleta Tirk fosfora spî li Serê Kaniyê û Girê Spî li navçeya Til Temirê bi kar aniye. Di encamê de birînên metirsîdar û nîşaneyên bitirs li ser qurbanîyan hiştin; çimkî ew gaz

xwedî hêzeke şewitîner a mezin li ser laş û tiştan e.[15]Ji alîyekî din ve bandorên wê yên derûnî hene ku ji yên rûxandinê bêtir in. Hilmeke jehrî di nav gazê de heye, digihêje hestiyan û wan dirizîne. Dema fosfor digihêje laş tu çareserî ku rê li ber gihaştina wê ya li hestiyan bigire, tune ye. Her wiha dibe ku bandorên wê li ser endamên laş ên dîtir jî hebin, her wekî kezeb, dil û gurçikan. Ev bandor girêdayî qasîya fisfora ku laş kişandiye ye. Ew xwedî bandoreke mezin li ser derûnîya kesê pêketî ye; çimkî êşa wan şewatan bêhempa ye loma dibe ku bandorê li derûnîya kesê nexweş bike û her ku agir bibîne bitirse û bikeve rewşeke zehmet de. Ev ji bilî nîşaneyên ku li ser laş (dest û rû û endamên laş ên din) dihêle. Her wiha ev çek ziyanê digihînin jîngehê jî û deverên şîn zuha dike, rewşa xakê û riwekan diguhêre. Ev yek piştî şerê li Serê Kanîyê û Girê Spî hat tekezkirin. Jixwe divê em amaje bikin ku irfên zagona navneteweyî bikaranîna bombeyên fosforî li deverên ku niştecih lê hene, qedexe dike.

Laşê zaroka bi navê Mihemed Emîn Mihemed ku penaberê Efrînê li Serê Kanîyê bû û temenê wî 13 sal bû, rastî şewatên dijwar û kûr ji ber bikaranîna bombeyên fosforî hat. Di gotina xwe ya ji bo NRLSê de got ku dema ew li kolanê bû, ew rastî şewatên dijwar hat. Tişa ku bi serê wî hat wisa anî ziman: ``Mîna ku mûma xwedî agirekî bilind bi ser de rijiyan bûbe.`` Ew bo nexweşxaneya Til Temirê hat guhestin, paşê herêma Kurdistanê û paşê li nexweşxaneya leşkerî li Fransayê. Dema ew li wir bû, gelek bijîşkan gotê ku ew rastî bombeya fosforî hatiye. Wî da zaîn ku di raporên bijîşkî de (çi yên li Fransayê bin an jî Herêma Kurdistanê bin) hat diyarkirin ku ew rastî bombeya fosforî hatiye. Wî got ku %60 ji laşê wî şewitî. Singa wî gelekî ziyan lê, tilîyên destê wî û stûyê wî hat. Ew rastî 8 nişteriyên çerm li Fransayê hat lê hê jî pêwîstiya wî bi hin nişteriyên din jî heye. Wî di dawîya axaftina xwe de xwest ku qedexekirineke giştî li ser bikaranîna çekên kîmyewî were danîn, dagirkerî were bidawîkirin û koçber li herêmên xwe vegerin, hesab ji kesên berpirsên bikaranîna van çekên qedexekirî were xwestin û dozeke dadwerîyê ji bo ku ew mafê xwe bistîne, were hildan.

[15] Dr. Umer Sedelah, Pêşketina nivîsîna zagona navneteweyî.











### ❖ Çekên kîmyewî di hevpeymanên navneteweyî de:

Bikaranîna çekên kîmyewî yek ji alîyên herî tirajedîk e di binpêkirina mafê mirovan û zagonên navneteweyî yên mirovî û hevpeymanên têkildar de; bi taybet ji bo civaka mirovî. Ji ber ku metirsiyên wan û bandorên wan ên bobelatî pir mezin in, civaka navneteweyî hewl dide rê li ber belavbûna van çekan bigire û wan li ser asta navneteweyî qedexe bike; ew jî bi rêya hejmarek peymanên navneteweyî û diyarkirina rêyên pabendîya bi van peymanan. Lê belê hê hejmarek dewlet bi kar tînin. Di nav de Tirkî ku wê li dijî kurdan bi kar tîne û hewl dide moşekên nûklerî li ba xwe xurttir bike û xwesteka xwe ya bidestxistina bombeyên nûklerî venaşêre. Di civîneke AKPê de di 4ê îlona 2019 de, Erdogan got: ``Hin dewlet moşekên xwedî serikên navokî li ba wan hene.`` lê belê welatên rojavayî rijd in ku nabe ev çek li ba me hebin, lê ez nikarim vê yekê bipejirînim.``

Hevpeymana yekem a navneteweyî ya ku bikaranîna çekên kîmyewî qedexe dike, li sala 1675 vedigere. Ev peyman di navbera Fransa û Almanyayê de li Strasborgê hat îmzekirin û tê de bikaranîna guleyên jehrî hat qedexekirin. Piştî wê di sala 1874an de, hevpeymana Brûkselê  ya der barê zagonên şer û irfên wê de hat îmzekirin. Tê de bikaranîna jehir û çekên jehrî û çek û top û madeyên ku êşê bê sûc û sebeb pêk tînin,  hatin qedexekirin. Lê ev hevpeyman bi yek carê neket warê pratîkî.[16]

Di dawîya sedsala 19em de hevpeymaneke sêyem derket. Di sedsala 20em de(1899) mijara qedexekirina çekên kîmyewî cewherê Kongira Lahay a aştîyê bû. Alîyên ku ev hevpeyman li dar xist, li ser ``bikarneanîna çekên ku tenê armanc ji wan belavkirina gazên fetisîner û biziyan`` li hev kirin. Di sala 1907an de hevpeymana Lahay a duyem li ser qedexekirina pêşwext a bikaranîna çekên jehrî û jehirê tekez kir.[17]

Di di navbera her du şeran de (yekem û duyem) xebatên Lahayê çavdêrîya çekên kîmyewî kir. Hevpeymana Versay bi Almanyayê re, nehişt ku ew çekên kîmyewî hawirde bike. Paşê Kongira Waşintonê ya deryayî hat û tê de hat levkirin ku bikaranîna gazên jehrî qedexe ye. Lê pesendnekirina Fransayê ji ber nakokîya li ser keştîyên binav, ev hevpeyman pûç û betal kir.

Di sala 1925 de, protokola qedexekirina bikaranîna şer a gazên fetisîner an yên jehrî an jî yên mîna wan hat lidarxistin. Tevî hemû rexneyên der barê wê de, lê şîroveyên paşê yên vê protokolê hişt ku ew bibe ya herî girîng û ew bû beşek ji zagona navneteweyî ya irfî û li ser asteke berfereh hat pejirandin. Her wiha ji bo romalkirina nakokîyên hundir û pîvanên navneteweyî jî protokol hat şîrovekirin. Di sala 1995 de gerînendeya ``Istinafê`` (destpêkirin) a Dadgeha Sûcan a Navneteweyî li Yogoslafyaya berê got ku ``Levkirinek di nerînan de di civaka navneteweyî de peyda bû ku bikaranîna çekên kîmyewî di nakokîyên hundir de jî qedexe ye.`` di sala 2005 de Komîteya Navneteweyî ya Xaça Sor gihaşt wê biryarê ku zagona navneteweyî bikaranîna çekên kîmyewî di nakokîyên hundir de jî qedexe dike; her wiha di nakokîyên navneteweyî de jî.

Di sala 1993 de hevpeymana Çekên Kîmyewî hat îmzekirin û tê de bidestxistin, çêkirin, hilandin, guhestin û bikaranîna çekên kîmyewî hat

[16] Organisation for the Prohibition of Chemical Weapos
[17] Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî

qedexekirin û di 29ê nîsana 1997 de heya demeke bêdawî ket meryetê. Dewletên beşdar dikarin piştî 90 rojî xwe jê vekişînin. Belgeya levkirinê ya di navbera Emerîka û Yekîtiya Sovyetê de ya der barê çekên kîmyewî de. Her du dewletan li hev kir ku agahîyan der barê karînên her dewletekê yên girêdayî çekêm kîmyewî de bidin hev û ji wan piştrast bin. Di îlona 1989 de li Cakson Hol li Wayomîngê, rêkeftin di navbera Emerîka û Yekîtiya Sovyetî de der barê rûxandina çekên kîmyewî û hilnebirandina wan de hat îmzekirin. Ji bo bergirîyên hêsankirina rêkeftina piralî ya qedexekirina çekên kîmyewî 1990, ew bi roleke bisûd di danûstandinên rêkeftina çekên kîmyewî de lîst.

Di sala 1998 de sîstema Roma ya Sereke ya ji bo Dadgeha Sûcan a Navneteweyî hat û tê de bikaranîna çekên kîmyewî di şerên navneteweyî de weke sûcê şer hesiband. Paşê hin xalên din li Pergala Romayê zêde bûn û êdî bikaranîna çekên kîmyewî di nakokîyên hundir de jî hat qedexekirin. Dema mirov li van rêkeftinên navborî binihêre, mirov dê bibîne ku damezrînerên wan dibînin ku her kes xwedî maf e ku nabe werin binpêkirin di dema şeran de. Her wiha di dema aştîyê de jî.  Her wiha heya astekê parastina şervanan di şerên navneteweyî û nenavneteweyî de hewand û bikaranîna hin cûreyên çekan qedexe kir û çekên neqedexe jî sînor der barê bikaranîna wan de danîn. Ev xal mîna rêgezan bûn ku li ser hemû alîyên şer tên sepandin û nabe werin binpêkirin.

Armanc ji van rêkeftinên der barê qedexekirina çekên kîmyewî, bikaranîn, hilberandin, hilandin û guhestina wan ku Tirkî ew pesend kirine, ew bû ku pabendî biryarên navneteweyî bibe û wan bi kar neyîne. Lê xuya ye ku dewleta Tirk (li gor hejmarek palpişt) pabendîyên xwe gelek caran di şerê xwe yê li dijî kurdan de bin pê kirine. Ew pabendî rêkeftin û hevpeymanên ku li ser wan pesend kiriye, nebû. Ji ber wê jî ji NY bi rêya sekreterê Giştî tê xwestin ku bi lêpirsînekê rabe û bergirîyên pêwîst bistîne da ku rê li ber bikaranîna çekên kîmyewî ji hêla Tirkîyê ve were girtin; her wiha ji bo ku li ser Tirkîyê were sepandin da ku rêzdarîyê ji van hevpeymanan re bigire. Doza erkdarîyekê ji rêxistina Qedexeya Çekên Kîmyewî bi hevpeymanên ku rêxistinên navneteweyî xwe dispêrinê de, hemaheng e; nexasim rêkeftina 1993an. Her wiha ji dewletên endam di rêkeftina Çekên Kîmyewî de û li gor madeya nehem a rêkeftinê tê xwestin ku doza rawestandina sûcên şer li Tirkîyê bikin û berpirsên van sûcan darizînin. Her wiha ji Yekîtîya Ewrûpayê tê xwestin ku dozê li Rêxistina

Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) bike da ku di warê bikaranîna dewleta Tirk ji çekên kîmyewî re lêpirsînê bike; çimkî piranîya dewletên Yekîtîya Ewrûpayê endamên Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî ne. Çimkî doz nayên pejirandin eger dewleta xwedîya dozê ne endameke Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî be.

Ji alîyê xwe ve sekreterê Giştî yê NY dikare lêpirsîneke bilez der barê gilîyên ku jê re tên de çêke ku ew gilî der barê bikaranîna çekên kîmyewî û byolojîk û teksînî jê re tên. Mekanîzmeya di destê sekreterê Giştî de, derfetê didinê ku li ser daxwaza dewleteke endam lêpirsînê çêke. Bi rêya wê lêpirsînê dikare li rastîyan li cihê bûyerê bigere û raporekê ji bo hemû dewletên endamên YNê pêşkêş bike da ku bi awayekî bêalî û zanistî li binpêkirina protokola Cinêvê ya Giştî (1925) were lêpirsîn ku ev potokol bikaranîna çekên kîmyewî û byolojîk qedexe dike (yan jî rêgezên din ên zagona navneteweyî yên têkildarî vê mijarê). Çimkî dema berpirsiyarî neyên diyarkirin, kesên sûcdar dê neyên cezakirin û di encamê de li ser bikaranîna van çekan handan bibin. Li gor tiştên navborî, êrîşên kîmyewî weke binpêkirineke berbiçav a zagona navneteweyî û Rêkeftina Qedexekirina Çekên Kîmyewî ya ku Tirkî jî li serê îmze kiriye, tê hesibandin; nexasim ku Tirkî alîyek ji protokola Cinêvê ya sala 1925an de ye ku tê de bikaranîna çekên wisa hatiye qedexekirin. Îcar bikaranîna çekên kîmyewî li gor rêgezên zagona navneteweyî (her çi qasî armancên leşkerî yên rastîn hebin jî) qedexe ye; di nav de bikaranîna van çekan li dijî şervanên dijmin jî qedexe ye; çimkî ev çek xwedî bandoreke neyînî li ser mirov û jîngehê ne. Qedexekirin ne tenê ji bo armacên sivîlî ye lê belê ji bo armancên leşkerî jî ye, çimkî ev çek metirsîdar in û xwedî bandorên hilweşîner û wijdanî ne. Bikaranîna van çekan ji hêla Tirkîyê ve bi awayekî metirsîdar û berfireh hatiye binpêkirin. Ev yek bi rêya raporên nimûneyî û govanîyên hatine komkirin, tê çespandin. Civaka navneteweyî bi giştî radihêje beşekê ji berpirsiyarîya qedexekirina bikaranîna çekên kîmyewî û gerek e pergala qedexekirina belavbûna wan çekan biparêze û aştî û ewlehîya navneteweyî jî biparêze. Bikaranîna domdar a çekên kîmyewî, aştî û ewlehîya navneteweyî dixe cihê metirsîyê. Ji ber wê jî gerek e civaka navneteweyî xebatên xwe zêdetir bike da ku rê li ber bikaranîna van çekan bigire û kesên van karên hovane dikin, bixe cihê hesabxwestinê.

Ji bo pêkanîna vê yekê, gerek e hin mekanîzmeyên din ji hêla Komeleya Giştî ya NY ve werin dîtin da ku rewşa bikaranîna van çekên qedexekirî were zelalkirin

û kesên sûcdar werin eşkerekirin. Gerek ev mekanîzm bêalî bin, lêpirsînê di biwarên binpêkirinên zagonên navneteweyî de bike û binase kî pabendîyê bi rêkeftinên girêdayî bikaranîna çekên kîmyewî nake û palpiştan kom bike da ku hisab were xwestin. Pêwîstîyeke mezin ne tenê bi diyarkirina bûyerê û kesên sûcdar heye, lê belê gerek e her kesê van çekan bi kar tîne û zagonên navneteweyî bin pê dike were darizandin.

Di encamê de, li gor madeya heştem a pergala sereke ya Dadgeha Sûcan a Navneteweyî (nexasim bendên 17-18), bikaranîna çekên kîmyewî , sûcekî şer e. Her wiha li gor hukmên zagona navneteweyî jî ev çek weke sûcekî şer in û dibe ku bigihêjin asta sûcê qirkirina komî. Ji ber wê jî gerek e kesên sûcdar bo Dadgeha Sûcan a Navneteweyî werin veguhestin.

**Niha jî em ê rêkeftin û hevpeyman û pergalên navneteweyî yên jidestderxistina çek û nebelavbûna wan (ku Tirkî jî alîyek di wan de ye) bînin zimên:**

- Rêkeftina Çekên Kîmyewî (CWC). Ev rêkeftin di 1997an de kest warê piratîkî de. Tirkî di heman salê de bû endama wê. Li gor vê rêkeftinê hilberandin û bikaranîna çekên kîmyewî qedexe ye. Weke berdewamî ji protokola Cinêvê re, Tirkî di 29ê nîsana 1997an de ev rêkeftin kir meryetê.[18]

- Rêkeftina qedexekirina çêkirin, hilberandin û hilandina çekên byolojîk û jehrî û hilweşandina wan çekan. Ev yekem hevpeymana piralî bû ya der barê jidestderxistina çekan ku çêkirin, hilberandin û hilandina cûreyekî bi giştî ji çekên hilweşandina giştî qedexe dike. Ev rêkeftin di 26 adara 1975 de ket meriyetê. Her dewleteke di vê peymanê de soz dike ku di tu rewşan de van çekan çêke, hilberîne û hilîne.

- Rêkeftina qedexekirina bikaranîna gazên kîmyewî di şeran de (1925) di protokola Cinêvê de ku 134 dewletan –di nav wan de Tirkî jî- îmze kiriye.19

[18] United Nations: Treaty Collection; Convention on the Prohibition of the Development, Production, Stockpiling and Use of Chemical Weapons and on their Destruction; Link: https://web.archive.org/web/20210311154423/https://treaties.un.org/pages/ViewDetails.aspx?src=TREATY&mtdsg_no=XXVI-3&chapter=26&clang=_en

[19] Protocole: concernant la prohibition d'emploi à la guerre de gaz asphyxiants, toxiques ou similaires et de moyens bactériologiques (Texte original); 15 août 2013; Link: https://web.archive.org/web/20180523011329/https:/www.admin.ch/opc/fr/classified-compilation/19250020/201308150000/0.515.105.pdf

- Girîngîya Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî di hewildanên wê de ku ew pergaleke zagonî ji bo rêgezên zagona navneteweyî ya mirovî saz bike.

- Hevpeymana Nebelavbûna Çekên Nûklerî (NPT). Ev rêkeftin di 1968an de hat îmzekirin û di 1970yî de ket meryetê û di sala 1979 de Tirkî bû yek ji alîyên wê. Ev hevpeyma li ser sê bingehan tekez dike: çekên nûklerî belav nebin, ev çek ji destan werin derxistin û enerjîya nûklerî bi awayekî aştîyane were bikaranîn.20

- Hevpeymana Qedexekirina Giştî ya Tecrubeyên Nûklerî. Di sala 2000î de Tirkî bû alîyekî wê. Armanc ji vê hevpyemanê ew e ku çekên nûklerî yên heyî neyên nûjenkirin û yên nû neyên hilberandin.

[20] United Nations Office for Disarmament Affairs (UNODA); Turkey: Signature of Treaty on the Non-Proliferation of Nuclear Weapons (NPT); Link: https://web.archive.org/web/20191224061228/http://disarmament.un.org/treaties/a/npt/turkey/sig/london

# SERKEFTINA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ NIVÎSANDINA DÎROKEKE NÛ YE

**Kurdyar Dirêî**

Rojhilata Navîn herêmeke pir bi nakok e û di nava sîyasetên navneteweyî de xwedî cihekî pir giring e, Rojhilata Navîn ji mêj ve bûye navênda stratejîyên berevanîyê yên hêzên mezin, wek yên Ewrûpî, ingilîzistana berê û Emerîkayê di serdema nûjen de, her wiha Rojhilata Navîn herêmeke girîng a veguhestina cîhanî ji hêla bejahî, deryayî û hewayî ve ye ku sê parzemîn yên Ewrûpa, Asya û Afrîkayê bi hev ve girê dide û rêyên deryayî tê de hene ku yek ji girîngtirîn dergehên bazirganîya cîhanî ne. Jixwe herêm xwedîyê para herî mezin a petrolê ye. Ev taybetmendîyan û yên din Rojhilata Navîn ewqas girîng kirine, lewra geşedan û pêşveçûnên sîyasî di Rojhilata Navîn de ne cûda ne ji pilan û istratejîyên dewletên serdest, hingê jî geşedanên ku di dawîya sala 2010 de li pir welatan rû dane ku bi buhara ereban hate binavkirin, ji derveyî arîşe û nakokîyên hindirîn yên van dewletan di asta bilind de, girêdayî pilan û sîyasetên navneteweyî li ser Rojhilata Navîn bûn. Weke ku me tevan jî şopand ji dawîya 2010 û ta 2011 ku li çendeke welatên bakurê Efrîqayê serhildan û xwepêşandan li dijî rêjîmên wan welatan rû dane û di encamê de ev rêjîm hilweşîyan ku Sûrye jî jê bê par nema.

Gihiştina pêlên nerazîbûna ji rêjîm û sistemên diktatorê di adara 2011 de li Sûrîyê, gelek hêvî him li ba tevayên gelê sûrîyê û him jî bi taybet li ba gelê kurd di Rojavayê Kurdistanê de afirandiye, lê di heman demê de jî bûye sedema despêkirina liv û tevgerên hêzên navneteweyî û herêmî di vî welatî de, çimkî weke ku me li jor dîyar kiribû jî, Rojhilata Navîn di nava sîyaseta hemû hêzên serwer de giring e, ev yek jî ji bo dewletên herêmî (Iraq, Tirkiye, Îran) derbasdar e; êdî ji ber hebûna doza kurdî li Sûrîyê û van welatan; pêşveçûna geşedanan wê pir teyisandina wê li ser wan jî hebe û dê bi tenê çavdêr nemînin, lewra ji ber van destwerdan û cûdabûna armancan, krîza sûrîyê ku navê şoreşa sûrîyê

lê kirine, wergerîyaye şerekî nijadî (etnîkî) û tîreyî (mezhebî), beramberîya hêzên herêmî û navneteweyî li ser hesabê xwîna tevahîya gelên li sûrîyê. Bê guman Rojavayê Kurdistanê jî ji pêşketin û geşedanên di sûrîyê de wê bê par nemîne, çimkî ji peymana Saykis –Pikot a ku di sala 1916 de di nava Frensa û Ingilîzistanê de hate şanenavkirin (imzekirin), Rojavayê Kurdistanê bûye beşeke ji vî welatî.

## Rojavayê Kurdistanê Di Nava Kirîza Sûrîyê De

Di adara 2011 de pêlên buhara ereban ku bi buhara gelan R. Ebdullah Ocelan ew pênase kiribû, gihiştiye Sûrîyê, tevlêbûna kurdan di nava xwepêşandan û çalakîyên li dijî rêjîma Şamê pir dereng nemaye ku bajarên kurdan bûne qada çalakîyan, partîyên islamî yên ku ji salên heşteyî de piştî têkçûna Ixwanûlmuslimînê li himber rêjîma sûrîyê ya wê demê ya di bin serokatîya Hafiz Elesed de bû ku bêdeng bibûn, hêdî hêdî di nava xwepêşandanên 2011 de livîyan û mizgeft kirin navêndên derketina xwepêşandanên li dijî rêjîmê, Ixwanûlmuslimîn li Sûrîyê bi giştî bihêztirîn û birêxistintirîn tevger di nava hêzên dijberîya Sûrîyê de hatiye dîtin, tevî sirgûnkirina serkirdeyên wê di serdema serokê sûrîyê Hafiz Elesed de, êdî di kirîza Sûrîyê ya 2011 de beşdarî damezrandina Encûmena Niştimanî ya Sûrîyê bû ku ew pêkhateya sereke ya encumena dihat hesibandin. Jixwe di dema damezirandina encûmenê de Ixwanûlmuslimînê nêzîkî çariyeke ji 310 endamên Encûmena Niştimanî ya Sûryê bû, van partîyan ji serhildana gelê kurd li Qamişloyê di 2004 de ezmûn girtine ku kurdan dîwarê tirsê helweşandiye û eger piştgirîya serhildana Qamişloyê kiribana wê derfeteke mezin ji bo helwişandina rêjîmê biafirandana, lewra hemû hewildanên wan ew bû ku kurdan bi xwe re tevlî tevgera li dijî rêjîmê bikin, hingê jî dest bi pesendkirin, navtêdan û bilêvkirin a navên mêrxasên kurdan û durişmên biratî û yekbûna kurd û ereban bilind kirine, ew jî bi mebesta sûdgirtina ji hêz û derfetênwan, çimkî kurd civaka herî bi rêxistinkirî û xwedî ezmûn û amadebûn bû ku li himber rêjîmê serî hilde, bi taybet piştî serhildana Qamişloyê ya di 2004 de û hovitî û kiryarên ku rêjîmê li himber gelê kurd kiriye (di 14 .3. 2004 de AFP li ser zarê karbidestekî Kurdê sûrîyê ragihandbû ku 14 kes, di nav wan de 3 zarok, hatine kuştin, û bêtirî 124

kesên din jî  li bajarê Qamişlo birîndar bûne). Di 2011 de û bi pêşketina xwepêşandan û rabûna gel li himber rêjîmê, di nava parityên kurd de ji alîyê şêwazê xwendina bûyeran re, tevliheviyeke mezin hebû, ji wan partîyên sereke di qada kurdî de ev bûn:

- Partîya Yekîtîya Demoqratîk PYD.
- Partîya Demokrat a Kurdistanê.
- Partîya Demokrat a Pêşverû ya Kurd.
- Partîya Yekîtî ya Demoqrat (Mihyedîn Şêx Alî).
- Partîya Azadî (Mistefa Cumaa).
- Partîya Yekîtî (Fûad Elîko).
- Partîya Çep a Kurd (Mihemedê Mûsê).
- Hevrêzîyên şoreşê, ew jî di nava bûyeran de dîyar bûne.

Ji bilî gelek komik û partîyên sîyasî yên biçûk ku li derdora van partîyan tev digerîyan, di nava partîyên kurdan de helwestên cûda cûda ji kirîzê dîyar bûne, em dikarin li ser sê xetên sîyasî van helwestan dabeş bikin.

## Di Nava Kirîza Sûryê De, Xetên Sîyasî Di Rojavayê Kurdistanê De

**- Xeta Yekem:** Xeta xwetevlêkirina di nava dijberîya Sûrîyê de bi hêvîya ku eger dijberî biserkeve wê mafê kurdan misoger bike ( li gor ku wan wiha dîyar dikir), lewra hemû durişm, armanc û şêweyên ku dijberîyê pejirandiye û mîna wê mizgeft kirine navêndên xwepêşandanan û alên muxaleftê bilind kirine , navê hevrêzîyên şoreşê hatine lêkirin ku piranîya wan ciwanên nûbûn ku karîgerên livandina wan jî  Ixwanlmuslimîn û islama sîyasî bû, yek ji pêşengên hevrêzîyan yê navdar  Ebû Bisêr Eltertûsî bû ku kesayeteke selefî ye û bi Miftîyê Şoreşa Sûrîyê dihate binavkirin, ew weke bavê gîyanî yê hevrêzîyên şoreşê dihat hesibandin, her wiha hin pêngavên herî navdar dan destpêkirin, weke daxwaza rawestandina pêvajoya xwendinê (Heta serok neçe xwendin û hînkirin tune).Wî bang li gelê Sûrîyê kir ku fatûreyên xizmetguzarîyê nedin rêjîmê, her wiha Ebû Bûseyr yek ji daxwazkerên bikaranîna çekan li himber rêjîmê bû.

Hêjayî gotinê ye ku tu nerînên wan an jî bernameyên wan ji bona mafê kurdan tune bû, bi tenê helweşandina rêjîmê armanc girtibûn, lê doza kurdî dîyar dikirin ku eger rêjîm bikeve wê mafê kurdan misoger bibe! Bê guman xapandineke eşkere bû ku êdî bi tenê dixwestin kurdan di xizmeta armancên Ixwanûlmuslimînê de bikar bînin, eger bingeha wan dizanîbûn an nizanîbûn jî hevrêzîyên şoreşê bi gelamperî piştgirîya xwe ji Ixwanûlmuslimînê û Tirkîyê digirtin.

-**Xeta Duyem:** Xeta partîyên sîyasî yên bermahîyên partîya yekem a kurdî ku di Sûrîyê de bi navê Partîya Demokrat a Kurd li Sûrîyê ku di 1957 de avabûye û bi demê re parçe parçe bûye, ta ku gihiştiye dehên partîyan, vê xetê di despêka pêşketina dijberîyê li himber Esed di nava bêdengî û bidengiyeke şermîn de tevgerîyaye, anku çavdêrbûn û guman dikirin ku rewş di çend heyvan de wê zelal bibe, ka wê dijberî biserkeve an jî rêjîm? Lewra ne bi dijberîyê re bûn û ne jî bi rêjîmê re bûn, di wê navê de diçûn û dihatin, ta ku ENKS di 26 cotmeha 2011 de li Hewlêrê bi piştgirîya serokê herêma Başûrê Kurdistanê yê di wê demê de R. Mesûd Berzanî de ji 16 partîyan damezirandine û di tebaxa 2013 de tevlî nava Hevbendîya(itîlaf) Sûrîyê bûye, her wiha di 11.12. 2012 de van partîyên ku cihê xwe di nava ENKS`ê de girtibûn (Encûmena Niştimanîyê Kurdî li Sûrîyê), civîneke li dar xistibûn û tê de lihevkirinên bi Meclisa Rojavayê Kurdistanê re (ku em ê di pey re bînin ziman) di 23. 11. 2012 de li Hewlêrê erê kirine, her wiha ji bo tevlêbûna di nava Hevbendîyê Sûrîyê de jî pişnîyêr pejirandine. Êdî li gor belgeyeke belavbûyî ENKS û Hevbendî li ser van xalan li hev kiribûn:

- Pejirandina destûrî bi gelê Kurd, her wiha çareserkirina doza wî ya neteweyî, ew jî ji bilî rakirina hemû pirojeyên cûdaxwazî û nijadperestî yên li dijî Kurdan û qerebokirina kesên ku ji wan biryaran zîyên dîtine.

- Sûrî federasyoneke ne navêndî ye.

- Dabeşkirina 11 kursîyên ji ENKS`ê re di nav Hevbendîyê de, di nav de cîgirê serokê hevbendîyê û dê du kes ji alîyê ENKS`ê ve di nav desteya sîyêsî ya Hevbendîyê de bêne hilbijartin.

Derbasbûna ENKS`ê di nava Hevbendîyê Sûrîyê de ne ji xweber ve hatiye, di serî de Tirkîyê dizanîbû ku eger kirîza sûrîyê dirêj bike û Kurd xwe di nava Dijberîyê de nebînin, wê dergehan li ber pêşketina doza kurdî û derfetên

avabûna sabareke (statû) kurdî di Rojavayê Kurdistanê de veke, lewra ji ber têkilîyên Tirkîyê yên aborî, sîyêsî û leşkerî bi Partî Demokratî ya Kurdistan (PDK) re û peymanên betrolê … di wê rehetîyê de bû ku wê PDK kurdan ber bi cûdakirin an jî daxwazên mezin ve nebe, hingê jî hebûna ENKS`ê di hevbendîyê de dihat wateya kontrolkirina Tirkîyê ji daxwazên kurdan re, êdî bi demê re di nava Hevbendîyê de ENKS bê bandor bûye û di nava sîyêseta Tirkîyê de hatiye binavkirin, belgeya ku bi Hevbendîyê Sûrîyê re jî şanenav kirine bi tenê ma belge, her wiha ENKS nikarîbû li gor ku Tirkiye û Hevdîtinê jê hêvî dikirin ku wê kolana kurdî bi xwe ve girê bidin û Tev-Dem (Tevgera Civaka Demokratîk) anku Meclisa Rojavayê Kurdistanê vala derxînin, tevbigire an jî encaman bigre.

**-Xeta Sêyem**: Xeta Partîyê Yekitîyê Demokratîk (PYD) û partîyên piştgirê wê bûn, PYD di 20`ê rezbera 2003 de li Rojavayê Kurdistanê hate damezirandin, helwesta PYD ji kirîza sûrîyê (şoreşa sûrîyê), ji despêkê ve ew bi buhara gelan bi nav kiriye û temenkî dirêj di navbera 10-15 salan daye kirîzê, her wiha pêwistîyê xweamadekirin û avakirina hêzên parastinê nîşan daye bêyî ku tu hêvîyên di rêjîmê de an jî Dijberîyê de bibîne, xwendina PYD ji bûyeran re cûdabû û ji derveyî armancên Ixwanûlmuslimîn û Tirkîyê bû, bi rengê xwe, daxwazên xwe û durişmên xwe beşdarî xwepêşandanan bûye, lewra rastî pir rexne û reşkirinê ji alîyê hevrêzîyên û di pey re jî ji alîyê ENKS`ê ve hatiye. PYD ji alîyê pir partîyên kurdî û ji alîyê Dijberîyê Sûrîyê ve baş nehatiye xwendin û têgihiştin, lewra her dem ew weke alîgirê rêjîma sûrîyê û ji derveyî şoreşa sûrîyê nirxandine, her wiha Trkîyê ku metirsîyê bilindbûna hestên kurdî li Rojavayê Kurdistanê hîs kiriye, di 8 mijdara 2012 de komên Cebhet ûnusra di bin navê (Artêşa Azad) de derbasî Serê Kanîyê kiriye, bê guman paytexta Sûrîyê li Şamê ye; anku li başûrê rojavayê sûrîyê ye û ne li Serê Kanîyê ye ku li bakurê rojhilatê Sûrîyê dikeve, mebest ew e ku destê dewleta Tirkîyê di vê pêngavê de hebû, ew jî bi armanca ku herêmên Rojavayê Kurdistanê him ji kurdan bistîne û him jî herêmê bi rêjîmê re bike qada şer, di tîrmeha 2013 de Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Cebhetûnusra ji Serê Kanîyê derxistin. Şerê Sere Kanîyê di 2013 de YPG a ku di 2004 de piştî serhildana Qamişloyê avabûye weke hêzeke tekane ya parastina Rojavayê Kurdistanê dîyêr bûye, ew komên piçûk yên girêdayî hin alîyên kurd paşde çûne û wendabûn, YPG roj bi roj pêşde çûye û li kêleka wê Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) jî, weke du hêzên sereke di Rojavayê Kurdistanê de hatiye avakirin.

## Deskeftîyên Rojavayê Kurdistanê

Di despêka şoreşê de (kirîza sûrîyê) û bi destpêkirina çalakîyên çekdarî re, di herêmên kurdî de jî pir komên çekdar hatin avakirin ku xwe beşeke ji Artêşa Azad didîtin û navê pir komên ku ji ciwanên kurd pêkdihatin derketine, mîna Ehrar Efrîn, Azadî, Yûsif Elezma, Kawa Elhedad û Şehîdên Meka, her wiha li Kobanê û Hesekê jî komên mîna Hêzên Destwerdana Lezgîn, Lîwa Mişeal Temo, Lîwa Ehrar Elkurd û Artêşa Selahedîn li parêzgeha Reqayê. Piranîyê van koman bi derketin an jî avabûna YPG re rola xwe di nava kurdan de wenda kirin û tu nûnertîyê wan ji kurdan re nemaye, her wiha di demên pêş de gelek ji van koman yên mayî tevlî artêşa Tirkîyê û komên wê yên bi navê Artêşa Azad bûne, ew jî yên ku di 2018 de beşdarî dagerkirina Efrînê bûne û ENKS`ê di despêka dagerkirinê de ew weke hêzên xwe pejirandine û pesend kirine, lê belê di pey re û piştî ku Tirkîyê tu rol di Ffrînê de nedaye wan, her wiha ji ber rastîhatina pertek û nerazîbûna gelê kurd, ENKS`ê xwe ji wan bêrî kir.

Lewra dema em basa deskeftîyên kurdan di Rojavayê Kurdistanê de bikin, bigiştî wê ji para hêza YPG û YPJ be, ji ber komên din an ji hev ketin û an jî tevlî Artêşa Azad bûne û hemahengî bi sîyêseta Tirkîyê ku tekane armancên wê têkbirina deskeftîyên kurdan bûn kirine. Berxwedana YPG û YPJ li himber komên çekdar û têkbirina wan koman, di encamê de li Cizîrê di 21`ê Çileya 2014 de, Rêveberîyê Xweser hate ragihandin, her wiha di 26`ê heman mehê de li Kobanê û piştî sê rojan di 29`ê wê de jî Rêveberîyê Xweser li Efrînê hat ragihandin û piştî pêngava rizgarkirina bajarên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ji çeteyên Daişê ji 18.7. 2016 û şûn de ku Minbic, Reqa û rojhilatê Dêrazorê hate rêzgarkirin, Rêveberîyê Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê di 6. 9. 2018 de hate ragihandin. Her wiha di 23. 3. 2019 de li Baxoza Dêrazorê têkçûna leşgerî ya Dayişê hate ragihandina.

Ji despêkirina berxwedana Kobanê li himber Daişê û ta rêzgarkirina Kobanê di 26.1. 2015 û şûnde, Rojavayê Kurdistanê di asta navneteweyî de bûye herêmeke sembolî ji fedekarî, berxwedan û rijdebûna li ser têkbirina terora cîhanî di kesayeta Daişê de, êdî Rojavayê Kurdistanê ketiye nava sîyêsetên

navneyeweyî de ku hêzên wê YPG, YPJ û di pey wan re jî HSD bûye yek ji hevbeşên Hevpeymana Navneteweyî li himber Dayişê.

Bê guman ragihandina Xweserîyê Demokratîk di Rojavayê Kurdistanê de di nava gelê kurd de li her çar perçeyên Kurdistanê hêvî û şanaziyeke mezin afirandiye û bûye deskeftiyeke giştî ji tevaya gelê kurd û kêmnetewên ku di nava kurdan de jîyên dikin.

Em dikarin dîyêr bikin ku di gelek alîyên de deskeftîyên Rojavayê Kurdistanê hene û pir giringin.

Di mile sîyêsî de: Tevî nakokîyên ku di nava partîyên sîyêsî yên kurdî de li Rojavayê Kurdistanê de derketin, kolana kurdî dabeş bibû, di milekî de hemû hewildanên partîyên ku di nava ENKS`ê de xwe bicih kiribûn, ew bû ku serkêşîyê doza kurdî bikin, ew jî bi alîkarîyê Partîyê Demokratî ya Kurdistanê a başûr ku di nava têkilîyên sîyêsî û aborî de berfirih bi Tirkîyê re ye û bandora Tirkîyê ya mezin li ser heye û xwe weke nûnerê herêmê nîşan bidin, her wiha rê li ber pêşketina PYD û Tev-Demê bigrin, lewra ENKS ji hêla PDK`ê weke kaxeteke razîkirina Tirkîyê hate xebitandin, hingê jî PYD û Tev-Demê bi lihevkirinên bi pêkhateyên di Rojava de û avakirina hêzên leşkerî û pejirandina berxwedanê li himber komên çete û çi gefên li ser gel bibin, di bin navê xeta sêyem de anku ji derveyî rêjîm û Dijberîyê; dikarîbûn di Rojavayê Kurdistanê de bibin hêza herî sereke û bi bandor, êdî bi demê re bi partîyên cûda re sazîyên sîyêsî hatin avakirin, mîna Meclisa Rojavayê Kurdistanê û di pey re Tev-Dem û Meclisa Sûrîyê Demoqratîk (MSD), her wiha di nava tekoşîna Rojavyê Kurdistanê de yekem car bû ku paytextên dewletan li ber şervanên kurd vebibûn û bi fermî hatine pêşwazîkirin weke leheng û têkbirên terora cîhanî, li Frensayê serokê wê nûnerên Rêveberîyê Xweser bi kincên neteweyî û leşgerî pêşwazî kiriye, her wiha li çendeke welatan jî nûnertîgehên Rêveberîyê Xweser hatine vekirin, têkilîyên diblomasî gavên baş avêtine, êdî tevî hemû hewildanên Tirkîyê û hevalbendên wê ji bo reşkirina Xweserîyê Demokratîk û hêzên leşgerî anku weke ku terror in, Rêveberîyê Xweser û sazîyên wê di asta cîhanî de piştgiriyeke mezin wergirtine, bi taybet ji alîyê civakan ve, lê belê ji ber ku doza kurdî di Rojhilata Navîn de, dozeke navneteweyî ye û pir şax û paxên wê hene ku çar dewletên herêmî têkildar dike, ji bilî sîyêsetên navneteweyî li ser herêmê pir astengîyên li ber têkilîyên fermî û erêkirina deskeftîyên Rojavayê Kurdistanê peyda di bin .

Di mile leşgerî de: Rojavayê Kurdistanê weke beşeke ji Kurdistana di nava çar dewletên herêmî de dabeşbûyî perçeyê herî biçûk e, him erdnîgarî û himjî nljadî û li gorî tevgera sîyêsî ya kurd, bi giştî çarenûsa Rojava girêdayî çarenûsa perçeyên din yên Kurdistanê ye, bi taybet Bakurê Kurdistanê, anku eger Bakur rêzgar bibe dê Rojava jî rêzgar bibe an jî Rojavayê Kurdistanê bi tenê dikare hin mafên nasname û çandî ji rêjîma sûrîyê bixwaze, jixwe ji xewn û xeyalan bû ku Rojavayê Kurdistanê bibe xwedî hêz û çarenûsa xwe dîyêr bike, lê belê Rojavayê Kurdistanê di milê leşkerî de dikarîbû di bin sîwana Tevgera Civaka Demoqratîk de xwe bi rêxistin bike û hêzên YPG, YPJ, HSD`ê ava bike ku bi dehhezaran şervan cihê xwe di nav wan de girtine û bi geşedanên şoreşa 19 têrmehê re bûne hêzên sereke û cihê xwe di nava Hevpeymana Navneteweyî li himber Dayişê girtine, her wiha weke hêzên pispor, rêxistinkirî û pabendî zagonên navneteweyî hatine nasîn, her wiha dikarîbûn beşeke mezin ji xaka Rojavayê Kurdistanê û Sûrîyê rêzgar bikin, ew jî bi qasî 30/100 xaka Sûrîyê, berîyê ku Tirkîyê Efrîn , Serê Kanîyê û Girê Spî dagir bike, anku di roja îro de serwerîyê 20 - 25/100 xaka Sûrîyê dike.

Di mile aborî de: Piştî şoreşa19 têrmehê di Rojavayê Kurdistanê de, cara yekê bû ku kurdan serwerîyê saman û çavkanîyên aborîyê Rojavayê Kurdistanê kirine, lê belê ji ber ku rêjîmên sûrîyê her dem aborîyê Rojava bi xwe ve girêdabû, tu bingehên aborî li Rojava ava nekiribûn, hingê jî tevî bidestxistina van çavkanîyên jî, derfetên mezin çênebûn ku aborîyê Rojava li bêş bikeve, jixwe yek ji sedemên sereke (ji bilî sîyêsetên rêjîmê), ew bû ku him Tirkîyê bi dagirkirina gelek herêman, gefên rojane, ambargo û nêzîkatîyên Başûrê Kurdistanê ji Rojava re ku mijarên aborî jî bi mijarên sîyêsî ve girêdaye û dike fişar li ser Rojava, di bin fişarên Tirkîyê de an jî ji encamên têkilîyê bi Tirkîyê re. Gelek pirojeyên aborî, sazîyên aborî hatin avakirin û li gor rewşa giştî ya Sûrîyê, Rojava di mile aborî de herêma herî ku li pêş dikeve.

Di mile çandî de: Yekemsazî hate avakirin û di demekê de bi pêş ket ku hîna tu derfetên mezin, ne sîyêsî û ne jî leşkerî tunebûn û hîna kirîza Sûrîyê di nava tevlihevîyên despêkê de bû, Sazîyê Zimanê Kurdî bû, êdî di pey re jî pir sazî hatin avakirin û li pêş ketin ku sazîyên çandî di Rojavayê Kurdistanê de bûne bi dehan, ji dibistanan ta avabûna yekîtîyên rewşenbîrî, navêndên lêkolîn, weşanxane, çapxane. derçûna hezarên pirtûkên bi zimanê kurdî û lidarketina pêşengehên

pirtûkan, her wiha avabûna navêndên çandî, zanîngeh, acans, kenalên tilvizyon û radyoyan, pêşketina ragihandin û rojnemegirîyê û hwd.

Di milê civakî de: Di civaka Rojavayê Kurdistanê de pir guhertin hatine kirin, yek ji van guhertinên sereke rewşa jinê ye, yekemcare ku jin di Rojavayê Kurdistanê de bi roleke mezin rabûye, him sîyêsî, leşgerî, aborî û civakî, hişmendîyê ku zilam her dem pêşenge û cihê biryarê ye hate şikandin, êdî jinê di nava şoreşa 19 têrmehê de sazîyên xwe yên xweser avakiriye û xwe bi rê ve biriye. mîna (sazîyên perwerdê, mala jinê, Kongraya Star, Yekîneyên Parastina Jin YPJ, navêndên rakirina tundîyê li ser jin), nûnertîyê hevbeş bi zilam re di her qadan de (hevserokatî) û hwd.

Her wiha ji bo avakirina jîyêneke komînal di nava her bajar û taxan de, komîn hatin avakirin, desteyên lihevanîn û çareserkirina pirsgirêkan, bi rêxistinkirina ciwan û zarokan, guhdayîna li nêzîkkirina di navbera olan de û xurtkirina têkilîyên, her wiha rêdayîna ji bo pêşketina sazîyên civaka sivîl û çareserkirina nakokîyên di nava pêkhateyan de û karîna bi hev re jîyênkirin.

**Metirsîyên Li Ser Deskeftîyan**

Dewleta Tirk ji bo tunekirina destkeftîyên Rêveberîyê Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, êrîşeke giran a dagirkerîyê li dijî Rojava pêk tîne. Di kesayeta Rojava de êrîşî li hemû destkeftîyên gelê kurd ên li Rojhilata Navîn tê kirin. Di pêkanîna xewnên ji nû ve avakirina dewleta osmanî de dixwazin careke din kurdan bikin qurbanê berjewendîyên navneteweyî, lê ji bona kurdan jî Şoreşa Rojava destkeftiyeke neteweyî ye, ne tenê girêdayî kurdên Rojavayê Kurdistanê ye, lê ew rûmeta neteweyî û nirxê azadîyê ji bo her çar perçeyên Kurdistan û cîhanê ye, lewra rastî pir metirsîyên tê, metirsîyên li ser Rojava - Bakûr û Rojhilat Sûrîyê; bi taybet dewleta tirkyê ye, Trkîyê ku serkêşîyê dijminatîyê bi kurdan re dike, di nava şert û mercên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de ji bo destkeftîyên kurdan asteng bike; bi her rê û rêbazên qirêj tev digere. Em baş dizanin ku tenê stratejiyeke dewleta tirk heye; ew jî bi qirkirina kurdan re dixwaze Kurdistanê bike qada berbelavbûna netewetîyê tirk.

Ji xwe rêjîma Sûrîyê, Îran û Rûsîyê jî, ji alîyê Rojava û ezmûna wê ya demokratîk ve ji pilanên dewleta Tirkîyê ne dûr in, tevî ku berjewendîyên wan di herêmê de tersî hev in jî; lê belê li ser kurdan û deskeftîyên pêkhatinên herêmê bazarên cûda cûda bi hev re dikin, lewra di nava bazarên qirêj de pilan û xerabîyên dikin, mîna lêdana li dahola şerekî kurd- ereb, piştgirîyê nijadperest û sawkarîyên di herêmê de, ajotina Tirkîyê û çeteyên wê ber bi êrîşkirina li ser herêman, reşkirina pirojeya demokratîk û çandina nabawerîyê di nava civakê de. Jixwe dewletên Rojavayî (Ewrûpa - Nato) jî ji derveyî berjewendîyên xwe tu nêzîkatîyên wijdanî û exlaqîli li fedekarî, qurbanî û doza kurdî nakin ku hin ji wan ji rewşa bindestîyê gelê kurd re sedemên sereke ne, mîna peymanên (Lozan, Saykis-Pîkot).

Ji alîyê kurdan bi xwe jî metirsî hene ku weke civak û hin partîyên sîyêsî nekitene wê cûdahîyê giringîyê derfeta ku îro bi dest me ketiye û li şûna nerîn û hizirînên stratejîk, xwe mijûlî hin pirsgirêk, buyer û xwestekên demikî hiştine ku lawazîyê di nava Rojava de diafirînin û belavbûnan çêdikin, her wiha di nava laşê Xweserîyê Demokratîk de jî hebûn û belavbûna fesad û hin keysperest û berjewndîxwazên kesayetî ku bi tenê di ferqa ku çawa xwe ava bikin; ne ku gel û welatekî ava bikin.

Lê belê di vê pêvajoyê de, du bobelatên sereke li ber kurdan hene. Ya pêşî ew e ku kurd parçekirî ne û yekitîyê wan a neteweyî nîne. Ya duyan jî ew e ku kurd doza xwe têra xwe venaguhezin qada navneteweyî û bi hêzên sîyêsî yên demokratîk re têkilîyên têrker danaynin. Ya sîyên jî mijara kurdî di rastîyê de, mijareke navnetewî ye, ne tenê girêdayî Sûrî, Iraq, Îran û Tirkîyê ye, ew girêdayî sîyêset û istratejîyê pergala sermayedarîyê di derbarê Rojhilata Navîn û Kurdistanê de ye; ew dewletên mezin yên ku rêvebirina pergalê dikin; parçeyek û aliyek ji meseleyê ne, hingê jî ew çawa li Rojavayê Kurdistanê dinerin pir giring e.

## Parastina Deskeftîyan

Avakirna Rojavayê Kurdistanê weke Xweseriyeke demokratîk ku hemû pêkhateyan di nava xwe de dihewîne, bê guman wê di nav dagirkerên Kurdistanê de nerehetî û metirsîyên biafirîne ku tevde pergalên diktator û

xwedî hişmendiyeke inkarker ji hemû çand û neteweyên cûda re ne, hingê jî serkeftina Rojava tê wateya hejandin û rûxandina van pergalan jî, her wiha bilindbûn û derhatina doza kurd ji nava xwelîyê sedê salan, ji bilî hebûna pirojeyên navneteweyî li ser gelan û gurkirina şer û pevçûnan di bin gelek navan de (nijadî, tîreyî, herêmî) û hwd.

Lewra pêwist dike ku em li hundirê xwe vegerin û di hemû warên ku lawazî, nezelalî û nerastî heye, em sererast bikin, bi taybet di milê sîyêsî, aborî, civakî û leşkerî de, jixwe xweparastina hundir bingeha herî sereke ye û rakirina metirsîyên hundir bingeha rawestandin û berxwedaneke serkeftî li himber metirsîyên derve.

Di milê sîyêsî de: Yekitîyê kurdan mijara herî stratejîk a vê demê ye.

Dijminên me û bi taybet Tirkîyê, yekitîyê kurdan weke mijara herî stratejîk dibîne. Ji ber ku tê xwestin ku hevsengîyên kevn ên li Rojhilata Navîn bên hilweşandin û yên nû bên avakirin, şerekî piralî diqewime. Ne dîyêr e ku dê li Tirkî, Sûrê, Iraq û Îranê rewş bi çi rengî be. Hem nakokî û şer didomin hem jî tu nîşane nînin ku şer di demeke kurt de bi dawî bibe. Ev rewş ji bo me kurdan hem derfetan diafirîne hem jî metirsîyên, di asta neteweyî de jî, divê em pirsgirêka yekitîyê ji yekitîyê partîyên derxin, ji ber ku netewe tenê ji partîyên sîyêsî pêk nayê. Hemû derdorên sîyêsî, civakî, nijadî, olî û tîreyî û kesayetî yên ku civakê pêk tînin, hêmanên netewêyê ne. Ji ber vê, xebatên yekitîyê neteweyî jî divê van hemûyan vehewîne nav xwe û armanc bike ku her kesî li derdora hin rêgez û nirxan werîne gel hev. Nêzîkatiyeke bi vê hişmendîyê hem dê yekitîyê neteweyî ya rasteqîn pêk bîne û hem jî dê bike ku hêzên sîyêsî bi rehetî werin gel hev.

Di milê aborî de: Xwedîderketina li malbatên şehîdan û başkirina rewşa wan a aborî, her wiha rêgirtina li ber perçemokên şevê ku deskeftîyên Rojava di xizmeta xwe û berjewendîyên xwe yên malbatî û kesayetî de bi kar tînin. Jixwe galgal û gazincên ji niştecihên Rojava bilind di bin  ku êdî bêhna gendelî ji gelek sazî û dezgehên Xweserîyê Demokratîk difûre, her wiha vekirina derfetên kar ji ciwan, perîşan û kedkaran re.

Di milê civakî de: Guhdayîna li rêbazên pêşxestin û têgihiştina civakê û xurtkirina beşdarkirina civakê di hemû pirojeyên ku pêşeroja wan ava dike de, rê girtina li ber keyseperestîyê û bermahîyên rêjîmê ku li ser navê Xweserîyê

Demokratîk û Tevgerê reşkirin, nakokî û tengasîyên derdixin, her wiha jiholêrakirina bendîtî, hevreşkirin û nebawerî û ne zelalîyê rewşa heyî; anku lêvegera li civakê û ji nava civakê gav avêtin ..

Di milê leşkerî de: Xwedî derketina li şervanên YPG, YPJ û HSD û parastina mafên wan di hemû beşên jîyênê de, her wiha xurtkirina rêxistin û rêbazên berxwedanê û amadebûn ji hemû geşedanan re, yek ji amadekirinan şerê gel yê şoreşgeriye.

**Şerê Gel Yê Şoreşgerî**

Dema şerê cîhanê yê duyem bi dawî bû, Netewên Yekbûyî û parêzvanên mafên mirovan ketin nav hewldanan û Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan amade kirin, li dijî şer jî pêvajoyeke nû hat destpêkirin, heger li herêmekê metirsîyê rûdana şerekî hebe ew bi tenê çavdêrîyê dikin û destwerdanê nakin, lê eger şer an nakokîyên dest pê kir, ji nû ve behsa aştîyê dikin û bangeşeya (piropogenda) nebaşî, zehmetî û qurbanîyên şer dikin, anku mijara aştîyê jî girêdayî berjewendîyên dewletên serwer û pergala sermayedarîyê ye û navêroka xwe windakiriye, di bin navê aştîyê de komkujîyên pêk tênin, gelan qir dikin û şerê xwe jî bi navê aştîyê pênase dikin, mînak; dewleta tirk dema ku Qubris dagir kir, navê dagerkerîyê xwe kiribû (Tevgera Aştîyê) û dema ku Efrîn dagir kir jî, navê pêngava xwe kir (Tevgera Şaxê Zeytunê) û di dagirkirina Serêkanîyê de jî navê (Tevgera Rûbara an jî kanîyê Aştîyê) lê kir, her wiha berxwedana li himber dagerkerîyê û xweparastina gelan ji faşizm û diktatoran, tekoşîna ji bo azadîyê pirê, caran bi navê şer pênase kirine, anku ne rewa û ne li rê ne! Ev jî çandeke ji çandên sewerîyê ye ku rastîyên berovajî dike û rastîyê di hişmendîyê xwe de dide pêş û bangî tevgerên azadîyê jî dikirin ku dest ji şerê çekdarî berdin. Ji bîr kirin ku van tevgerên azadîyê li dijî şer, şerê hebûnê didin meşandin ku bi navê Şerê Gel ê Şoreşgerî di nava gelên bindest û tevgerên azadîyê de hatiye pênasekirin.

Di Rojhilata Navîn de jî pergala sermayedarîyê ku rêjîmên diktator û xwînrêj bicî kiriye û çavên xwe li ser hemû cûreyên kiryarên wan yên ji derveyî nirx û wijdanê mirovatîyê li himber gelên xwe û gelên din ku bikartînin girtiye; di nava gelek neteweyan û gelan de hişmendîyê xweradestkirin û bê hêvîtî û ji xwe

nebawer afirandiye, lê di Rojavayê Kurdistanê de bi serkeftina li himber Daişê û avabûna Xweserîyê Demokratîk re pir şêweyên nerênî di nava civakê de hatine rakirin û bawerî û hêviyeke mezin bi xwe hatiye afirandin, lewra pêwist e rêbaza şerê gel yê şoreşgerî di nava civaka Rojavayê Kurdistanê de pir li ser were nirxandin û di milê tewrî û piratîkî de were cîbicîkirin, ji ber ku rêbaza herî serkeftî ya gelên bindest in, êdî mînakê şerê gel yên şoreşgerî di cîhanê de û serkeftina wê pir hene .

Li Vêtnamê li hember dagerkerîyê Emerîka gel li ber xwe daye û şoreşa xwe li dar xist, vê şoreşê hêza Emerîka ku serwerîyê cîhana sermayedar dikir, di 1974 de têk biriye ku Vêtnamê bibû tirseke (fobya) ji Emerîka re û ta roja îro jî wê têkçûne jibîr nake, di nava şoreşê de gelê Vêtnamê pir qurbanî dane û welatê wan di nava şewitandin û talanîyê re derbas bûye, her wiha piranîyê gel di gund û gundewarên bajaran de jîyên dikirin û dijêrerdê de pir jîyên kirine, lê belê gihiştin serkeftinê, her wiha di Bakurê Kurdistanê de jî mîna Vêtnamê rêbazê şerê gel yê şoreşgerî hatiye meşandin, lewra ji despêkirina şoreşa 1984 ku ta dema îro berdewam dike, ji ber vê rêbazê ye ku rêjîmên Tirkîyê li pey hev têk çûne.

Di Rojavayê Kurdistanê de jî parastina cewherî ku pêwist e were pêşxistin, ew her cûre birêxistinbûna gel e, divê yekîneyên parastina cewherî yên ku gel di nav de cih digrin, werin pêşxistin. Pêdivî bi xweparastinê heye, ev nayê wateya çekê, jixwe xwepêşandanên girseyî yên demokratîk jî şêweyeke parastina cewherî ye. Xetimandina rîyên çareserîyê demokratîk tê wateya destpêkirina demeke ku digihîje heya qutbûnê, ji bo ku çek ji dewrê werin derxistin, divê rîyên demokratîk werin vekirin. Êdî beyî ku rîyên demokratîk vebin; behsa bêçekbûnê kirin, metirsiyek e. lewra di Rojavayê Kurdistnê de pêwist e ku gelê me nekeve xefletê û ji hemû geşedanan re amade be, bi taybet ku çavên hemû dijminên lê ye û heger bê xwestin ku şerekî dijwar li ser were ferzkirin pêwist e tevaya gel ne tenê hêzên leşgerî di wê ferqê de bin û berxwedana şerê gel yê şoreşgerî bimeşînin, ji ber ku berxwedan û şerê gel yê şoreşgerî misogerîyê mayîn û xweparastin û ber bi azadîyê ve çûyîne.

## Encam

Mayindebûn û serkeftina ezmûna Rojavayê Kurdistanê ne tenê ji bo Kurdên Rojava, lê ji tevahî Kurdan re ye, hêzên ku xwe demokrat dibînin û ji gel û pêkhateyên di herêmê de anku di Rojhilata Navîn de; bingeha avabûn û despêka serdemeke nû ye ji bo azadîyê ye. Ji ber têkçûna vê ezmûnê wê bandoreke mîna têkçûna komîna Parîsê çêbike. Ev jî wê bê wateya ku him Kurd him jî demokrasîya Rojhilata Navîn derbeyekî mezin bixwe. Lewra pişgirîyê Rojavayê Kurdistanê, li ser kêmasî û lawzîyên rawestandin, têgihiştina partîyên sîyêsî, gel û civaka sivîl û di asta dîrokê de tevgerkirin, wê bihêle ku em nehêlin dîrok xwe dubare bike û wê pêşî li hemebr komkujîyan bigre, di heman demê de wê di dîrokê de bibe rûpeleke nû û mizgînîyê pergaleke nû ku xwe dispêre azadîya gelan û jinan.

*******************

## JÊDER


*https://www.orsam.org.tr/ar/uluslararasi-sempozyum-kuresel-gucler-ve-ortadogu/*

*https://carnegie-mec.org/syriaincrisis/?fa=48396*

*http://www.asharqalarabi.org.uk/paper/s-akhbar-m-a-q.htm*

*https://democraticac.de/?p=37605*

*https://al-akhbar.com/Opinion/40922*

# ALOZÎYÊN DERXISTÎ YÊN LI ROJHILATA NAVÎN Û RÊGEHÊN WÊ

- **Pêşgotin:**

Gelek alozîyên ku îro li Rojhilata Navîn têne jîyîn, ne nûyên vê sedsalê yan jî berîya wê ne, lê belê ji dema pêlên zûwahîyê yên destpêkê ku di dawîya serdema kevirî de û bi derketina civaka çînîtî-koletî re dest pê bûye, derketine pêş. Hinek alozîyên îro jî, bi awayekî ji awayan rehên wê vedigerin wê serdemê. Her wiha hinekên din jî rehên wan vedigerin serdemên piştî wê. Gava em dîroka herêmê dixwînin, em dibînin ku di dîroka sîyasî ya Rojhilata Navîn de, alozî weke karîger û bandorker tê nasîn. An ku ji wê çaxê ve dest pê bûye; gava imperatorîya Akadî-Sûmerî (2334 – 2218 BZ)[1] biryar da ku bi rêya berfirehbûna ber bi herêmên cîran ve da ku dagir bike û bixe bin serwerîya xwe, ji rewşa jeosîyasî ya hawîrdor sûdê werbigire. Bi dest xwe re ev yek veguherî rewabûnekê ji padîşahî û dewletên li dû wan re û heyanî roja me ya îro jî ev yek digihêje.

Li herêma Rojhilata Navîn komek alozîyên sîyasî, aborî û civakî têne jîyîn. Jixwe temaşekirina li ber televizyonên ku rewşa herêmê dişopînin, têrê dike ku qaseya kêşe û azarên ji ber van alozîyan derdikevin, werin nasîn. Ev alozî di pileya yekem de encama binkeftina Dewleta Osmanî û piştî wê jî projeya dewleta yek neteweyê ku piştî şerê cîhanî yê yekem derket pêş, her wiha piştî wê jî dewleta tîre-neteweyî ya ku piştî şerê sar derketin pêş in. Ev hemû jî ji ber ku pergalên dewletî nikarîbû ji daxwazên pêşketina şaristanî yan jî pêkanîna ewlekarîya mirovî bo civakên xwe re bibin bersiv, derdikevin holê. Ta niha jî rewş bi tundî aloz e. Ramanwerê ereb Mihemed Hesenên Heykel di dahûrandinên xwe yên der barê alozîyên Rojhilata Navîn ên di nîveka sedsala borî de, wiha dibêje[2]: "Pirsgirêkên ku rûdan, hevbendî, proje, plangerî û komployên ku çêbûn, li dû xwe bermahî kom kirin û karîgerên mirovî di nava derûnîya peyayên ku li Rojhilata Navîn an jî ji bo Rojhilata Navîn bûyeran

[1] Coşwa Cî Mark, Bajarê Akad, Werg: Samî El-Etreş; Weşan: Zanistnameya Dîroka Cîhanê; Lînk: https://www.worldhistory.org/trans/ar/1-363/

[2] Mihemed Hesenên Heykel; Girêkên Derûnî yên ku Rojhilata Navîn bi rê ve dibin; Çapa yekem 1958; Weşan: Kompanîya Erebî ya çapkarîyê; R14.

diafirînin de, çalak bûn. Encama vê çalakbûnê jî eva ku em aniha li herêmê dibînin û pê hest dikin, ew bi xwe ye. An ku ya rastir ku ne pirsgirêk bi xwe Rojhilata Navîn dimeşîne, lê belê girêkên ku ji ber van pirsgirêkên derketine ne". Gava em vê yekê didin ber dahûrandina ramanwerê kurd Ebdullah Ocalan a der barê danasîna dewleta ku bi rêya veberînana pêdivîya civakan bo rêvebirina karûbarên ewlekarî[3], dadî û aborî û danûstandina bi civakan ku mîna şivan û kerî[4] xwe rewa dike, em vê encamê bi dest dixin ku; pêkolîya li ser ramana avakirina dewletê -bi danasîna xwe ya desthilatdarî- hîn jî ew girêk e ya ku li dû xwe gelek kêşe û alozî anîne. Em dikarin vê yekê bi rêya van pirsgirêkan ên ku dewleta Osmanî û dewletên piştî peymana Sykes-Picot (Saykis-Pîko) û peymana Lozanê di navbera her du şerên cîhanî de derxistine, bi çespan bikin. Çi ji alîyê komkujîyên pêkhatî û koçberkirina gelan ên bi armanca parastina dewleta yek-neteweyî ve be[5], yan jî ji alîyê binkeftina bo bûyîna bersiva alozîyên ku çêbûne û hîn jî çêdibin û nekarîna pêkanîna geşepêdaneke domdar a bi tevî saman û dewlemendîyên herêmê ve. Heyanî gihiştîye wê astê ku avabûna dewleteke neteweyî ji bo gelekî din, ji dewleta neteweyî ya ku serwerîyê li wî gelî dike re bûye saw. Em vê yekê di dozên kurdî û filestînî de dibînin; an ku bi tevî ku çareserîyên ku sûdê didin hemûyan hene, mîna konfederalî yan jî federalîyê.

Di alozîyên tevlîhev ên herêmê de alozîya Sûrîyê ya ku tu nîşaneyên nêzîkbûna bidawîbûna wê dîyar nabin, berz dibe. Ne ji ber ku rêjîma sûrî û rikberîya sûrî ya bi ser Tirkî ve di sîyasetê û serkêşîya leşkerî de xurt in, lê belê ji ber ku yên vê alozîyê bi rê ve dibe girêka binkeftinê ya di navbera hêzên ku nikarîbûn dest deynin li ser welêt û helwesta xwe guhart û dev ji hilweşîna

---

[3] Ebdullah Ocalan; Manîfestoya Şaristanîya Demokratîk \Berga Çarem\ Alozîya Bajarvanîyê û çareserîya şaristanîya demokratîk li Rojhilata Navîn; Werg: Zaxo Şîyar' Çapa Duyem 2014; Bê weşan: R375.

[4]Heman jêdera borî; R39.

[5] Kirêttirîn bobelatên ku ji ber dewletbûna neteweyî derketine, têkildarî qirkirina etnîkî ne ku aniha gelên Rojhilata Navîn êşa wê dikişîne. Ezmûnên dewletbûna neteweyî gelên Helenî, Ermen, Suryan û Kurd ku ketine dafika neteweperstîya ku li Anatolya û Mezopotamyayê pêk hatine, di seranserî sedsala dawî de ew ber bi têkbirin û tunebûnê ve birin. Bi tevî ku ew kevntirîn çandên xwecih ên ku di dîrokê de hatine nasîn in. Her wiha bêserûberîya neteweperestîya dewletên serdest ji bo afirandina civakeke neteweperest a di bin ala sînorin asê û qutebir de, bi her awayî ji gelan re bûye kirêttirîn bobelat.."
Binêre: Ebdullah Ocalan; Manîfestoya Şaristanîya Demokratîk \Berga Pêncem\ Doza Kurdî û Çareserîya Neteweya Demokratîk; Werg: Zaxo Şîyar; Çapa Duyem 2014; Weşan: Çapxaneya Azadî; R605.

rêjîmê berda de ye; mîna rêjîma Tirkîyê. Hemû jî bi wê razî bûne ku tişta di bin destê xwe de li hev par bikin û biparêzin. Rikberîya sûrî jî (ya xwedî teşeya olî) tişta wê dide pêş girêka binkeftina di salên heftêyî û heştêyî ku ji başkirina rewşa welêt a bi lihevkirina bi hemû pêkhatêyan re bêtir, bi dû xwegihandina li ser desthilatê ve diçû.

Dibe ku di pêşkêşkirina alozîyên herêmê yên xwedî paşamyîyên dîrokî de têgeha “Alozîyên Derxistî” kêşeyan bi xwe re derxe, lê belê bermahîyên xwe li dû xwe hiştine di herêmê de mîna wan berê tune ne. Em ê li gor vê yekê têgeha “Alozîyên Derxistî” ji bo ravekirina bandorîyên wê yên bi rêya rewşên aloz ên ku herêma Rojhilata Navîn di wan de derbas dibe, bi kar bînin. Her wiha em ê balê bikişînin li ser alozîya Sûrîyê ku derbirîna hemû alozîyên herêmê dike û bi awayekî yekser û neyekser bi wan re têkildar e. Her wiha em ê behsa Tirkî, Iraq, Libnan û Filestînê jî bikin; çi ku di gelek rewşan de alozîyên wan bi hev ve têne girêdan. Em ê vê yekê bi rêya vê lêkolîna ku dê xwendineke heyanî rêjeyekê nû dide van alozîyan, bi cih bînin; ew jî bi rêya balkişandina li ser berztirîn bandorîyên wan û destnîşankirina berên wan. Her wiha em ê xwe bispêrin rêbaza raveyî ya dahûrandinî û rêbaza têbînîyê; ev hemû bi armanca ku em xwîner bi alozîyên herêmê bidin têgihiştin û destekê bidin ramanên ku li çareserîyên gengaz digerin, pêk tên. Di destpêkê de dê danasîna alozîyê bi gelemperî û pirsgirêkên li herêmê werin gotûbêjkirin, piştre jî berztirîn bandorîyên wê yên ku bi binkeftina veguherîna demokrasî, nekarîna pêkanîna geşepêdan û ewlekarîya mirovî, geşbûna tundrewîya neteweperestî û tîreperestî û koçberkirina bi qestî têne nimandin û di dawîyê de em ê balê bikişînin li ser rêgeha van alozîyan û hinek pêşnîyaran bidin.

- **Danasîna Alozîyê:**

Têgeha “Alozî” bi piranî ji bo ravekirina tengasîyekê yan jî rewşên awarte yên di her astê de ye, çi li ser asta kesayetî ku alozîyên derûnî, diravî û civakî ne, yan jî alozîyên niştimanî mîna alozîyên sîyasî, aborî û jîngehî, yan jî alozîyên li ser asta navneteweyî mîna nakokî û pevçûnên di navbera dewletan de. Di gelek lêkolînan de danasîna “Alozî”yê bi hemû alîyan xwe yên aborî, sîyasî, civakî, tenduristî û hwd. hatîye behskirin û her çandekê jî ev yek li gor rêbaza xwe rave

kirîye. Çi ku alozî rewşeke giştî ye û di hemû mercan de dikare were jîyîn. Ji pênaseyên li ser alozîyê ev in:

Li gor zanistnameya sîyasî[6]: “Alozî di wateya xwe ya giştî de û bêyî ku guh bidin qada wê, çi sîyasî, aborî yan jî civakî be, helwesteke tengav e ku ji nişkê ve çêdibe û li ser xwedîyê biryarê wiha disepîne ku; biryareke qutebir bistîne da ku jê re bibe delîveyeke serkeftin an jî binkeftinê..” Her wiha di lêkolînekê de hatîye amajepêkirin ku têgeha “Alozîyê” di beşên cihêreng ên zanistên mirovî de tê bikaranîn ku tê wateya komek merc û bûyerên ji nişkê ve û dibin mîna gefekê li ser rewşa heyî û aram a tiştan..

Ji pênaseyên alozîyê jî[7]:

- Alozî tê wateya zehmetî yan jî tengasî û ji wan jî gotinên “Alozîya sîyasî” û “Alozîya aborî” hatine darişţin.
- Alozî: “Xirabûneke ku bandorê li ser pergalê bi giştî dike ye û hemû standardên sereke yên ku pergal xwe li ser wan dide avakirin dikevin ber gefan”.
- Alozî bûyereke ji nişkê û nepêşbînîkirî ye ku danûstandina pê re zehmet e û pêdivî bi lêgerîna bo navgîn û rêbazên birêvebirina wê heye da ku bandorîyên wê yên nerênî kêm bikin..”
- Alozî: “Rewşeke nîgeran û xaleke veguherînê ye ku pêdivîya wê bi biryarekê heye ku helwestin nû werin girtin û dibe ku ev helwest li ser statuyên têkildar ên cihêreng erênî yan jî nerênî bin..”

Dîyar dibe ku ya baş ew e ku; danasîneke pratîkî der barê alozîyê de bidin dayîn û dûrî ferheng û dîtaneyan herin. Lewre li gor danasînên cihêreng; em dikarin alozîyê wiha bibînin ku helwesteke tengav û rewşeke awarte ye û di encama wê de rewş hildiweşe, çi ji alîyê aborî, sîyasî, civakî yan jî tenduristî ve

---

6 Zanistnameya Sîyasî; Danasîna Alozîya Navneteweyî – The Concept Of The International Crisis; Lînk: https://political-encyclopedia.org/dictionary/مفهوم%20الأزمة%20الدولية

7 Ferhenga Meanî El-Camih – Wateya Alozîyê

Dr. Elai Ebdilhefîz; Alozîyên Sîyasî Yên Navneteweyî: Danasîn – Cure – Rêvebirin; Weşan: Enstîtûya Misirî Ya Lêkolînan 17ê Nîsana 2020an; Lînk: https://eipss-eg.org/الأزمات-السياسية-الدولية-المفهوم-–-الأنواع-–-الإدارة/

Sexrî Mihemed; Alozîya Sîyasî… Danasîn û Rehend; Weşan: Zanistnameya Cezayirî ya lêkolînên sîyasî û stratejîk 14-03-2021; Lînk: https://www.politics-dz.com/الأزمة-السياسية-المفهوم-والأبعاد/

be û li ser astên hundirîn û derveyîn e, her wiha ji bo wê jî pêdivîya bi biryarên wêrek heye.

Jixwe berztirîn cûreyên alozîyan:

Du cûreyên bingehîn ên alozîyan hene ku ew weke karîgerên sereke yên pêkanîna piranîya cûreyên din ên alozîyan, çi bi awayekî yekser an jî neyekser, têne dîtin. Ew jî ev in:

Alozîya Sîyasî: Di wateya xwe ya berfireh de[8]: “Helwesteke ji nişkê ve ye û rewşê dide ber gefan ku dê ji ber rewşa awarte û tengbûna dema standina biryaran bi temamî biguherîne, her wiha berjewendîyên jîyangîr jî dide ber gefan. Lê di wateya xwe ya teng de tê wateya pawanîya desthilatê û misogerîya berdewamkirina wê bi rêya dezgehên çewisandin û keysbazîyê[9]; lewre ev yek çavkanîya piranîya dozan tê dîtin.

Alozîya Aborî[10]: “Tevlîhevîyeke ji nişkê ye ku li ser hevsengîya aborî çêdibe û di encama bêhevsengîya di navbera mezaxtin û hilberandinê de çêdibe, lewre buhabûn û topavêtin çêdibin..”

**Berztirîn taybetîyên alozîyê:**

- Tengasîyek heye ku bersivdayîna wê zehmet e. Dibe ku xwedî rehendeke nerênî be; mîna tunebûna dahatan, çêbûna bobelatekê, hilweşîna rewşa aborî, sîyasî, ewlekarî yan jî tenduristî… û hwd. Her wiha dibe ku xwedî rehendeke heyanî astekê erênî be jî, mîna hebûna dahatên dewlemend ku veberînana wan zehmet be yan jî di hilberînê de zêdebûn hebe û firotina wê zehmet be.

[8] Dr. Elai Ebdilhefîz; Alozîyên Sîyasî Yên Navneteweyî: Danasîn – Cure – Rêvebirin; Weşan: Enstîtûya Misirî Ya Lêkolînan 17ê Nîsana 2020an; Lînk: https://eipss-eg.org/الأزمات-السياسية-الدولية-المفهوم-–-الأنواع-–-الإدارة/

[9] Ebdullah Ocalan; Manîfestoya Şaristanîya Demokratîk \Berga Çarem\ Alozîya Bajarvanîyê û Çareserîya Şaristanîya Demokratîk Li Rojhilata Navîn; Werg: Zaxo Şîyar; Çapa duyem 2014; Bê weşan; R54.

[10] Ferhenga Elmeanî El-Camih – Wateya Alozîyê.

- Belavbûna rageşîyê; mîna nîgeranî û bêbawerîya di navbera çîna giştî û yên bijarde de; ku dibe sedema kombûna hestên hêrs û dijminatîyê yan jî yên tirsê.

- Nakokî; ew ji ber ku cûreyek ji cûreyên dijbertîya vînên di navbera du alîyan an bêtirî du alîyan de ya der barê mijarekê de ye, ku xwe dispêre berjewendîyên dijber ên alîyên nakokîyê ye. Ew jî bi sêweyekî ye ku gengaz e mekanîzmayeke çareserîyê ya bi rêya yek ji amûrên vekirina nakokîyê, mîna navbeynkarî, dadwerî û danûstandinê, pêk tê; da ku rengekî lihevkirinê di navbera alîyên nakok de pêk were..” Dibe ku nakokî di navbera kes, kom, desthilatdarî û gel an jî di navbera dewletan de be… û hwd.

**Şîrovekirineke Giştî Der Barê Alozîyên Ku Li Herêma Rojhilata Navîn Têne Jîyîn De:**

Civakên Rojhilata Navîn li seranserî dîrokê, ji hemûyan bêtir êşên alozî û pirsgirêan dîtine; ew jî ji ber ku her demê ketîye ber şûrê çewisandin û keysbazîya ji alîyê çînên pawankerê desthilatdarîyê ve. Em dikarin rewşa niha ya ku herêma Rojhilata Navîn tê de dijî, weke komeke alozîyên cihêreng bibînin; jixwe alozîya civakî her dem xala hevbir e, çi li ser asta herêmî û çi jî li ser asta xwecihî be. Li gor wê jî şer û cengên lidar, geşbûna bangeşeya kînê, civakin çewisandî, guherînên avhewayê û têkçûna jîngehî û zehmetîya peydakirina lêçûnên jîyanê hene. Êdî hinek dewlet hene ku piranîya niştecihên wê di bin xeta hejarîyê de dijîn; mîna Sûrî û Libnanê, her wiha rêjeyin mezintir li dewletên din ên herêmê hene.

Li Sûrîyê jî alozîya wê ya ku ji sala 2011an ve teqîyaye, bi xurtî didome û bûye dewleteke binkeftî yan jî nîvhilweşîyayî. Her wiha komeke dewletan desthilatî û kontrola li ser erdnîgarîya welêt li hev parve kirine, di nava gelek statuyên xwecihî de parçe bûye û şerên bêhevsengî[11] tê de li dar in. Êdî di navbera tundrewên şîa û sunayê de, di navbera teokrat û nijadperestan û demokratîxwazan de her wiha di navbera tewereya rojavayî û ya rojhilatî de veguherîye qada şer û pevçûnan. Li gor şanderê Neteweyên Yekbûyî, Geer Pedrson, di civîna ku di rûniştina Encumena Ewlekarîyê ya der barê alozîa Sûrîyê

[11] Şerê Bêhevsengî (Asymmetric Warfare): Têgînek e ku rêbaza şerekî rave dike ku tê de du alî bi awayekî berçav tektîk û çekên cihêreng şer tê kirin; ew jî ji ber ku alîyê lawaz nikare bi rêbazên alîyê hêzdar şer bike. Lewre ev cureya şerî di nava xwe de şerên stratejîyan dihewîne; mîna serhildan, teror, şerê gerîlatî, şerê zanyarîyan, şerê toran û şerê internetê…

de ku di 27ê sibata 2024an[12] de hat lidarxistin, dîyar dike ku li gor nîşaneyên heyî rewşa li Sûrîyê xirabtir dibe û zehmet e were kontrolkirin. Li gor wê jî dibêje: “Heyanî niha jî barê nêzî 100 hezar kesên ku bi bêtawanî hatine girtin, kesên bi qestî hatine windakirin û weke revandîyan winda bûne de, em tu encamên berçav der nabînin. Ku ev yek li gor banga biryara 2254 e.” Her wiha anî ziman û got ku wî careke din bi malbatên windayî û girtîyên li hemû deverên Sûrîyê re hevdîtin pêk anîne, “û ewên ku di nava zehmetîyan de ne û bi hêvîya serbesberdana hezkirîyên wan ên girtî ne, yan jî herî kêm cihê girtina wan û çarenivîsa wan nas bikin.”

Bakur û rojavayê Sûrîyê û hin herêmên bakur-rojhilatê wê yên di bin dagirkerîya Tirkîyê û çeteyên wê de, bêhal bûne. Li gor tiştên ku li ser erdê têne şopandin, pêvajoya guhartina demografîk li dijî kurdan û peyrewên olên xiristîyan û êzdatîyê pêk tê. Her wiha alîgirên demokrasîyê jî bi rêbazên sawkirin, hejarkirin, tirkkirin û osmanîkirinê û bi destekdayîna koma Ixwan El-Mislimîn, nefesê li wan teng dike. Pê re jî êrîşên leşkerî yên yekser û yên bi rêya çeteyên wê li ser herêmên din ên bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk tîne û xebatên ji bo pêkanîna pevçûnên netewperestî û olperestî dike[13]. Li başûrê Sûrîyê jî jîngeheke ewlekarî ya jihevketî heye. Li gor wê jî li wir karên tawanên birêxistnkirî, mîna kuştin, revandin û bazirganîya madeyên hişbir û çalakbûna operasyonên rêxistina DAIŞê û rêxistinên girêdayî Heres El-Sewrî, her wiha komên çekdar ên xwecihî û rêveberîya saloxgêrî ya karûbarên herêmê lê çalak in. Di nava pênc mehên dawîyê de û bi awayekî veqetandî êrîşên bi moşekan û balafirên bê mirov li ser wargehên bakur ên dewleta Israîlê pêk hatin û li beramberî wê jî Israîlê rêzeçalakîyên bombebarandinê li ser hin armancan li herêmên rêjîma Sûrîyê pêk anîn.

Der barê nava Sûrîyê û çolistanê de, êdî veguherîye qadeke operasyonên leşkerî yên di navbera rêxistina DAIŞê ji alîyekî ve û ji alîyê din ve jî hêzên rêjîmê

---

[12] Nûçeyên Neteweyên Yekbûyî: Rewşeke mirovî ya li ser erdê û tekezkirina navneteweyî ji bo pêdivîya bi rawestandina tundîyê, dîroka weşanê: 27.2.2023, Lînk: https://news.un.org/ar/story/2024/02/1128762

[13] Ev yek di hewldana pêkanîna fitneyê li Dêra zorê de derdikeve gava ku wezîrê karê derveyîn ê Tirkîyê “Hakan Fîdan” wiha da xuyanîkirin: Divê nema QSD weke hêzên rewa werin dîtin, an na., dê ev pevçûnên ku li Dêra Zorê nîşan didin dê tenê destpêk be…”
Ibrahîl El-Elbî, Piştî piştgirtîya Erdogan ji êlên erebî yên li Dêra Zorê re.. gelo dê Tirkî destwerdaneke leşkerî bike?. Weşan, El-Cezîre, dîroka weşanê: 9.9.2023, lînk: https://www.aljazeera.net/politics/2023/9/9/بعد-تأييد-أردوغان-للعشائر-العربية-في

û her du hevlabendên wê yên rûsî û îranî de. Her yek ji wan jî ji alîyê erdnîgarîya leşkerî ve xwedî stratejîyekê ye. Rûbera wê ya heyanî astekê berfireh, kêmbûna hejmara niştecihên wê ku piranîya wan sunî ne û alîgirîya wan ji rêjîma Sûrîyê û hevalbendên wê re lawaz e, pirbûna gir û şkeftan, her wiha bayê bi toz ku dihêle xweveşartin û nepenîkirinên ku dihêlin çalakîyên "Lêde û bireve" yên rêxistina DAIŞê wan pêk tîne hêsan bibin, her wiha samanên herêmê yên mîna zevîyên gaz, petrol û kanên fosfatê, hemû jî xala hevrikîyê di navbera hêzên rûsî u îranî de ne. Her wiha yek ji sedemên şerê bi DAIŞê re ye. Pê re jî xwestekeke Îranê heye ku korîdorekê ava bike da ku Bexda, Şam, Beyrût û peravên Deryaya Navîn bi hev ve girê bide û di şerê bi dijminên xwe re, mîna dewletên erebî yên sunî û Israîl, de herêmê veguherîne enîyeke pêşketî. Lewre kuştina bi dehan efserên Îranê li Sûrîyê ku bi lêdanên hewayî yên israîlî hatin kuştin, rastîya vê yekê derdibirîne.

Bi tevî aramîya rêjeyî ya li bakur û rojhilatê Sûrîyê heye jî, lê belê rastî operasyonên plangerî[14] yên ji gelek alîyan ve tê. Rasteya wê ya demokrat û rêvebirina wê ji samanên wê re, li dijî ajendeyên rêjîmên Tirkîyê, Sûrîyê û Îranê û rêxistina navneteweyî ya Ixwan El-Mislimîn û rêixstina DAIŞê, her wiha hêzên xwecihî derdikeve pêş. Li gor wê piranîya van hêzan operasyonên leşkerî û bangeşeya kînê li dijî Rêveberîya Xweser a civakên bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk tînin. Di destpêka sala 2024an de van hêzan asta tundîya operasyonên xwe yên leşkerî li dijî bakur û rojhilatê Sûrîyê bilintir kir. Ev yek bi rêya bombebarankirina hewayî ya dewleta tirk li ser binesazî, cihên rajeguzarîyê û xalên leşkerî, her wiha bi rêya operasyonên behajî yên bi rêya çeteyên rêjîma Sûrî û Îranê û DAIŞê, pêk hat. Hemûyan jî piştî ragihandina "Peymana Civakî Ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê" pêngava xwe ya bangeşeya nerênî li dijî herêmê bilind kir. Vê

[14] Operasyonên Plangerî wiha têne nasîn ku bernameyek e, di nava xwe de gelek operasyonên saloxgêrî dihewîne û hevrêzîyê di navbera wan de dike. Bi piranî li ser demeke dirêj têne birêvebirin; da ku bandorê li cemawer an jî beşa armancgirtî bike ku tiştekî destnîşakirî destnîşankirî pêk bînin an jî nehêlin pêk bînin. An jî bandorê li ser nêrîna giştî bikin (cemawerê giştî, bijardeyên aborî, rêveberên sîyasî û leşkerî… divê ku em dîtaneyên plangeîya bê hiş û yên bi zanebûna hişî ku plangerîyek di jîyana sîyasî de heye, ji hev cuda bikin û nas bikin. Ji bo bêtir binasin: Şadî Ebdilwehan, Bijareya Bêdeng: Erkdarkirina Operasyonên Plangerî di çalakbûnên navneteweyî de, Weşan: El-Musteqbel a lêkolînên pêşketî, Dîroka weşanê: 9-.-2014, Lînk: https://futureuae.com/ar-a/Release/ReleaseArticle/386-الخيار-الصامت-توظيف-العمليات-التآمرية-في/إدارة-التفاعلات-الدولية

yekê bi xwe re Rêveberîya Xweser a herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê danî pêşberî rûbirûbûnên mezin.

Dewleta Iraqê jî rastî alozîyeke sîyasî tê, her wiha belavbûna çekan ji derveyî sazîya leşkerî ya fermî, çalakîyên leşkerî yên rêjîmên Tirkî û Îranê û DAIŞê, her wiha pirsgirêka hin hêzên sîyasî yên iraqî bi hevbendîya navneteweyî ya şerê li dijî DAIŞê re, hene.

Her wiha li Tirkîyê jî alozîyên sîyasî û aborî hene, heyanî rêjeyekê nema dikare ji bandorîyên erdheja sibata 2023yan re bibe bersiv. Li kêleka wan jî pirsgirêka wê ya lihevhatina bi dewletên cîran re heye. Jixwe tiştên ku li Libnan, Israîl û Filestînê çêdibin her kes dizane. Dewletên herêmê yên mayî jî ji alozîyên van dewletan ne dûr in.

Bê guman rewşa welatên herêmê nema weke ya berîya deh salan e. Nemaze piştî êrîşên Hemasê yên 7ê cotmeha 2023yan li ser Xezayê rewş gihişt li ber ketinê. Êdî ev yek nêrîna hin sîyasetmedarên reşbîn xurt dike ku êdî tu tişt bi navê Sûrîyaya yekbûyî, Iraqa yekbûyî, Libnana yekbûyî û Filestîna yekbûyî nemane. Dîyar e ku dewletên din jî li ser vê rêçê dimeşin û pê re jî nikarin ji alozîyên xwe re bibin bersiveke avaker. Êdî ev yek nêrîna alozîyên derxistî li Rojhilata Navîn ku bi hinek bandorîyên taybet tê nasîn, xurt dike.

- **Berztirîn Ravedanên Alozîyên Rojhilata Navîn:**

Em dikarin sê çavkanîyên alozîyên herêmê destnîşan bikin, ew jî ev in: Şerê îdolojî yê ji bo pawankirina deshilatdarîyê, tunebûna rêveberîyeke baş ji bo samanên aborî, her wiha pragmatîzma hêzên navneteweyî. Ev alozî bi awayekî sereke bi rêya keysbazî, çewisandin û stemkarîyê ku bi nêrîneke zayenperestî lê tê nihêrîn, li ser jinê bandor kirîye. Êdî rewşeke wiha daye avakirin ku ji alîyê çîna pawankera desthilatdarîyê ve, bi awayekî mecazî bi têgeha “Jinkirina Civakê” (an ku kolekirina wê) derbirîn tê kirin. Êdî ne îdolojîyên qebîle û êlîtî û ne jî olên neteweyî ew şarezatî bi dest xistîye ku bikarin dozên heyî û koletîya ku rehên xwe kûr berdane çare bikin. Berevajî wê, vê yekê koletî xurtir kir. Ew sozên olan ên ji bo biratî, temamkarî, yekîtî û aştîyê li beramberî berjewendîyên madî ku bi rengê tîreyî hat pêçan, sînordar bûn. Her wiha dozin nû bi xwe re derxistin holê ku êdî parçebûnên tîreyî, lidarketina şerên çewisandin û keysbazîyê yên navxweyî û yên li dijî civakê derketin pêş; da ku desthilatdarîyê

weke alaveke ne avaker ji bo parastina îdolojîya komê, pawan bikin. An ku weke hewldana “Vemiranina agir bi agir” derket pêş. Her wiha rê li pêşîya bûyerên biêş li Rojhilata Navîn[15] vekir û komek doz, alozî û nakokîyin din ên ku hev û din têr dikin, vekir. Ji alîyekî din ve jî tê dîtin ku dewletên herêmê ta niha jî hîn guhdanê bi mijara jîngehê nakin û tavaya wan bi behaneyên cihêreng pêk tînin. Li gor wê jî li piranîya wan an mijara mijara çarekirina gilêşê û ya zuhabûnê lawaz e yan jî guh nadinê. Gihiştîye wê astê ku hinek rêjîman gilêşên nûklerî anîne û li çolistana xwe bin ax kirine. Êdî ew jîngeha nimûneyî ya ku bi buhiştê tê nimandin tenê di nava aşop û propagandayên komên tundrew de maye û li ser erdê tu cihekî wê tune ye. Hevdemî vê yekê pawankerên desthilatdarîyê buhiştên xwe yên taybet ava dikin. Êdî ev yek amaje bi bandora mîtolojîyê ya li ser hişmendîya mirovan dike.

Ji ber ku zehmet e hemû alozîyên herêmê di nava çend rûpelan de werin ravekirin, berztirîn ravedanên wê hatine destnîşankirin; ku hemû jî li derdora nebûna bersiveke avaker bo alozîyên herêmê kom dibin. Ew jî wiha ne:

1. Binkeftina bo veguherîna demoratîk.
2. Binkeftina di çarekirina bermahîyên bobelatên surîştî û jîngehî de.
3. Binkeftina di geşedana tundrewîyê bi hemû alîyên wê ve de.
4. Binkeftina di rûbirûbûyîna li beramberî koçberî û koçberkirinê de.

Em bala xwe bidinê; her yek bûye sedema ya din û encameke yên din; an ku weke ku di nava xelekekê de digerin. Lewre ev yek li ser me disepîne ku belge û ramanên der barê her yekê ji wan de bînin zimên.

## Yek: Binkeftina veguherîna demokratîk:

Veguherîna demokratîk[16] wiha tê nasîn ku: “Hin xebat û rêkar in ku ji bo veguherîna ji pergaleke ne demokratîk ber bi pergaleke demokratîk a aram ve

---

[15] Ji bo bêtir biasin, lê vegere: Ebdullah Ocalan, Manîfestoya Şaristanîya Demokratîk \Berga Çaerm\ Alozîya Bajarvanîyê û Çareserîya Şaristanîya Dmokratîk li Rojhilata Navîn, werg: Zaxo Şîyar, Çapa duyem 2014, Bê weşan.

[16] Dr. Macide Mensûr, Veguherîna Demokratîk û bandora wê li ser beşdarbûna gelêrî di çaksazkirina makezagonî de û lêkolîna hevrûker, Zanîngeha El-Menûfîyê, lînk: https://jslem.journals.ekb.eg/article_182820_a1b9c97fac6a2f88900e7cae86c7ad72.pdf

û di nava demeke destnîşankirî de, têne standin. Pê re jî komek ji rêzik û rêkarên ku têkilîya di navbera ferwerdar û cemawer de rûdinînin ku bi rêya wan cemawer bikarin kesên li ser desthilatê bipejirînin an jî red bikin..” Her wiha mafê wan ên çavdêrîkirin û hesabxwestina ji desthilatê jî heye. Ji pêvajoya veguherîna demokratîk re hewayeke civakî, çandî, sîyasî û aborî gerek e; ku jê re domandin û pêşketinê dabîn dike.

Di piranîya civakên Rojhilata Navînd de pirsgirêka desthilatdarî û dewletê heye; an ku ji alîyê dewletin xwedî pergalên pawankerê desthilatdarîyê yên cihêreng ve, ferwerî lê tê kirin; çi bi rûniştina li ser li ser textê desthilatarîyê û çi jî bi xweveşartina li paş wê. Bi tevî hemû bangeşeya wan a niştimanperwerîyê ku demokrasîyê bingeha xwe ya dîtaneyî dibînin jî, lê belê ji çarçoveya xwe ya dîtaneyî derbasî warê pratîkî nabe. Her wiha nikarîne ji gelên herêmê re aramî, aştî û pêşketinê pêk bînin û weke hêzeke mêtinger li ser gelan desthilatdarî dane meşandin û di encama wê de welat bi bin xistin. An jî wan di nava dirûvên yek partîyê, yek malbatê, yek neteweyê yan jî yek tîreyê de bi teşe dikin. Êdî bi dest xwe re li derdora dirûvê “Paşayê Nemir” teşe digire; ku êdî binemal kirîye bingeha desthilatê û weke teşeyê bingehîn ê dewletê ku li Rojhilata Navîn bas dîyar dibe, derdixe pêş. Her wiha komên mirovan careke din li gorî berjewendîyên çînên jorîn ên binemalê yan desthilatê yan jî dewletê ji nû ve ava dikin; ku êdî pêşbînîya şerên li ser desthilatê yên bi armanca avakirin an jî hilweşandina binemalan an malbatên pawankerê desthilatê, tê kirin.

Tunebûna nermahî û vekirina li ser guhartina avaker a ku li keleka zanîna sîyasî, şoreşa dijîtal, pirbûna hejmara niştecihan û firehbûna pêdivîyên aborî dimeşe, di nava van pergalan de bi serê xwe alozîyek e û çavkanîya sêyekek ji alozîyên herêmê ye. Pisrgirêka van pergalan ew e ku pêkolîyê li desthilatadarîya navendî ya xwedî îdolojî dikin û mijara veguherîna demokratîk bi dîtaneyên komplogerîyê ve girê didin; an ku wiha dîyar dikin ku tişta pawankarên desthilatê pêşkêş dikin ew bi xwe çareserî ye. Ev bi xwe cûreyek ji yên desthilatdarîyê û şewazekî keysbazîyê yên herî çalak e, lewre ev yek berê me dide wê bawerîyê ku pêkolîya li ser desthilata navendî ya zordar, pêkolîya li ser berdewamkirina alozîyên xwecihî ye. Ev alozî encama vê desthilatdarîyê ne û di heman demê de desthilatdarî li ser bingeha “Stratejîya mijûlkirinê” sûdê jê werdigire. Lê belê ev stratejî bi lidarketina Buhara Gelan a ku di 2010an de dest pê bûye re gihiştin dûmahîkên xwe yên binkeftî. An ku Buhara Gelan bi rêya

raperînên gelêrî li hin welatên Rojhilata Navîn bi armanca bidawîkirina stemkarî û çewisandina azadîyan, her wiha pêkanîna ewlekarîyên mirovî û niştimanî hatin lidarxistin. Ev yek li ser bingeha dozkirina bo dadmendî, azadî û demokrasîyê û bidawîkirina pergalên gendelîyê di nava pergalên ferwerîyê de, pêk hat. Bi tevî ku van raperînan dikarî van pergalan li welatê xwe bihejînin jî, lê belê ji ber sedemên subjektîv û objektîv negihaştin dawîyê xwe ya kêfxweş a ku doza wê dikir. Di encamê de piranîya veguherînên bo demokrasîyê yên li welatên Rojhilata Navîn bi bin ketin. Her wiha li hin welatên ku bêhna demokrasîyê jê dihat, mîna Libnan û Israîlê, nîsaneya demokrasîyê tê de daket[17]. Ev yek jî li gor rapora nîşaneya demokrasîyê ya sala 2023yan ku ji alîyê yekîneya saloxgêrîya aborî ya di koma “Economest” a brîtanî[18] de ye, di bin serenava “Serdema Pevçûnan” de hatîye dîyarkirin. Li gor wê jî tekez dike ku nîşaneya demokrasîyê li Rojhilata Navîn ji ber çewisandina mafên demokrasîyê û azadîyên sivîl bi awayekî tirsnak daketîye. Her wiha raporê amaje pê kir ku pevçûn û şerên li herêmê di sala 2023yan de piştî şerê Xezayê yê 7ê cotmeha 2023yan, befireh bûye. Êdî vê yekê hiştîye ku pileya herêmê di nîsaneya demokrasîyê de dakeve asta herî nizm. Her wiha piranîya dewletên Rojhilata Navîn weke pergalên zordest an jî xwedî demokrasîyên kêm hatin binavkirin.

Piranîya dewletên herêmê di veguherîna demokratîk de bi bin ketin. Êdî ji ber pêkolîya li ser xwegirtina bi îdolojîyên xwe ve, her wiha dîtina armancên xwe yên demdirêj ku pêkanîna wan zehmet e, weke ku ji demorkasîyê baştir in, pergalên van dewletan çaksazkirinên sîyasî li welatên xwe red kirin. Di heman

[17] Nîşaneya demokrasîyê ya ku ji bo nirxandina rewşa demokrasîyê bi giştî tê bikaranîn xwe dsipêre xebatên hilbijartin û pirrengîyê, xebata ferwerîyê, beşdarîya sîyasî, çanda sîyasî ya demokrat û azadîyên sivîl. Dewlet li gor vê yekê li ser pileyan têne rêzkirin: Demokrasîyên temam ku tê de ne tenê azadîyên sîyasî û azadîyên sivîl têne rêzgirtin, lê belê tê de çandeke sîyasî ya giştî heye ku berê wê dide pêşketina demokrasî. Demokrasîyên kêm jî bi hilbijartinên pak û serbest û azadîyên sivîl ên bingehîn têne nasîn e. lê belê di hin alîyên demokrasîyê de xalên lawazîyê yên mezin hene. Pergalên piralî; ku tê de binpêkirinên mezin di hilbijartinan de û fişarên mezin li ser partîyên rikberîyê hene. Her wiha pergalên zordest jî ew in ku tê de pirrengîya sîyasî tune ye yan jî asê hatîye girêdan û tê de azadîyên sivîl têne pasguhkirin.

[18] The Economist Intelligence Unit; DEMOCRACY INDEX 2023/AGE OF CONFLICT; he Economist Intelligence Unit Limited 2024; Link:
https://pages.eiu.com/rs/753-RIQ-438/images/Democracy-Index-2023-Final-report.pdf?version=0&mkt_tok=NzUzLVJJUS00MzgAAAGRS_fmsUe_9Z1SBoczQVÎyMBvG_esQdzPJGlA0y3eDLYDIOI5RFRo8bW_QKgdcNtbPq-zZbNfsi6V1ZasimIVzBaBQ_UtjXDu3USTboKdWJD6U8Q

demê de xwestekên cemawerên xwe yên ji bo bicihanîna rêgezên demmokrasî û pêkanîna çaksazîyên sîyasî û aborî, çewisandin. Berztirîn nîşaneyên vê binkeftinê alozîyên siaysî yên ku li Libnan, Israîl, Tirkî, Iraq, Sûrî û Îran.. û hwd. têne jîyîn in.

- **Karîgerên binkeftina veguherîna demokratîk.**

**1. Karîgerên xweyî (Subjektîv):**

**- Der barê pergalên ferwerîyê de:**

Sepandina desthilatên leşkerî li ser sîyasetê, neçarekirina hilweşîna aborî, neguhdana ji bo bidestxistina bawerîya cemawer bi ferwerîyê û pirkirina kirarên çewisandinê, êdî bûne babetên normal ên ku li welatên Rojhilata Navîn rûdidin. Beztirîn nîşaneyên wê jî tunebûna demokrasîya ku êdî ji bijardeyên sîyasî yên li pey desthilatê dikevin an ji destekê didinê re, bûye têgeheke ji bo geşkirina bangeşeya gelêrî ya ber bi alîyekî demagoj ve. Her wiha bawerîya sîyasî ya piranîya dewletên Rojhilata Navîn bi temamî li dijî rêgezên demokrasîyê ye û demokrasîyê weke gefekê li dijî desthilata xwe dibînin; an ku veguherandine doza hebûna xwe. Jixwe piranîya wan an bi hêza leşkerî yan jî bi fişarên hêzên derve hatine li ser textê desthilatê. Êdî demokrasî ji wan re tê wateya bidawîbûna desthilata yek partîyê her wiha tunebûyîna pêşkarîyên siltanî yên ku pêşkêşî peyrewên xwe yên dilsoz dikin; mîna pawankirina samanin destnîşankirî û rêvebirina ewlekarî ya welêt. Êdî vê yekê bi rêya kurtêlxweran xwe berdaye nava beşên civakên ên cihêreng. Lewre em dibînin ku ev pergal di şerê li dijî veguherîna demokratîk de misogerîya domandina desthilata xwe û pêşkarîyên xwe dibînin. Êdî ev yek bû sedema binkeftina wan bo parastina xaka xwe û ewlekirina welatîyên xwe. Li gor raporan êdî dîyar dibe ku pergalên ferwerîyê li gelek welatên herêmê “alozîyên ewlekarî û aborî yan jî pêdivîya ji bo parastina saxlemîya niştimanperwerîyê” weke behaneyên ji bo zeftkirina desthilatê di destê xwe de bi kar anîne, nemaze li Tirkî û Sûrîyê.

**- Der barê rêxistinên gelêrî de:**

Piranîya raperînên gelêrî ji bo daxwazkirina rêgezên dadmendî û wekhevîyê û dabînkirina ewlekarîya mirovî bi hemû rehendên wê ve, derketin; jixwe ev

hemû jî di nava demokrasîyê de têne hewandin. Lê belê gelek ji van raperînan ji bo pêkanîna veguherîna demokratîk di welatên lê hatine lidarxistin de, bi bin ketin. Ew jî ji ber  gelek sedeman wiha lê hat; yek ji wan jî fobyaya demokasîyê ya li cem komên Islama sîyasî ye, her wiha lawazbûna zanîna sîyasî û danasîna demokrasîyê li cem tevaya gel û serdestîya xwedîyên arezûyên desthilatî ya li ser van raperînan jî. Ev yek li cem rikberîya Sûrîyê ya bi ser Tirkîyê ve ku bi serkêşîya Koma Ixwan El-Mislimîn şaxê Sûrîyê ve tê birêvebirin, dîyar dibe. An ku rikberîya Sûrî karê wê tenê maye ji bo ku xwe bigihîne desthilatdarîyê û pergaleke zordest ji nû ve ava bike. Ev yek di nepêşkêşkirina wê bi belgenameyeke sîyasî ku tê de mafên hemû pêkhateyên sîyasî werin parastin de dîyar dibe. Hemû tiştên ku serkirdeyên komê yan jî wekîlên wan çêl dikin jî li derdora sozên ku di çarçoveya îdolojîya komê ya girêdayî dirûvê desthilatê û rêveberîya jîyana sîyasî, aborî û çandî ya li Sûrîyê de digerin. Pê re jî dûrxistina doza kurdî ji bernameya xwe ya sîyasî ku bi helwesta pergala Tirkîyê re li hev tê, di nav de ye. Heman tişt di rewşa sîyasî ya hundirîn a li Iraq, Tirkî û Libnanê de jî pêk tê.

Di encamê de hişmendîya desthilatdar a çi li cem pergala ferwer an jî li cem hin serkirdayetîyên xwecihî, karîgereke qutebir a binkeftina veguherîna demokratîk e û sedemeke alozîya nasnameyê[19] ya ku li piranîya civakên Rojhilata Navîn tê jîyîn e.

## 2. Karîgerên babetî (Objektîv):

Pevçûn û hevrikîya navneteweyî ya li ser berjewendîyên li Rojhilata Navîn, di binkeftina pêvajoya veguherîna demokratîk a li herêmê de xwedî rol in. Li gor rapora “Economest”ê êdî demokrasîyên cîhanê nikarin rê li pêşîya şerên li hemû deverên cîhanê bigirin, her wiha di rêvebirina pevçûnên hundirîn de jî şarezatîya wan lawaz e. Êdî hevrikîya li ser samanan, pevçûnên sînorî û dozên ewlekarîya herêmî yên di çarçoveya îdolojîyên pergalên serdest de çavkanîya pevçûnên li

[19] Amaje bi tunebûna ramana welatîbûnê di navbera endamên komên mirovî de dike, her wiha lawazbûna hestên girêdana hevpar di navbera endamên civakekê yan welatekî yan jî herêmekê de ku tev lê dijîn û xebitîna bi hev re ya ji bo bicihanîna armancên bala yên welêt… Ji bo betir binasin: Dr. Elaa Ebdilhefîz, Alozîyên sîyasî yên navneteweyî: Danasîn – Cure – Rêveberî, Weşan: Enstîtûya Misirî Ya Lêkolînan 17 nîsana 2020an, lînk: https://eipss-eg.org/الأزمات-السياسية-الدولية-المفهوم-–-الأنواع-–-الإدارة/

Rojhilata Navîn in. Her wiha raporê[20] tekezî li ser vê yekê kir ku “Di sala 2023yan de şerên li Afrîka, Ewrûpa û Rojhilata Navîn, bûn sedema azarên mezin û vebijêrkên guhartina sîyasî ya erênî teng kirin. Bi pirbûna hevrikîya li ser serdestîya Amerîkî û hevrikîya Çînê ya li ser desthilatên cîhanî, her wiha tekezkirina hêzên avakirî; mîna Erebistana Siûdî û Tirkî li ser berjewendîyên xwe, êdî pergala navneteweyî bêtir jihevketî bûye …”

Lewre bidestxistina pergalên serdest ên dewletên herêmî ji alîyê tewereyeke pevçûnê ve di dijayetîya bi dijminan re, yek ji babetên sûdmend e. Nirxê vê yekê jî berdewambûna van pergalan di desthilatê de ye. Ev yek berê tewereyên navneteweyî yên din dide wê yekê ku bi rêya komên rikberîyê yên van pergalan, bêyî cudahîya bawerîya wan a sîyasî, aramîya van pergalan sînordar dikin. Alozîya Sûrîyê jî ezmûneke wiha ye ku mirov dikare wê ji xwe re bike govan; çi ku tê de piştevanîya rûsî û îranî ya bi temamî bo pergala Sûrî heye, her wiha destwerdana yekser a Rûsyayê di sala 2015 de, pê re jî bernameya “Textê Jêmiz” ku dewletên rojavayî di navbea 2011 û 2016 de pêşkêşî rikberîyê kir, heye. Bi awayekî rêjeyî li piranîya dewletên herêmê yên ku li wan pevçûnên leşkerî çêbûn an jî çêdibin, ev yek pêk tê.

Tişta ku hatî vegotin pirsgirêkeke asê bi xwe re derdixe. Bi tevî ku veguherîna demokratîk parçeyeke sereke ji çareserîya alozîyên herêmê ye, her wiha destekê dide ewlekarîya niştimanî û aramî û pêkvejîyanê di navbera bawerîyên cihêreng de pêk tîne, lê belê ji piranîya danûstandinên sîyasî yên niştimanî tê dûrxistin û li şûna wê pergala paran di beşdarbûna di desthilatê de tê dayîn, mîna ku li Iraq û Libnanê pêk hatîye. Tista ku dihêle pirsgirêk mezintir bibe neguhdana hêzên navneteweyî bo vê babetê ye. Her wiha hinek ji wan hêza xwe ya nerm a di çanda demokrasîyê de bi kar tînin da ku destwerdana xwe di karûbarên hundirîn ên dewletan de bi behane bikin. Bi tevî ku dikarin bi rêya sîwana Neteweyên Yekbûyî, nemaze “Benda Heftem” a hevpeyaman wê ya ku xwe dispêre hevpeymanên mafên mirovan, aştî û demokrasîyê li herêmê pêk bînin. Jixwe ev yek bi rêya behaneyên cihêreng xwe jê dûr dixin. Êdî ev yek berê

[20] The Economist Intelligence Unit; DEMOCRACY INDEX 2023/AGE OF CONFLICT; he Economist Intelligence Unit Limited 2024; Link: https://pages.eiu.com/rs/753-RIQ-438/images/Democracy-Index-2023-Final-report.pdf?version=0&mkt_tok=NzUzLVJJUS00MzgAAAGRS_fmsUe_9Z1SBoczQVÎyMBvG_esQdzPJGlA0y3eDLYDIOI5RFRo8bW_QKgdcNtbPq-zZbNfsi6V1ZasimIVzBaBQ_UtjXDu3USTboKdWJD6U8Q

me dide dahurandina ramanwerekî dozên Rojhilata Navîn[21] ê ku hêzên navneteweyî yên serdest bi "Pergala Kapîtalizm" bi nav kirine, wiha da dîyarkirin ku pêdivîya wan bi jinûverêzkirina desthilatê ya bi dirûvê dewleta-neteweyî heye; da ku hebûna xwe bidomîne, berjewendîyên xwe misoger bike û sedemekê ji bo serdestîya xwe ya di herêmê de bi dest bixe.

Di encamê de "serdestîya çavnebarîyan bi ser rêgezan re ye" an ku pragmatîzm û çarçovekirina pevçûnên navneteweyî bi rasteqînîya siaysî[22] re, êdî stratejîya serdest a ku ji alîyê hin hêzên navneteweyî û herêmî ve tê gerandin, derdixe ber çavan. Her wiha ji veguherîna demokratîk re dibe asteng, destekê dide pergalên zordest, asoyên demokrasîyê teng dike û statuyên xwecihî yên alîgirê demokrasîyê, mîna Rêveberîya Xweser a herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê ku xwe dispêre peymana civakî[23] ya ku di dawîya sala 2023yan de ragiahnd, dide ber gefan. Êdî tevaya pergalên serdest ên Tirkî, Sûrî û Îranê û rêxistinên tundrew dijminatîya wê dikin û rê lê teng dikin. Ev hemû xwe dipsêrin helwestên nerênî yên li beramberî vê peymanê û êrîşên ku herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê rastî wan tê, çi bi rêya bombebarana yekser a ji alîyê hêzên tirk ve yan jî bi rêya karên xirab ên ku bi rêya komên alîgirên van dewletan pêk tên an jî bi rêya êrîşên rêxistina DAIŞê.

- **Binkeftina Çarekirina Bermahîyên Bobelatên Surişţî Û Jîngehî:**

Herêma Rojhilata Navîn bi giştî rastî sê bobelatên metirsîdar hatîye, ew jî ev in:

---

[21] ebdullah Ocalan, Manîfestoya Şaristanîya Demokrat \Berga pêncem\ Doza kurdî û çareserîya Neteweya Demokratîk, Werg; Zaxo Şîyar, Çapa duyem 2014, Weşan: Çapxaneya Azadî, R559.

[22] Rasteqînî an ku Realism, her wiha bi rasteqînîya sîyasî jî tê nasîn: Nêrîneke sîyasî ya navneteweyî ye ku tekezîyê li sre hevrikî û pevçûnê dike. Pianîya caran rasteqînî bi nimûneyî û lîberalîzmê re dibe rikber; an ku desthilatdarî û pevçûn bingeha têkilîyên sîyasî yên di navbera dewletan de ne û ya ku têkiîyên navneteweyî bi rê ve dibe, hêz e. Rasteqîner wiha dibînin ku dewletên ku ewlekarî û berjewendîyên xwe yên niştimanî dixin serê lîstê, ew lîstikavê sereke ye û di qada navneteweyî de hokar e…

Zanistnameya Stanford a felsefeyê, Rasetqînî di têkilîyên navneteweyî de, werg: Dîm El-Umerî, Weşan: Hikme, Lînk: https://hekmah.org/الواقعية/

[23] Dikarin li vê peymanê û madeyên wê bi rêya vê bibînin:

ANHA, Peymana Civakî ya Rêveberîay Xweser a herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê, Dîroka Weşanê: 13ê berfanbara 2023yan, Lînk: https://hawarnews.com/ar-العقد-الاجتماعي-الجديد-للإدارة/الذاتية-الديمقراطية-لإقليم-شمال-وشرق-سوريا

## 1. Erdheja Sûrî û Tirkî ya sibata 2023:

Wiha tê dîtin ku ji berîya sed salî ve ev xurtirîn erdhej e ku bû sedema mirina bêtirî 50 hezar mirov û hejmareke mezin a birîndaran, her wiha mişextbûna sedhezarên mirovan û wêranîyeke berfireh a binesazîyê û bajaran li dû xwe hêla. Bi tevî ku saslek jî di ser re derbas bûye, lê belê hîn jî bi hezaran kes hene ku di bin bandorên wê de ne, mîna mişextbûn, tunebûna jêdera rizq û astengdarîyên domdar û hwd. Jixwe berîya erdheja li Sûrîyê, bêtirî 15.3 milyon kes pêdivîya wan bi alîkarîya mirovî hebû, ev hejmar ji destpêka alozîyê ve ya herî bilind e. Êdî piştî erdheja sibatê rewş kambaxtir bû û li gor wê bandor li 8.8 milyon kesî kir û bi hezaran mal û binesazîya jîyangîr wêran kirin.[24]

## 2. Pirbûna Rêjeya Zuwahîyê Ya Ji Ber Guhartina Avhewayê:

Zuwahîyê berê milyonên kesan da ber qiraxa birçîbûnê[25]; ew jî ji ber hilweşîna sektorên çandinî û sewalkarîyê ku her du jî ji hezarên salan ve di herêmê de samanên aborî yên sereke ne. Ji ber guherîna avhewayî û pevçûnan, her wiha lawazîya bersivdayîna ferwerî û navneteweyî, êdî rêjeya tunebûna ewlekarîya xwarinî li deverên cihêreng ên Rojhilata Navîn bilind bûye. Bilindbûna pileya germahîyê ku 1.5 pileya sedanî ya ku ji alîyê peymana Parîsê ya avhewayê ve weke pileya jorîn a germbûna cîhanî hatîye pejirandin, derbas kirîye. Êdî ew bûye karîgereke sereke ya bilindbûna rêjeya zuwahîyê di herêmê de. Li gor wê jî eger pileya germahîyê hîn jî bilind bibe û di heman demê de jî geşedana niştecihî û kêmbûna çavkanîyên avê hene, dê bobelateke jîngehî û aborî pêk were. Piranîya ferwerîyên herêmê nikarîn daxwaza avê bi awayekî domdar pêk bînin; êdî dê para salane ya avê ya her kesekî di herêmên hejar de, heyanî sala 2050î bigihêje 600 $m^3$ û belkî kêmtir jî.[26] Kesên guhdarî vê babetê dikin wiha dibînin ku guherîna avhewayê dê di siberojê de bibe çavkanîyeke

---

[24] UNHCR/The UN Refugee Agency; Syria situation: 2024 situation overview; Link: https://reporting.unhcr.org/operational/situations/syria-situation

[25] Neclaa Bin Meymûn – Hena El-Şehabî, Şkandina xeleka valakirî: Çawa herêma Rojhilata Navîn û bakurê Afrîkayê dikarin tunebûna ewlekarîya xwarinî çare bikin?, Weşan: Encumena Rojhilata Navîn a karûbarên navneteweyî, Dîroka weşanê: 28ê sibata 2023yan, Lînk: https://mecouncil.org/publication?/كسر-الحلقة-المفرغة-كيف-يمكن-لمنطقة-الش/lang=ar

[26] Xenîme El-Itêbî, Bi hejmaran: Rastîyin li ser alozîya avê li welatê ereban, Weşan: Nivîsarên banka navneteweyî, Dîroka weşanê: 19.03.2021, Lînk: https://www.swissinfo.ch/ara-أزمة-المناخ/تهدد-بتوجيه-ضربة-قاسية-لبلدان-الشرق-الأوسط-الغنية-بالنفط-وفق-خبراء/47035280

gengaz a şer û pevçûnan[27], nemaze ku ava wê kêm bûye û ji ber şerên li ser ava paqij a ku ji çemên Nîl, çemên Urdunê, Firat û Dicleyê tê, hatîye jihevxistin. Li gor lêkolîneke avhewayî[28]; amaje pê dike ku pirbûna germahîyê li herêma Rojhilata Navîn, her wiha zuwahî û bilindbûna rûyê deryayê jî bi qateke bêtir ji rêjeya cîhanî bilindtir bûye ku ev yek dê bihêle herêm rastî pêlên germahîyê yên tund were. Êdî herêm ne tenê dê rastî tundîya guherîna avhewayê were; lê belê dê bibe karîgereke sereke ya pêkanîna wê. Ev lêkolîn xwe dispêre wê yekê ku herêma bi petrol û gazê dewlemend, dê di salên pêşîn de ber bi çavkanîyeke sereke ya belavbûna gazên germ, veguhere.

## 3. Qirêjbûn:

Herêm rastî astên bilind ên qirêjîyê tê. Her wiha karkirina tendurist a bi gilêş, gemar û bermahîyên gazan re yên di nava hewa, xak û avê de lawaz e. Qirêjbûna hewayê di lîsta pirsgirêkên jîngehî de ya herî pêşîn e; ew jî li gor raporên girêdayî jîngeh û avhewayê yên herêmê tê destnîşankirin. Di sala 2012an de lêkolîneke zanistî[29] amaje pê kir ku 152925 rewşên mirinê çêbûne; ku ew jî ji ber ku bi demên dirêj rastî pirteyên piçûk ên ku eşkêla wan kêmî 2.5 mîkrometre ye -di zanistê de sembola wê PM2.5 e- û dikare pişka mirovan derbas bike, xwe bigihîne rehên xwînê û bandorên zîyandar li mirov bike; ew jî bi rêya nexweşîyên bêhndanê û yên dil û rehan. Sala 2012an jî navînîya PM2.5 a salane ji 34 mîkrogram\m$^3$ li Tirkîyê gihaşt 108 mîkrogram\m$^3$ li Siûdîyê.

Gelek raporên lêkolînî da dîyarkirin ku gelek çavkanîyên suriştî yên qirêjkirina hewayê li herêma Rojhilata Navîn hene; mîna bayê bi toz, karên mirovî yên girêdayî geşedana avahîsazî û karên pîşesazî, her wiha veguhastin, veberhênana zevîyên petrol û gazê û bermahîyên motoran bi hemû cûreyên wan ve, çavkanîyên herî bêtir ên qirêjkirina hewayê ne. Gava em rewşa heyî bi encamên

[27] SWI swissinfo, Alozîya avhewayê metirsîya lêdana derbeyeke tund li welatê Rojhilatê Navîn bi petrolê dewlemend dide li gor pisporan, 17.10.2021, Lînk: https://www.swissinfo.ch/ara-أزمة-المناخ-تهدد-بتوجيه-ضربة-قاسية-لبلدان-الشرق-الأوسط-الغنية-بالنفط-وفق-خبراء/47035280

[28] SWI swissinfo, Germbûna li Rojhilata Navîn bi du caran ji rêjeya cîhanî xurttir e (lêkolîn), 9.9.2022, Lînk: https://www.swissinfo.ch/ara-الاحترار-في-الشرق-الأوسط-أسرع-بمرتين-من-المعدل-العالمي-دراسة/47888518

[29] Rima J. Isaifan; Air pollution burden of disease over highly populated states in the Middle East; National Library of Medicine; 2023 Jan 6; Link: https://www.ncbi.nlm.nih.gov/pmc/articles/PMC9853520/

zanistî yên girêdayî qirêjîya hewayê yên sala 2012an re hevrû bikin, bê guman em ê bibînin ku em li beramberî alozîyeke metirsîdar a xwedî bandoreke mezin li ser sektorên tenduristî û aborî ne.

Bi tevî ku ev pirsgirêk heyanî rêjeyekê li hin dewletan di bin kontrolê de ne jî, lê belê li piranîya dewletên herêmê alozî ye. Li gor wê jî Sûrî welatê herî bêtir ku ji ber hilweşîna jîngehî ji berîya deh salan ve azar kişandine. Êdî ji ber şerê di navbera rikberî û pergalê de gelek deverên bajarên wê wêran bûne, her wiha gelek binesazîya wê ya rajeguzarî û aborî sist bûye û gelek proje û pêvajoyên jinûveavakirinê rawestîyane. Li kêleka vê yekê jî erdheja ku li bakur-rojavayê wê xistî û pêlên zuwahîyê ku li piranîya deverên wê xistin. Heyanî astekê ku hinek lêkoleran wiha dîyar kir ku guherîna avhewayê yek ji karîgerên alozîya Sûrîyê ya sala 2011an e; ew jî ji ber fişara civakî û aborî ya ku ji ber tundtirîn pêlên zuwahîyê ku di salên 2006-2009 de çêbû û bû sedema penaberbûna bêtirî milyonek cotkar ber bi bajaran ve[30]. Sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî yê karûbarên mirovî "Marten Grîfits"[31] dîyar kir ku "Asoyên rewşa mirovî ya Sûrîyê sala 2024an piştî derbasbûbna salekê di ser erdhejên ku li Sûrîyê xistin re û bêtirî 13 salan li ser şerê li welêt derbas bûne, hîn jî rewş giran e…" Her wiha amaje pê kir û gor: "Hejmareke sosret a sûrîyan ku bêtirî 16.7 milyon kesî ye pêdivîya wan bi alîkarîya mirovî heye -nêzî sê çaryek ji hejmara niştecihên welêt- jixwe ji destpêka alozîyê ve ev mezintirîn hejmara kesên xwedî pêdivî ye.." Her wiha di destpêka sala 2024an de jî bombebarana Tirkî ya li ser êstgehên petrol û gazê yên li bakur û rojhilatê Sûrîyê bû sedema qirêjbûneke metirsîdar a hewayê, her wiha bû sedema ku petrola xav derbasî nav ava çemê Ceqceqê[32] bibe ku bi dest xwe re derbasî nav ava çemê Xabûrê jî bû û di encamê de gelek zîyanên jehrî li jîngeha herêmê kirin.

Her wiha hilweşîna kangeha zêran a herêma Erzîncanê li rojhilatê Tirkîyê di destpêka sala 2024an de, hişt ku xaka madeya sîyanîd a bijehir a ku di derxistina

---

[30] SWI swissinfo, Alozîya avhewayê metirsîya lêdana derbeyeke tund li welatê Rojhilatê Navîn bi petrolê dewlemend dide li gor pisporan, 17.10.2021, Lînk: https://www.swissinfo.ch/ara-أزمة-المناخ-تهدد-بتوجيه-ضربة-قاسية-لبلدان-الشرق-الأوسط-الغنية-بالنفط-وفق-خبراء/47035280

[31] Nûçeyên Neteweyên Yekbûyî, Sûrî, Rewşa mirovî giran e û tekezîya navneteweyî ji bo rawestandina tundîya şer, Weşan: Malpera Neteweyên Yekbûyî, Dîroka weşanê: 27ê sibata 2024an, Lînk: https://news.un.org/ar/story/2024/02/1128762

[32] North Press, Çemê Ceqceqê ji ber derbasbûna bermahîyên petrolê ku ji ber bombebarana tirk a li dû hev li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê qirêj bûye, Dîroka weşanê: 29.1.2024, Lînk: https://npasyria.com/179593/

zêr de tê bikaranîn, di nav newala nêzî Çemê Feratê de wer bibe. Dibe ku ev yek jî bihêle ev madeya bijehir bikeve nav çem û bobelateke qirêjîyê pêk bîne ku bandora wê dê bigihêje Sûrîye û Iraqê jî. Jixwe di sal 2022yan de ev kangeh ji ber belavbûna vê madeya bijehir hatibû girtin, lê paşê û tevî nerazîbûna opozisyon û rêxistinên jîngehî, hikûmeta tirkî careke din ev kangeh vekir.[33]

Piştî teqîna mezin û bêşîrove ya Emonyayê (nêzî 2.750 ton) li bendera Beyrûtê di 4. 8. 2020an de, li Libnanê mezintirîn bobelata qirêjîyê çêbû û di encamê de nêzî 300 hezar kes eware bû û nêzî 5000an birîndar bû û bi sedan jîyana xwe ji dest da û zîyan gihaşt nêzî %86 ji sazîyên nêzî cihê teqînê.[34] Di encama vê teqînê de qirêjîyeke jîngehî ya metirsîdar (ji ber made û paşmayên ku bi Espistonê[35] bi qirêj bûne û hin bermahîyên kîmyayî yên din ên ku gefan li jîngeh û tenduristîya giştî dixwin) rû da û heya niha ev kêşe hê bandorên wê hene[36].

Herêm bi madeyên xwe yên aborî û enerjîya xwe ya nûbûyî û cihê xwe yê xaknîgarî ku wê digihîne bazarên mezin, gelekî cuda ye. Ev yek jî taybetmendîya geşepêdana bileztir û danûstandina baştir a bi bobelatên cûr bi cûr re didîyê. Lê belê çeksazîyên aborî ji yên sîyasî ne cihê ne. Ji ber wê jî binkeftina di pêkanîna guhertina demokratîk li herêmê, yek ji serdemên sereke yên binkeftina çareserkirina kêşe û bobelatên xwezayî û jîngehî ye û bêyî guhertina demokratîk, madeyên niştumanî, mirovî û xwezayî dê bi awayekî baş ji bo

---

33 Hure, şemitîna axê dikeve kangeheke zêr li Tirkîyê û di 9 karker winda ne. dîroka weşanê 13. 2. 2024. Lînk:
https://www.alhurra.com/turkey/2024/02/13

34 Jasmin Lilian Diab & Ibrahim Jouhari; CONFLICT, CRISIS, AND MIGRATION: MARITIME IRREGULAR MIGRATION FROM LEBANON SINCE 2019 (ANALYSIS); Publisher: Friedrich Naumann Foundation for Freedom Madrid; May 2023; Link: Conflict%20Crisis%20and%20Migration_Lebanon_Ibrahim_Jouhari_Jasmin_Diab_FINAL_.pdf

35 Peymangeha Fafo ya xebat û lêkolînên civakî, teqîneke mezin a nîvê kirîzan de: Teqîna Beyûtê bandor li sazîyên sivîl kir, weşanger: Rêxistina Xebatên Navneteweyî. Dîroka weşanê tebaxa 2021ê. Lînk:
https://www.ilo.org/wcmsp5/groups/public/---arabstates/---ro-beirut/documents/publication/wcms_816474.pdf

36 Navenda Libnanê ya Lêkolînan, Riwangeha Hikûmetê hejmar 19: Paşmayên metirsîdar ên teqîna Bendera Beyrûtê, dîroka weşanê 4. 6. 2021. Lînk:
https://www.lcps-lebanon.org/articles/details/2455/the-government-monitor-no-19--hazardous-waste-from-the-beirut-port-explosion?lang=ar

çareserkirina welatan neyên bikaranîn. Çimkî pergalên desthilatê bi dabînkirina kursîyên xwe û tevlîbûna di nav nakokîyên navneteweyî de mijûl in û miletê wan pergalan hewil dide bi rêbazên cûr bi cûr dabara jîyana xwe bike û rewşenbîr û welatparêz ji hêla îdolojîyên tundrew û bragmatîka welatên ku herêm desteser kirîye ve dorpêçkirî ne. ev yek jî rêjeya tundrewîyê bi hemû awayên wê zêde dike û rêjeya koçberîya ji welat jî bêtir dike.

**Sêyem- Binkeftin di qedexekirina geşepêdana tundrewîya bawerîyê bi hemû alîyên wê:**

Îdolojî xwedî roleke mezin di şaristanîyên Rojhilata Navîn de lîstine û alîkarî di pêşxistina dozên jîyana aborî û civakî bi awayekî rast an jî ne rast kirine. Van îdolojîyan dozên civakî kirin dozine îdolojî (her wekî îdolojîya islamî) û tundrewî endam dan da ku van dozan bi rê ve bibin û rê li ber îdolojîyên din bigirin. Bi vî awayî tundrewî bû weke rêbazeke ji bo sepandina desthilatê li ser civakê  û ev yek bû mîna şêweyekî desthilatdarîyê. Ji bo ku her tişt di bin kontrolê de bimîne, tundî û tirsandin hatin bikaranîn. Bi vî awayî peywira îdolojîyê bû sepandina desthilatê û dabînkirina berdewamîya wê li şûna peywira wê ya sereke ku birêxistinkirina jîyana civakê û watedarkirina wê ye.

Tundrewîya ramanî ya sîyasî û îdolojî bi alîyên wê yên neteweyî û olî (tîreyî û mezhebî) yek ji karîgerên sereke yên alozîya sîyasî ya welatên herêmê û binkeftina hewildanên demokratkirinê ye. Hema hema tevahî lêkolerên civakî li hev dikin ku "tundrewî, afeta civakan û jêdera kînê ye" û êdî bûye alozîyek ku tevahî civakên Rojhilata Navîn wê jiyan dikin. Şerên ku niha li Sûrîye, Iraq, Israîl û Filestînê diqewimin û binpêkirinên mafên mirovan li hemû welatên Rojhilata Navîn, amajeyê bi rastîya vê gotina navborî dikin.

Ferhenga Têgehên Terorê[37] ya ku ji hêla Hevpeymana Islamî ya Leşkerî ve derketîye, teror wisa pênase kiriye: "Teror, dûrketina ji tiştên navîn e û ew bi giştî zêdekirina di bawerîyê de ku dibe sedema gihandina ziyanê bû xelkê (çi bi awaykî ramanî yan pratîkî be)."

[37] Dr. Xalib Ebdilezîz Zamil, pêvajoya dîrokîya tundrewîyê, weşanger: Hevpyemana Islamî ya Leşkerî ya şerê li dijî terorê, 5. 10. 2020. Lînk:
https://www.imctc.org/ar/eLibrary/Articles/Pages/Articles5102020.aspx

Di adara 2024an de, hikûmeta birîtanî, pênaseyeke nû da tundrewîyê û wisa got[38]: "Ew belavkirin an jî piştgirîya îdolojîyekê ye ku li ser tundî yan kînê yan levneborînê rabûye û armancên wê ev in:1. Tunekirin an jî binpêkirina maf û azadîyên sereke yên kesên din 2. Sînordarkirin an jî guhertina pergala Şahsama Yekbûyî ya demokratîk a perlemanî ya lîbralî û mafên demokratîk 3. Peydakirina zemînekê bi zanebûnê da ku rê bide kesên din ku encamên xala 1 û 2 pêk bînin."

Lêkolînên civakî, tundrewî bi desteserî, tundî, nijadperestî, hişkbûn û nerazîbûnê ve girê dane. Hin ji pênaseyên wan ev in[39]: "Tundrewî, baerîyek an jî hejmarek bawerîyên desteserîyê ne ku mafê çespandinê didin xwe û pêwîstîya wan bi palpiştan tune ye û gumanê di rastîya vê yekê de napejirîne û bi yek carê sêwirandina çewtîya wê nayê pejirandin."

"Tundrewî, yek ji rêbazên nijadperestîyê ye ku xwedîyê wê di tişta ku bawerîyê pê tîne de tundrew e û pê re hestên tûj û bertekên dijwar hene . Ev hest di hin rewşên taybet de dibe ku reftarine dijminane yên tund bi xwe re bînin.”

Lêkolînên şerîetê tundrewî bi zêdekirina tiştan û kûrbûna di axaftinê ve girê dane ku her du jî dibin sedema derketina tiştên nû di îdolojîyê de[40]

Li gor pênaseyên navborî, mirov dikare bibêje ku tundrewîya ramanî bi her du alîyên wê ve (tundî û desteserî) çarçoveyeke ramanî ya hişk e ku bi herîya dogmayî, demagojî, pragmatî û barana wê hatiye strandin lê bi bawerîyeke giyanî yan jî çandî hatiye nixumandin. Her kesê di vê çarçoveyê de, kesên ji

[38] Sam Fransîs, ji ber şerê li Xezayê… pênaseyeke nû ya tundrewîyê li Brîtanyayê, weşanger: BBC News erebîk, dîroka weşanê: 14. 3. 2024. Lînk https://www.bbc.com/arabic/articles/c280zddp8dko

[3939] Kovara Fakulteya Perwerdehîyê/ Zanîngeha Ezherê, rola branşan di geşkirina ramanên xwendekarên fakulteya şerîetê li zanîngeha Ordunê ji bo girtina rê li ber tundrewîyê (hin branş weke nimûne), weşanger: Kovara Fakulteya Perwerdehîyê/ Zanîngeha Ezherê, hejmar 169, beşa yekem, 2016. Lînk: https://jsrep.journals.ekb.eg/article_32151_dde5d78a0f4d9828d85b610d5e4c4ced.pdf

[40] zêdekirina tiştan: derbaskirina tiştên bisînor e (ferhenga wateyên eleketronîk).. Di Qurana pîroz de zêdekirina tişta hatîye qedexekirin. Quran wisa dibêje: `` Ey xwedîyên pirtûkên pîroz! Tişta li ola xwe zêde nekin û ji bilî rastîyê li ser Xweda nebêjin.`` her wiha wisa gotîye: `` Ey xwedîyên pirtûkên pîroz! Ji bilî heqîyê tiştan li ola xwe zêde nekin û nedin pey şopa miletekî ku ji rê derketine û gelek kes jî ji rê derxistine û rêya rastîyê winda kirine.``

derveyî wê weke şer û dijmin dibîne, lewma gerek e her kes bikeve vê çarçoveyê û yê nekeviyê dê çarenûsa wî kuştin û tundî be. Ev yek dihêle ev cûre tundrewî bibe yek ji nimûneyên çanda kînê.

Sedema zêdebûna bangeşeya kînê û parçebûnên kûr di civakan de û helwestên dijminane di navbera civakan de û peydabûna xerîbîya civakî û alozîya nasnameyê, îdolojîyên tundrew in. Ev îdolojî handerên piranîya binpêkirinan in (her wekî kuştinên tekane û yên komî, êşkencekirin, tundî, riswakirin, qewitandin û koçberkirina bi darê zorê…). Îdolojîyên tundrew alavên sereke yên pêngavên komployan di navbera alîyên şer li herêmekê yan li ser herêmekê de ne. Wiha çêbûye ku êdî dewletên ku dixwazin deverekê desteser bikin, van îdolojîyan bi kar tînin (çi bi behaneya şerê li dijî wan an jî piştgirîya wan); çimkî kesê serweran desteser bike, peyrewan jî desteser dike. Jixwe weke birêz Ocelan dibîne, xuya ye ku bi rêya xwedagirkirinê, ev dewlet desteserîya xwe bi awayekî arzantir disepînin.[41]

Li Rojhilatê Deryaya Spî girêdanên olî, mezhebî û neteweyî di ser girêdana niştimanî re ne. Gelek caran nasnameya çandî bi yeke din tê guhertin û ya pêşîn ji hêla partî yan komeke tundrew ve di qalibê wan ê îdolojîk de tê helandin. Dema mirov dîmenê sîyasî û ewlekarî li rojhilatê Deryaya Spî bişopîne, mirov dê zêdebûna tundrewîya olî û neteweyî û olîya xwedî hestên neteweyî bibîne. Ev yek ji hêla komek rêxistinên çalak di alozîyan de tê nimandin ku ew tundîya zêde ji bo sepandina desteserîya xwe bi kar tînin. Mirov dikare wan li ser du komên tundrew dabeş bike; koma islama sîyasî û alîyên wê yên tundrew (sinî û şîî) û pergalên desthilatê yên yekpartî. Ya ku di pergala wan a ramanî de tê xuyakirin, dijminatîya wan a hevbeş ji demokrasîyê re ye û tunebûna lêborînê li ba wan û peydabûna bangeşeya kînê ya taybet bi her alîyekî ji wan alîyan.

- **Ji bo komên islama sîyasî bi alîyên wê yên sinî û şîî**

Kesên ku xwestekên desthilatîyê li ba wan hebûn, nelevkirinên ramanî yên di navbera şîa û sina de, kirin nakokîyên ramanî û tewanbarkirina hev bi gawirtîyê; da ku şerê li dijî hev rewa bikin. Her alîyekî îdolojîyeke tundrew a

[41] Ebdela Ocelan, Manefîstoya şaristanîya demokratîk, bergîna pêncem, doza kurdî û çareserîya neteweya demokratîk, wergêr: Zaxo Şîyar, çapa duyem 2014, weşanxaneya Azadî, r121.

taybet bi xwe afirand û di encamê de bi dehan şerên xwînî di navbera wan de qewimîn. Ji ber van şeran gelek têkçûnên mirovî, madî û giyanî yên mezin çêbûn. “Desteserîya nû xwe pîroz dike û xwe dike weke xwedyekî. Yan ew ola kevn li gor berjewendîyên xwe diguncîne yan jî wê dike çend mezheb û alîyên wan ên ku wan cuda dike têne der yan jî dixwaze bi rêya dariştina olê yan jî mîtyolojîyeke nû xwe xurt û mayînde bike, wate dîsa ji alîyê îdolojîk ve…”[42]

Dîmenê niha yê vê nakokîyê aloztir dixuye û êdî rêjîma îranî ji destpêka sedsala 21ê ve ji rewşa berevanîyê ber bi rewşa êrîşê ve çûye; ew jî di bin navê “hinardekirina şoreşa islamî” de. Îran bi rêya wekîlên xwe şerê dijminê xwe yê xwecihî û herêmî û navneteweyî dike û bawerîya xwe ya ewlekarîyê di qada pêvajoyên xwe yên herêmî de dariştîye. Wê navê bindest û perîşanan li gelên ku li Rojhilata Navîn çewisandî ne, kirîye û navê “hêzên pozbilindîyê” li pergalên desthilatên xwecihî û dewletên desteser û tevahî rêxistinên ku berovajî îdolojîya wê ne, kirîye. Ew propogendayê dike ku rizgarîya van kesên hejar û perîşan ew e ku ew bikevin vê îdolojîyê, bibin peyrewên wê yan jî hevalbendên wê. Îran heya astekê karîbû bi rêya rêxistinên xwecihî yên ku bawerîyê bi îdolojîya wê tînin (her wekî Hizbullaha libnanî û iraqî û komên Hûsîyan) nakokîyan bi dijminê xwe re li Iraq, Sûrî, Libnan, Filestîn û Yemenê bi rê ve bibe. Wê li her bajarekî bi çarçoveya xwe ya jeopolîtîk karîbû rêxistineke taybet bi xwe ji welatîyên wan welatan ên şîî saz bike. Ev yek mîna tecrubeya soviyetî ya bi tevgerên komonîst ên li cîhanê re ye. Lê bi giştî xwestek û hêvîyên sîyasî bêsînor in. Ji ber wê jî rêjîma îranî hewl dide şîatîya ku bi îdolojîya wê sînorkirî ye, belav bike û deverên ku ne di bin serwerîya wî de ne, bi rêya dron û şaneyên veşartî û komên hevalbendên xwe re, êrîşî wan bike; ew jî bi rêya dana piştgirîya saloxgerî bo wan û bandorkirina li biryara sîyasî ya rêjîmên desthilatê li Sûrî, Iraq û Libnanê û hewldana ku wan bi yek carî bixe bin kontrola xwe.

Sîyaseta herêmî ya rêjîma îranî, ewlehî li herêmê nehişt û parçebûna tîreyî di navbera civakên xwecihî de kûrtir kir û bangeşeya kînê ya ku îdolojî wê bi kar tînin, zêde û geş kir. Pergala leşkerkirinê ya ku li ser civakên girêdayî rêjîma îranî hatine sepandin, hişt ku heman tişt li ser civakên din were sepandin da ku xwe biparêzin. Geşbûna tundrewîya şîî, dihêle tundîya li dijî wê jî geş bibe, bi taybet

[4242] Ebdela Ocelan, Manefîstoya şaristanîya demokratîk, bergîna pêncem, doza kurdî û çareserîya neteweya demokratîk, wergêr: Zaxo Şîyar, çapa duyem 2014, weşanxaneya Azadî, r561

li  ba komên islama sîyasî yên sinî. Ev yekî jî herêmê dixe giraveke ji nakokîyên bêdawî. Ji alîyekî din ve rêxistinên mîna El-Qaide, DAIŞ û Ixwanan li ser heman rêbazî dimeşin û bi rêya navên mîna xîlafet, îmaret û dewleta islamî hewl didin desthilatdarîya xwe li ser welatên herêmê bisepînin. DAIŞ rêxistina herî zêde civakên xwecihî û çanda wan wêran kiriye û bi rêya hişmendîya jêkirina serîyan û kolekirina zayendî û laşî û kuştinên komî û êşkencekirina hovane û koçberkirina bi zorê li hember kesên li dijî xwe, zora El-Qaide jî bir. Ixwan jî ji hêla piranîya dewletên erebî ve weke komeke terorîst tê pejirandin, nexasim piştî ku bû sedema alozîyên metirsîdar ku gef li ewlehîya neteweyî ya wan welatan xwar. Li Misirê (weke mînak) hema nemabû ku Tirkî bi rêya komên ixwanan ên li Misrê, ewlekarîya neteweyî ya Misrê desteser bike. Li Sûrîyê jî ixwan bûn serê rimê di şerê li dijî hêzên demokratîk û doza kurdî rol lîstin. Ev jî tê wê wateyê ku tevgera cemawerî ya li Sûrîyê ji destê hêzên niştimanî û demokratîk hat derxistin û biryarên sîyasî yên opozisyonê hatin desteserkirin û ketin bin kontrola Tirkî de[43]. Di encamê de ew beşdarî dagirkirina Efrîn, Girê Spî û Serê Kanîyê bûn û şêxên wê fitwe derxistin ku kuştin û koçberkirina kurdan helal e. Heya niha hê milîsên ixwanan sîxurîyê ji bo dagirkerê tirk dikin û beşdarî pêngavên koçberkirina bi zorê ya li dijî kurdan de dibin. Jixwe ev yek bi rêya bi dehan raporên mafnasî û daxuyanên taybet bi pêşewayên komê tên tekezkirin. Her wiha ixwan nerîneke dijminane li hember tîreya elewî jî dide diyarkirin; carinan şerê rêjîmê dike û carinan li Astana û Sûtçîyê danûstandinê pê re dike da ku bigihêje desthilatê.

Ji bo El-Qaide jî, ew xwedî projeyeke taybet e lê ji ber stratejîya wê ya ku xwe dispêre şerê dijminê dûr (dewletên rojavayî, Çîn û Rûsya), bandora wê li ser erdê kêm e. Lê ev yek nayê wê wateyê ku ew ne amade e ku şeran û pêngavên xwekujîyê li dijî dijminên xwe yên herêmî (rêxistin û pergalên desthilatê) bike.

Girêdayî heman mijarê, tundrewên cihû jî destpêşxerîyên aştîyê yên navneteweyî û erebî beravêtî kirin û rê li ber çareserkirina şerê filestînî-israîlî girtin û bûn sedem ku tundrewîyeke dijber ji hêla Hemasê ve derkeve ku wê jî di 7.10.2023yan de êrîş bir ser mêtingehên nêzî Xezayê û nêzî 200 sivîlên israîlî revandin û bi dehan ji wan kuştin. Li hember wê jî hêzên israîlî jî êrîşên

[43] rojnameya el-Ereb: piştgirîya ixwanan ji pêngava Şaxê Zeytûnê re li Sûrîyê. Dîroka weşanê 26. 1. 2018. Lînk:
https://alarab.co.uk?مساندة-إخوان-سوريا-لـغصن-الزيتون-الانتماء-للجماعة-أولا/amp

tolhildanê birin ser Xeza û Eldife El-Xerbîye ku ev yek bû sedema komkujî û hilweşînên mezin li Xezayê û nêzî milyonek sivîlên filestînî koçber bûn. Vê pêngava Hemasê ya ku pêkanîna wê baş bû lê plana wê ne baş bû, doza filestînî ji alîyê stratejîk ve kir bin metirsîyê û bû sedema bobelateke mezin ku mîna wê ji dema soza Bilfor ve bi serê gelê filestînî de nehatibû. Bandora wê li ser asta herêmê belav bû û rêjîma îranî doza filestînî bi kar anî da ku hêzdarîya xwe ya sîyasî, leşkerî û ewlehî li herêmê xurt bike û baregehên şer û pevçûnên li hember dijminên xwe yên herêmî û navneteweyî bi pêş bixe.[44]

- **Ji bo pergalên desthilatê yên neteweyî:**

Tu dewleteke neteweyî li Rojhilata Navîn tune ye bêyî ku di rewşeke şer de be; çi bi dewletên din re çi jî bi gelê xwe ji alîyê hundirîn ve. Wan dewletan afirandina ramanî li ba civakên xwe kuştine. Ev yek berevajî hikûmetên demokratîk e ku bêtir derfeta afirandinê li cem wan heye û meyla wan a şer kêmtir e.

Di vê galegala rageşîyan a ku ji ber oldarên tundrew li herêmê rû dane, pêngavên komploger ên AKPê bi rêya rêjîma tirkî ya heyî li Tirkîyê û derveyî wê tên der. Wê pêngava guhertina ber bi demokrasîyê ve li Tirkîyê ku xwe dispêre destpêşxerîya Tevgera Azadîya Kurdistanê (piştî sala 2013) têk bir, pergala desthilatê li Tirkîyê ji perlemanî ber bi serokatîyê ve (piştî derbeya angaşkirî ya sala 2016) guhert, dijberên desthilatê bi behaneyên terorê yan jî beşdarîya di derbeya leşkerî de çewisandin û hewl da civakên di hundirê dewleta Tirk de islamî bike. Her wiha îdolojîya AKPê ya xwedî rêbaza osmanî dewleta Tirk ber bi ferehkirina çarçoveya xwe ya herêmî (weke sîyaseta herêmî ya rêjîma îranî) çû. Wê xwe bi awayekî yekser spart pergala cîhanî ya ixwanan da ku raperînên ereban desteser bike û vê yekê weke alavekê ji bo desteserkirina welatên wan

[44] rêgezên şer (Rules of engagement /ROE) amaje dikin ku rênimayên leşkerî û fermanên ku ji hêla desthilata leşkerî ya pispor ve tên derxistin, dîyar dikin bê kengî û li kuderê û çawa û li dijî kê hêza leşkerî tê bikaranîn. Ev yek xwedî bandor e li ser rêkarên ku tên standin ji hêla leşkeran ve. Her wiha ev rêgez rênimayên ku dê ji hêla evserê fermandar ve dê werin derxistin dîyar dike. Rêgezên şer beşek ji danpêdana giştî ye ku rêkar û pîvan di birêvebirina şerê nûjen û bikêrhatina wê de pêwîst in.
Encyclopaedia Britannica; rules of engagement; Link: https://www.britannica.com/topic/mobilization

bi kar bîne. Vê siyasetê guhertina ber bi demokrasîyê ve li welatên ereban têk bir. Tevî ku li hin welatan (weke Misr û Tûnis) hinekî aramîya hundirîn piştî têkbirina hêzdarîya ixwanan, peyda bû jî lê welatên mîna Sûrî, Lîbîya û Sûdanê hê astengîyan ji ber destwerdana di karûbarên wê yên hundirîn ji hêla hêzên derveyîn ve dikişînin. Ev dewlet parçebûnên siyasî yên dijwar dijîn ku bûn sedema parçebûna xaknîgarîya van welatan an jî lawazîya hestên niştimanî. Dewleta Tirk bû beşek ji arîşeyên herêmê û karîgerek di gurkirina rageşîyê de. Li bakurê Sûrîyê rêjîma tirkî li gor îdolojîya AKPê pêngavên qirkirina nijadî der heqê kurd, xiristîyan û êzîdîyan de pêk tîne. Ew jî bi rêya pêngavên koçberkirin, avakirina mêtingehan, sîyaseta tirkkirinê, binpêkirina mafên mirovan û islamkirina civakên xwecihî û yên ku hatine herêmê di çarçoveya îdolojîya AKPê û ixwanan de. Ev tev bi rêya çete û milîsên wê yên rikberîya sûrî. Her wiha ew bi awayekî ji awayan başûrê Kurdistanê û bakurê Iraqê bi rêya baregehên xwe yên leşkerî yên li herêmên PDKê dagir dike. Van sîyasetan alozîyeke nû li Sûrî û Iraqê peyda kir û hişt herêm ber bi kilmoza rageşîyeke metirsîdar ve here.

Tevî alozîya ku li Sûrîyê ji ber hişmendîya Beisê pêk hatiye û tevî ku ew bûye jêdera sereke ya kêşeyan li Sûrîyê û tevî ku rêjîmê nikarîbû opozisyonê bi hemû alîyê wê ve têk bibe jî, rêjîma Sûrîyê jî hê xwe bi hişmendîya Partîya Beisê ya tundrew ve girê daye. Li şûna ku ev rêjîm guhertineke demokratîk li Sûrîyê peyda bike ku levkirineke niştimanî bi xwe re bîne û berjewendîyên welat dabîn bike, çû hewara xwe gihand rêjîmên îranî û rûsî û xwe kir çarçoveya şerê hebûnê bi gelê sûrî bi hemû pêkhateyên wî re. Vê jî parçebûn li welat peyda kir û hin beşên wê kirin bin dagirkerîya tirkî û hişt hêzdarîya komên cîhadîst ên tundrew zêdetir bibe.[45] Her wiha bû sedema zêdebûna xelayê û paşveçûna aborîyê û tunebûna xizmetguzarîyan û tunebûna biryara serwerî û veguhestina xaknîgarîya welat ber bi qadeke şer a dewletine din ve û ji bilî van alozîyan. Sûrî piştî 2011an nema weke berî wê ye û alozîyên wê zêdetir bûne û li gor rewşa heyî ya alozîya sûrî, xuya ye ew nema vedigere weke berê.

Ji bo dewleta Israîlê, di guncavbûna bi çarçoveya xwe ya jîndetî de bi bin ket û wê nikarîbû têkilîyên xwezayî bi welatên ereban re ava bike yan jî navê

---

[45] Wateya wê berxwedan û dana kedê ye. Nakokî di navbera zanayan de der barê wateya cîhadê de û rewşên ku tê de li ser cîhadê tê erêkirin, heye, nexasim di navbera feqeyên sine û şîa û mezhebên din de. Li Bol Robinson, Ferhenga Ewlekarîya neteweyî veger. Wergêr û weşnager: Navenda Îmaratê ya Lêkolînên Stratejîk, çapa yekem, 2009. Ebû Zebî, r161

"dijmin" ji bawerîya ewlekarîya neteweyî ya ereban ji ser xwe rake. Her wiha wê nikarîbû levkirina ibrahîmî ya bi hin welatên ereban ên kendavê re yan jî rêkeftinên aştîyê yên ku bi Misir û Urdunê re îmze kirine, baş veberhênan bike. Bawerîya wê ya sîyasî hê li ser koçberkirina filestînîyan û pêkanîna projeya Israîla mezin radibe. Hin rêjîmên desthilatê yên neteweperest û komên tundrew ev yek bi kar anî da ku pencê xwe yê ewlekarîyê yê li ser civakên xwecihî yên herêmê rewa bikin û dahatên aborî yên niştimanî ji bo xurtkirina hêza xwe ya leşkerî bi kar bînin û bi vî awayî desthilata xwe xurt û dabîn bikin. Ev tev bi behaneya berevanîya li hember dijminê sehyûnî. Heya niha hê Israîl beşek ji alozîyên herêmê ye.

Ji alîyekî din ve û tevî ku Iraq dikare xwe ji pergala yekpartîyê rizgar bike û tevî ku Libnan ne di bin desthilateke giştgir de ye, lê ev bajar hê alozîyan dijîn. Ev alozî ji hêla komên tundrew (mezhebî û olî) û rêjîmên yekpartî ve pêk hatine. Ev rêjîm her tim hewil didin destwerdanê di karûbarên van dewletan ên hundirîn û derveyîn de bikin û biryarên wê desteser bikin.

Ev tiştên hatin gotin, xwe dispêrin bûyerên ku di dîmenê sîyasî, ewlehî û leşkerî de yên ku li Rojhilatê Deryaya Spî hene. Pêwîstîya vê yekê bi palpiştan tune ye. Her alîyekî stratejîk, projeyên xwe yên sîyasî û dijmin û hevalên xwe ragihandine. Ev yek jî nîşan dide ku komên islama sîyasî bi alîyên xwe yên tundrew (sinî û şîî) û tundrewên cihû û pergalên desthilata neteweyî[46] û sedemên hebûna wan, beşek ji pirsgirêkên herêmê û jêdera alozîyên wê ne. Di encamê de peydanebûna guhertina ber bi demokrasîyê ve, lawazîya çareserkirina bobelatan û alozîyên aborî, zevîyeke baş ji bo geşkirina tundîya bawerîyê bi hemû alîyê wê ve, peyda kir û alozîyên herêmê gelekî zêdetir kirin û alozîyeke nû peyda kir ku ew jî zêdebûna diyardeya koçberî û koçberkirina bi darê zorê ye.

[46] Ocelan dibîne ku dîyardeya desthilatê di bingeha alozîyên civakî de ye û ew tekez dike ku dewletên neteweyî li Rojhilata Navîn alavên hişyarkirina alozîyan û xurtkirina wan in. ew bi yek carê ji rewşa çandî ya civakên herêmê qutbûyî ye, ji ber wê ew nikarin pirsên civakî çareser bikin.
Ebdela Ocelan Manefîstoya şaristanîya demokratîk, bergîna pêncem, doza kurdî û çareserîya neteweya demokratîk, wergêr: Zaxo Şîyar, çapa duyem 2014, weşanxaneya Azadî, r564

**Çarem- Binkeftina li hember pêngavên koçberî û koçberkirinê:**

Ji ber zanîn, dahatên wê yên aborî, cihê wê yê olî û karîna xwespartina li newal û çîyayên wê, Rojhilatê Deryaya Spî her tim meqseda koçber û komên mirovî bû. Lê van sih salên dawî pêlên koçberîyê yên mezin jê ber bi derve ve çêbûn (çi ev koçberî bi razîbûna xwedîyên wê be yan bi zorê be). Ev koçberî ber bi welatên ku ji alîyê aborî ve pêşketî û ji alîyê ewlehîyê ve baş, çêbû. Gelek lêkoler tekez dikin ku sedema vê yekê alozîyên ku li herêmê rû dane ye.

Koçberî weke têgeh tê wateya ku “mirovek an komek ji dewleta ku tê de dijîn ber bi dewleteke din ve ku ranahêjin nasnameya wê, bar bikin da ku lê bijîn…barkirina ji welat bo welatekî din da ku lê bijî…barkirina ber bi welatekî din ve ye da ku bi awayekî domdar lê bijî…”[47] Ajansa Koçberîyê ya girêdayî NY “IOM” kesê koçber wiha pênase dike:[48] “Her mirovek e ku di sînorê navneteweyî de yan jî di nava dewleteke dûrî cihê niştina xwe, xwe veguhest, bêyî ku rewşa wî ya zagonî di ber çavan re were girtin û bêyî ku were nasîn ka ev veguhestina wî bi dilê wî ye yan bi zorê ye û bêyî sedem û qasîya niştina wî were nasîn…”

Ji ber zêdebûna alozîyan li herêmê, dabara jîyanê zehmet bûye û bar li ser milan giran bûye û êdî jiyan bûye astengî û nerehetî û mirov êdî zehmetîyan di pêkanîna xwestek û hêvîyên xwe de, dikişînin û her tim di wê tirsê de ne ku rastî gef û metirsîyan werin. Van rewşan jîngeheke zehmet û dijwar afirand ku gelek kes nikarin pê re biguncin. Vê jî fişarên derûnî, nerehetî, xerîbbûna derûnî û hwd peyda kirin û ev tev bi hev re bi hêz mirov ber bi koçberîyê ve dibin.

Ji ber alozî, bobelat û rageşîyên bawerîyê yên ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibin, êdî koçberîya ne bi zorê nema karîgereke girîng e di analîzkirina dîyardeya koçberîyê de, çimkî koçberîya bi darê zorê [49]bûye nimûneya sereke ya proseyên

[47] Ferhenga Meanî ya Eleketronîk; pênaseya koçberîyê di Ferhenga Meanî ya Cami- ferhenga Erebî-Erebî, lînk:
https://www.almaany.com/ar/dict/ar-ar/هجرة/

[48] Malpera NY, koçberî/dozên cîhanî, Lînk
https://www.un.org/ar/global-issues/migration

[49] koçberîya bi zorê: Ew koçberîya neçar e ku mirov ji ber şer û pevçûnên sîyasî yan jî ji ber faktorên xwezayî (erdhej, volkan, zuhabûn) yan jî ji ber bêkarî û belavbûna afetan û carinan jî ji ber projeyên geşepêdanê yên mezin (her wekî avakirina bendav û bajarên mezin) rastî wê

veguhestina komên mezin ên mirovan ji cihên xwe yên ku li wan alozî, bobelat û rageşî nehe. Îcar gelek karîger hene ku mirov neçar dikin ji welatê xwe bar bike. Ev yek baş diyar dibe dema mirov dîmenên koçberîyê dibîne ku tê de mirov xwe didin kuştin da ku bigihêjin welatên dewlemend an jî aram. Mirov ji bo wê xwe berdidin nava çiya, derya, daristan, berf û sînorên zehmet.

Li welatên Rojhilata Navîn rêjeya koçberîya bi zorê zêde bûye. Di sala 2019an de, Rêxistina Koçberîyê Ya Navneteweyî amaje kir ku li Sûrîyê rêjeya herî bilind a penaberên hundirîn heye û gihaştîye 6.1 milyon mirov. Rêxistinê dît ku Sûrî welatê herî zêde koçberan hinarde dike û hejmara wan bûye zêdeyî 6 milyon kesî.[50] Di amara dawî de ku di dîroka 29ê sibata 2024an de hatiye kirin, hejmara koçberên sûrî yên ku hatine tomarkirin, gihaşt 5050437 kesên sûrî, ji wan 1.9 milyon sûrî li ba NY a karûbarên koçberên li Misir, Iraq, Urdun û Libnanê hatine tomarkirin û 3.76 milyon kesên sûrî li ba hikûmeta Tirkîyê tomarkirî ne û 41 hezar koçberên sûrî li bakurê Afrîkayê tomarkirî ne.[51] Piştî ku 13 sal di ser alozîya sûrî re derbas bûn, hê ew alozîya herî mezin a koçberîyê li cîhanê pêk tîne. Zêdeyî 12 milyon kesên sûrî bi darê zorê ji herêmê hatin koçberkirin.[52]

Li Libnanê ji ber rewşa sîyasî, kêmbûna derfetên kar û zêdebûna alozîyên wê yên aborî, darayî, sîyasî, tenduristî û mirovî, koçberî zêde bûye. Li gor amarên Banka Navneteweyî[53], ji sala 2015an ve li Libnanê koçberî zêde bûye û salane nêzî 200 hezar kes li Libnanê kêm dibin. Niha jî zêdeyî nîvê niştecihên Libnanê

---

tên. hejmarek têgehên din ji têgeha koçberîya bi darê zorê tên der, her wekî penaberî, koçberkirin û ji bilî wan…
NRLSê: Koçberîya bi zorê li bakur û rojhilatê Sûrîyê. Lêkolînek e ku di komcivîna ``Koçberî û koçberkirin li bakur û rojhilatê Sûrîyê``, sedem, bandor, pêşinyar û rêkar``. Qamişlo 28. 1. 2024

[5050] Nûçeyên NY, Rêxistina navneteweyî ya Koçberîyê, koçberîya navneteweyî digihêje 270 milyon kesî, zêdeyî nîvê wan li Ewropa û Amerîkaya bakukr dijîn, dîroka weşanê, 27ê mijdara 2019an, lînk:
https://news.un.org/ar/story/2019/11/1044521

[51] The Operational Data Portal (ODP); Syria Regional Refugee Response; Last updated 29 Feb 2024; Link: https://data.unhcr.org/en/situations/syria

[52] [52] UNHCR/The UN Refugee Agency; Syria situation: 2024 situation overview; Link: https://reporting.unhcr.org/operational/situations/syria-situation
Jasmin Lilian Diab & Ibrahim Jouhari; CONFLICT, CRISIS, AND MIGRATION: MARITIME IRREGULAR MIGRATION FROM LEBANON SINCE 2019 (ANALYSIS); Publisher: Friedrich Naumann Foundation for Freedom Madrid; May 2023; Link: Conflict%20Crisis%20and%20Migration_Lebanon_Ibrahim_Jouhari_Jasmin_Diab_FINAL_.pdf[53]

(%55) gihaştine yan jî di bin xeta hejarîyê de ne. Rêjeya bêkarîyê jî zêde dibe û niha gihaştîye %30. Di vê kêşeya aborî de, lîreya libnanî zêdeyî %90 ji nirxê xwe ji dest daye. Li gor hin hejmarên ku xwe dispêrin hejmarên fermî yên Rêveberîya Ewlekarîya Giştî ya li Beyrûtê[54], rêjeya welatîyên libnanî yên ku di sala 2021ê de koçber bûne, li gor sala berî wê bi qasî %346 zêdetir bûye. Ya ku kêşeyê aloztir dike, hejmara kesên koçber li Libnanê li gor hejmara niştecihên wê yên resen gelekî mezin e, an ku zêdeyî %40 e.  Ev kesên koçber jîyaneke pir zehmet û kêşeyeke rastîn dijîn.

Rêjeya filestînîyan a herî mezin ji alîyê koma mirovî ya bê nasname li cîhanê. Rewşa wan a herî demdirêj a koçberan e li cîhanê ku çareserî jê re nehatîye dîtin. Piştî 75 salan ji pirsa filestînî, niha nêzî 5.9 milyon koçberên filestînî li welatên Rojhilata Navîn dijîn. Jixwe piştî vî şerê Xezayê yê dawîyê, careke din ev koçberî zêdetir bû.[55]

Li Tirkîye êdî sozên rêjîmê ku ew ê Tirkî bike navendeke şaristanî, tenê mane weke gotin û propagandayê ragihandinê; çimkî wî nikarîbû koçberîyê rawestîne. Koçberên tirkî niha di pileya sêyem de ne ku doza koçberîya ber bi Yekîtîya Ewrûpayê ve dike (piştî sûrî û afganîyan).[56] Hejmara daxwazên tirkan ên koçberîya ber bi Yekîtîya Ewrûpa di sala 2020an de 15834 bû, di sala 2021ê de zêde bû û gihaşt 23764an. Di sala 2022yan de gihaşt 55446an û di sala borî de gihaşt hejmareke gelekî mezin ku ew jî 100870 ye. Wate rêje bi qasî %80 zêde bû. Jixwe pêwîstî bi lêkolînan tune ye da ku sedema vê koçberîyê were nasîn. Tenê dema mirov li sozên rêjîmê guhdar bike ku ew ê dabara jîyanê baş bike û alozîya sîyasî ya hundirîn çareser bike, dê bizane ku rewşa aborî û debara jiyanê û kêmkirina azadî, dadmendî, mafê mirovan û ji bilî wan her bi paş ve diçin. Tu nîşaneyên guhartina rêjîmê ji sîyaseta xwe ya tundrew re naxuyin. Ji ber wê jî

[54] Heman jêdera borî.

[55] By Nathan Citino, Ana Martín Gil, and Kelsey P. Norman; Generations of Palestinian Refugees Face Protracted Displacement and Dispossession; Migration Policy Institute; MAY 3, 2023; Link:
https://www.migrationpolicy.org/article/palestinian-refugees-dispossession

[56] Serkîs Qesarjîyan, tirk piştî sûrî û efxanîyan ê herî zêde doza koçberîya ber bi Ewropayê ve dikin… bijîşk jî di serê van koçberan de ne, weşanger: Malpera Nehar a erebî, dîrok: 7. 3. 2024, lînk:
https://www.annaharar.com/arabic/politics/international/turkey/208469-الأتراك-بعد-السوريين/والأفغان-الأكثر-طلبا-للجو-إلى-أوروبا-والأطبا-في-الصدارة

gerek e mirov navê koçberîya asayî li koçberîya tirkan neke, çimkî ew koçberîyeke bi darê zorê ye.

Sedema sereke ya binkeftina çareserîyan li hember koçberî û koçberkirinê, domdarîya alozîyên siyasî û aborî li herêmê ye. An ku binkeftin di van alîyan de heye; pêkanîna guhertina ber bi demokrasîyê ve, çareserkirina encamên bobelatên xwezayî û jîngehî û rawestandina zêdebûna tundrewîya bawerîyan. Projeyên sîyasî û îdolojîk ên rêjîmên sûrî, îranî, rûsî û tirkî, hişt ku alozîyên demografîk li Sûrîyê pêk werin. Bi sedên hezaran kes rastî pêngavên guhertina demografîk ên pilankirî hatin û ji cihên xwe hatin koçberkirin û li şûna wan kesin din hatin bicihkirin da ku jîngehek peyrew û kontrolkirî were avakirin. Li vir pêwîstîya gotina "binkeftina peydakirina çareserîyan ji bo koçberî û koçberkirinê", ji alîyê zanistî ve bi nerîneke nû heye; çimkî li vir pêngavên koçberî û koçberkirinê yên bi qestî hene da ku cihekî xaknîgarî were desteserkirin. Koçberkirina bi hezaran kes ji bajarên sûrî yên mezin, hêza civakî ya opozisyona li dijî rêjîmê lawaz kir û vê jî hişt desthilat bêtir karibe bidome. Her wiha koçberkirina bi hezaran ji dijberên rêjîma tirkî jî, ev rêjîm xurt kir û heman tişt ji bo Îranê jî derbasdar e ku dijberên Hizbulahê li Libnanê hatin koçberkirin. Heman rêbaz ji hêla DAIŞê ve di navbera salên 2014-2019an de li Sûrî û Iraqê hat bikaranîn. Her wiha koçberî û koçberkirina bi hezaran ji niştecihên resen ji herêmên ku Tirkî li bakurê Sûrîyê dagir kirine û avakirina penagehan, dagirkerîya wê xurt kir û domand.

Îcar pêngavên rawestandina koçberî û koçberkirinê tune ne lê belê bi rêya rêjîmên desthilatê li welatên Rojhilata Navîn zêde dibe; ev tevî ku koçberî dibe sedema kêmbûna hêza karkirinê û kêmbûna hejmara mezêxeran û dibe sedema paşveçûna geşbûna aborî û zêdebûna hejarîyê. Jixwe dema kesên pispor koçber bibin, rewş aloztir dibe. Ev yek jî ji alozîyên herêmê yên metirsîdar e ku pê re tu çareserî nehatine dîtin.

### Pêşveçûna Alozîyên Rojhilatê Deryaya Spî:

Tu nîşaneyên çareserîyan bo alozîyên herêmê naxuyin. Pranîya siyasetên herêmî ber bi qutbûyînê ve û ber bi sînrodarkirina alozîyan li pey dîwarên ku bi milyarên dolaran hatine avakirin, diçin. Ev li şûna ku hevkarîyeke komî hebe da ku ev alozî werin çareserkirin, nexasim di demekê de ku cîhan ber bi pergalên

nêzî konfedralîyê ve di alîyên sîyasî, aborî û berevanîyê de diçin. Bê guman eger aramî û hedarî li welatên derdorê çênebin, aramî dê li ser asta xwecihî ya tu welatên din jî çênebe. Lê xuya ye ev yek hê dûrî pêkanînê ye. Hikûmeta Iraqê ragihand ku wê dest bi avakirina beşekî ji dîwarên bîtonî di navbera xwe û Sûrîyê de kirîye. Ew ji herêma Baxozê dest pê dike û dê li ser asta sînorê sûrî-iraqî were avakirin. Wezîrê hundirîn ê iraqî “Ebid el-Emîrê Şemerî”[57] ev dîwar weke “xeta berevanîyê ya yekem di ber Iraqê re” dibîne. Iraqê ragihand ku ew ê dîwarekî di navbera xwe û Sûrîyê de ava bike. Behaneya wan ji bo vê yekê jî, girtina rê li hember qaçaxî , koçberî û çeteyên DAIŞê ye. Her wiha Tirkîye jî hema hema dîwarê xwe di navbera xwe û Sûrîyê da ava kir ku dirêjahîya wê 911 km e. Dîwarê tirkî ji dîwarên berêavakirî pêk tê. Dirêjahîya her yekî ji wan çar mitir e û pehnatîya wî sê mitir e.[58] Her wiha Israîlê jî berî her kesî dîwar di navbera xwe û Urdun û Filestînê de ava kirîye û Libnan û Urdun jî kar dikin da ku dîwar di navbera xwe û Sûrîyê de ava bikin ku pê re kamîreyên pêşketî û burc û têl û leşkerên biçek hebin. Jixwe behaneya wan jî şerê qaçaxî û koçberîyê ye.

Siyaseta avakirina dîwaran, di rastîya xwe de binkeftina li hember çareserkirina alozîyên herêmê dinimîne. Piranîya dewletên herêmê, ji ber sînordarbûna bawerîyên wan ên siyasî û leşkerî û aborî bi îdolojîya wan a tundrew re, di nava rageşîyên siyasî û ewlekarîyê de ne. Ev dewlet li pey stratejîyên ku li ser bingehên pragmatîk hatine dariştin, dimeşin[59]. Ev stratejî tekez dike ku desthilat, şer û desteserî bingehên têkilîyên ên siyasî di navbera dewletan de ne. Ew xwe dispêrin vê yekê; parastina ewlehîya hundirîn û derveyîn bi rêya xweveşartina li pey perdeya têgeha ewlekarîya neteweyî. Vê jî hiştîye ku herêm di kêşeyeke ewlehîyê de bijî. Ev jî pişta wê bawerîyê digire ya ku dibêje kêşe û alozîyên Rojhilata Navîn bê dawî ne, ev bawerî digihêje astekê

---

[57] Desteya Hundirîn/Komara Iraqê, ji bo xurtkirina ewlekarîya sînor…wezîrê hundirîn dîwarê konkirîtî li ser sînorê iraqî-sûrî vedike, dîroka weşanê: 28. 1. 2024. Lînk: https://moi.gov.iq/?article

[58]Ensae Ozdemir, Tirkîye hema hema dîwarê welahîyê yê bi Sûryê re bi dawî dike, weşanger Ajansa Anadolê, dîrok: 17.11.2017. lînk: https://www.aa.com.tr/ar/معرض-الصور/تركيا-تضع-اللمسات-الأخيرة-على-الجدار-الأمني-مع-pg-سوريا/447863/146

[59] Bol Robinson, ferhenga Navneteweyî ya ewlekarîyê, werger û weşan: Navenda Îmarat a lêkolînên stratejîk, çapa yekem, 2009, Ebûzebî, r248.

ku dewletên herêmê weke dewletên binkeftî werin dabeşkirin (her wekî Sûrîyê). Yan jî ber bi binkeftinê ve diçin, her wekî Tirkîye, Libnan, Israîl û Filestînê.

Di encamê de berdewamîya alozîyên herêmê, dê parçebûnên siyasî yên kûr zêdetir bike û dê welatan ji hev bixe. Ev yek dihêle nasnameya niştimanî winda bibe û pergala siyasî hilweşe. Ev tev ji ber parçebûn û nakokîyên hundirîn pêk tên. Her çi qasî hin pergalên desthilatê desteserîya xwe bi awayekî tund disepînin, lê ew ê dawî bi bin bikevin; çimkî wan pirsgirêk ji kokê ve çareser nekiriye. Her wiha ji ber ku ew bi xwe jêdera alozîyên niştimanî û beşek ji alozîyên herêmî ne.

Destpêka çaresrîyan di van tiştan de ye: dema pergalên desthilatê bi gelên xwe re li hev werin, çeksazîyên siyasî werin kirin û ew sergiha çeksazîyên aborî bin û ev tev bi serpereştîya rêveberîyeke niştimanî ya zana be.[60] Jixwe ev yek pêk nayê bêyî ku welat ber bi demokrasîyê ve herin; çimkî demokrasî dê karibe parçebûna yekîtîya çandî di civakên Rojhilata Navîn de rawestîne û karibe têgeha yeknetewe derbas bike û civakeke niştiman a demokratîk ava bike. Ew jî bi rêya derbaskirina têgeha “dewletbûna neteweyî” di çarçoveya rêgezên tije azadî, wekhevî û demokratîk de. Her wiha gerek e Islam ji îdolojîya teror û gefan were rizgarkirin û rêveberîya xweser a demokratîk were avakirin bêyî ku destwerdan di sînorên heyî de were kirin (wate di çarçoveya yekîtîya niştimanî ya demokratîk li Rojhilata Navîn de). Ev yek dê rêya çareserîyê ji bo alozîya aborî ya heyî bibîne. Herêm ji alîyê samanan ve ne hejar e lê pêdivîya wê bi pisporî û birêveberîya baş heye da ku van samanan bi awayekî baş di geşepêdana di hemû alîyan de bi rê ve bibe û ewlehîya mirovî û niştimanî pêk bîne. Ev yek bi rêya aborîya komînal dê pêk were. Her ku çîna desthilatê destê xwe ji ser aborîyê rake, ew qasî dozên aborî dê ber bi çareserîyê ve herin. Ji ber ku weke Ibin Xeldûn dibêje: “Bazirganîya ji şahan ziyanê digihîne welatîyan…” Ev yek derfetê dide sazîyên hikûmetê da ku paşmayên bobelatên xwezayî heya astekê çareser bikin û bi rêya xwegihandina li pêşketina zanistî û tenknîkî û bikaranîna wan di çeksazîyê de, pirsgirêkên jîngehî jî çareser bikin. Ev yek dê jîngeheke ewle ji alîyên sîyasî, aborî û çandî ve peyda bike û dê bawerîya gel bi hikûmetên

[60] Birêveberîya baş, ew birêveberî ye ku li ser sincên kar û rahiştina berpirsîyarîyê li hember kes û madeyên di dest de yên ku gereke bi awayekî zana werin bikaranîn, radibe. Têgeha birêveberîya zana girêdayî geşepêdana domdarû berpirsîyarîya civakî ye.

wan xurt bike. Ev yek jî dê rê li ber ramanên tundrew bigire, çimkî hingî dê civak ji hikûmetê bêtir li hember van ramanên sexte rawestin; çimkî pejirandina ramanên tundrew di pirê caran de, ne sedema alozîyan in lê belê encama wan in. Ev yek dê derfetê bide welatan da ku hevkarîyê bi hev re bikin û ewlehîya herêmî pêk bînin. Ev mijar tev dê rê li ber koçberî û koçberkirinê bigirin. Gerek e were zanîn jî ku jin nîvê civakê ye û mirov nikare alozîyên civakî bi dawî bike bêyî jina azad a ku bi rûmet dijî.

*********

## Jêder û çavkanî:

- ***Jêderên bi zimanê erebî:***

*1. Bol Robinson, ferhenga Navneteweyî ya ewlekarîyê, werger û weşan: Navenda Îmarat a lêkolînên stratejîk, çapa yekem, 2009 Ebû Zebî.*

*2. Şadî Ebdilwehab, bijarteya bêdengîyê: Bikaranîna "pêngavên komployî" di birêvebirina helwestên navneteweyî, weşanger: Musteqbel a lêkolînên pêşkerî, dîroka weşanê 9. 7. 2017. Lînk:*
*https://futureuae.com/ar-a/Release/ReleaseArticle/386-الخيار-الصامت-توظيف/*
*العمليات-التآمرية-في-إدارة-التفاعلات-الدولية*

*Sexrî Mihemed, Alozîya sîyasî…têgeh û rehend, weşnager: Ferhenga mezin a cezairî ya lêkolînên sîyasî û stratejîk, dîrok: 14. 3. 2021 . Lînk:*
*https://www.politics-dz.com/الأزمة-السياسية-المفهوم-والأبعاد/*

*3. Ebdela Ocelan, Manefîstoya şaristanîya demokratîk, bergîna çarem, doza kurdî û çareserîya neteweya demokratîk, wergêr: Zaxo Şîyar, çapa duyem 2014.*

*4. Ebdela Ocelan, Manefîstoya şaristanîya demokratîk, bergîna pêncem, doza kurdî û çareserîya neteweya demokratîk, wergêr: Zaxo Şîyar, çapa duyem 2014, weşanxaneya Azadî.*

*5. Dr. Elai Ebdilhefîz, Alozîyên sîyasî yên navneteweyî: têgeh, cûre û birêvebirin, weşanger: Peymangeha misrî ya lêkolînan, dîrok: 17ê nîsana 2020, lînk:*

*https://eipss-eg.org/الأزمات-السياسية-الدولية-المفهوم-–-الأنواع-–-الإدارة/*

*6. Dr. Xalib Ebdilezîz Zamil, pêşveçûna dîrokî ya tundrewîyê, weşanger: Hevpeymana Islamî ya leşkerî li dijî terorê, dîroka weşanê 5. 10. 2020. Lînk:*

*https://www.imctc.org/ar/eLibrary/Articles/Pages/Articles5102020.aspx*

*7. Xenîme el-Etêbî, bi hejmaran, rastîyên li ser alozîya avê li cîhana erebî, weşanger: Nivîsên Panka navneteweyî, dîrok: 19. 3. 2015. Lînk:*

*https://blogs.worldbank.org/ar/arabvoices/numbers-facts-about-water-crisis-arab-wor*

*8. Dr. Macid Mensûr, guhertina ber bi demokrasîyê ve û bandora wê li ser beşdarîya gerêlî di çeksazkirina destûrî de, weşanger: Zanîngeha Menofîye. Lînk:*

*https://jslem.journals.ekb.eg/article_182820_a1b9c97fac6a2f88900e7cae86c7ad72.pdf*

*9. Mihemed Hisên Heykel, Pirsgirêkên derûnî yên ku Rojhilata Navîn kontrol dikin, çapa yekem 1958, weşanger: beşgeha Erebî ya Çap û weşanê.*

*10. Neclai bin Meymûn- Hena Şehabî, şikandina xeleka valakirî: çawa Rojhilata Navîn û bakurê Aferîkayê dikarin tunebûna ewlehîya tîmarî çareser bikin, Meclisa Rojhilata Navîn a karûbarên navneteweyî, dîrok: 28ê reşemîya 2023yan. Lînk:*

*https://mecouncil.org/publication?/كسر-الحلقة-المفرغة-كيف-يمكن-لمنطقة-الش/lang=ar*


## Jêderên bîyanî:


1. *The Economist Intelligence Unit; DEMOCRACY INDEX 2023/AGE OF CONFLICT; he Economist Intelligence Unit Limited 2024; Link:*

https://pages.eiu.com/rs/753-RIQ-438/images/Democracy-Index-2023-Final-report.pdf?version=0&mkt_tok=NzUzLVJJUS00MzgAAAGRS_fmsUe_9Z1SBoczQVÎyMBvG_esQdzPJGlA0y3eDLYDIOI5RFRo8bW_QKgdcNtbPq-zZbNfsi6V1ZasimIVzBaBQ_UtjXDu3USTboKdWJD6U8Q

2. Jasmin Lilian Diab & Ibrahim Jouhari; CONFLICT, CRISIS, AND MIGRATION:

MARITIME IRREGULAR MIGRATION FROM LEBANON SINCE 2019 (ANALYSIS); Publisher: Friedrich Naumann Foundation for Freedom Madrid; May 2023; Link:

Conflict%20Crisis%20and%20Migration_Lebanon_Ibrahim_Jouhari_Jasmin_Diab_FINAL_.pdf

3. Nathan Citino, Ana Martín Gil, and Kelsey P. Norman; Generations of Palestinian Refugees Face Protracted Displacement and Dispossession; Migration Policy Institute; MAY 3, 2023; Link: https://www.migrationpolicy.org/article/palestinian-refugees-dispossession

4. The Operational Data Portal (ODP); Syria Regional Refugee Response; Last updated 29 Feb 2024; Link: https://data.unhcr.org/en/situations/syria
5. Rima J. Isaifan; Air pollution burden of disease over highly populated states in the Middle East; National Library of Medicine; 2023 Jan 6; Link:

https://www.ncbi.nlm.nih.gov/pmc/articles/PMC9853520/
6. UNHCR/The UN Refugee Agency; Syria situation: 2024 situation overview; Link:

https://reporting.unhcr.org/operational/situations/syria-situation

## Navendên lêkolînan:

1. Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk; koçberîya bi zorê li bakur û rojhilatê Sûrîyê, lêkolînek e ku di komcivîna Koçberî û Koçkirinê li bakur û rojhilatê Sûrîyê de hatîye pêşkêşkirin: sedem, bandor, pêşinyar û rêkar. Li Qamişlo 28. 1. 2024.
2. Navenda Libnanî ya lêkolînan, riwangeha hikûmetê hejmar 19, paşmayên metirsîdar ên ku ji ber teqîna bendera Beyrûtê encam dane. Dîrok: 4. 6. 2021. Lînk: https://www.lcps-lebanon.org/articles/details/2455/the-government-monitor-no-19--hazardous-waste-from-the-beirut-port-explosion?lang=ar

3. Kovara Fakulteya Perwerdehîyê/ Zanîngeha Ezherê, rola branşan di geşkirina ramanên xwendekarên fakulteya şerîetê li zanîngeha Urdunê ji bo girtina rê li ber tundrewîyê (hin branş weke nimûne), weşanger: Kovara Fakulteya Perwerdehîyê/ Zanîngeha Ezherê, hejmar 169, beşa yekem, 2016. Lînk: https://jsrep.journals.ekb.eg/article_32151_dde5d78a0f4d9828d85b610d5e4c4ced.pdf
4. Peymangeha Fafo ya kar û lêkolînên civakî: teqîn di nava alozîyan de: Teqîna Beyrûtê bandor li ser sazîyên sivîl kir, weşan: Rêxistina Karê Navneteweyî. Dîrok: tebaxa 2021ê. Lînk: https://www.ilo.org/wcmsp5/groups/public/---arabstates/---ro-beirut/documents/publication/wcms_816474.pdf

## Ferheng:

1. Ferhenga El-Meanî El-Cami.
2. Ferhenga Mezin a Îmam Ibin Baz.
3. Ferhenga Mezin a Stanford a Felsefeyê.
4. Ferhenga Mezin a Siyasî: political-encyclopedia
5. Encyclopaedia Britannica
6. Ferhenga Mezin a dîroka cîhanê.

***Malperên nûçeyan:***

1. Ibrahîm el-Ulebî, piştî piştgirîya Erdogan ji êlên erebî li Dêra Zorê, gelo Tirkîye dê bi awayekî leşerkî destwerdanê bike? Weşanger: El-Cezîre, dîrok: 9. 9. 2023. Lînk: https://www.aljazeera.net/politics/2023/9/9/بعد-تأييد-أردوغان-للعشائر-العربية-في

2. Nûçeyên NY, Sûrîye: rewşa mirovî tarî ye û tekezîyeke navneteweyî heye ku gerek e rageşî bilez were rawestandin. Dîrok: 27ê reşemîya 2024. Lînk: https://news.un.org/ar/story/2024/02/1128762

3. El-Hure: Şemitîna axê xwe birdide nava kangeheke zêr li Tirkîyê û 9 karker winda ne. dîrok: 13. 2. 2024. Lînk: https://www.alhurra.com/turkey/2024/02/13/انزلاق-للتربة-يجتاح-منجما-للذهب-في-تركيا-و9-عمال-مفقودون

4. Sam Fransîs; ji ber şerê Xezayê, pênaseyeke nû a tundrewîyê li Brîtanyayê, weşanger: BBS NEWS erebîk, dîroka weşanê: 14. 3. 2024. Lînk: https://www.bbc.com/arabic/articles/c280zddp8dko

5. Serkîs Qesarjîyan, Tirk piştî sûrî û efxanîyan, ên herî zêde doza koçberîyê bo Ewrûpayê dikin…bijîk di serê wan de. Weşanger, Malpera Nehar a erebî, dîrok: 7. 3. 2024. Lînk:

https://www.annaharar.com/arabic/politics/international/turkey/208469-الأتراك/بعد-السوريين-والأفغان-الأكثر-طلبا-للجو-إلى-أوروبا-والأطبا-في-الصدارة

6. Rojnameya el-Ereb; piştgirîya ixwanan ji Şaxê Zeytûnê re li Sûrîyê. Dîroka weşanê: 26.1. 2018. Lînk:

7. Nûçeyên NY, Rêxistina navneteweyî ya Koçberîyê, koçberîya navneteweyî digihêje 270 milyon kesî, zêdeyî nîvê wan li Ewrûpa û Emerîkaya bakukr dijîn, dîroka weşanê, 27ê mijdara 2019an, lînk:
https://news.un.org/ar/story/2019/11/1044521
https://alarab.co.uk/مساندة-إخوان-سوريا-لـغصن-الزيتون-الانتماء-للجماعة-أولا?amp

8. Malpera NY; koçberî/dozên cîhanî. Lînk: https://www.un.org/ar/global-issues/migration
https://www.aa.com.tr/ar/pg/معرض-الصور/تركيا-تضع-اللمسات-الأخيرة-على-الجدار-الأمني-مع-سوريا/146/447863

9. North Peres; qirêjbûna çemê Ceqceqê, ji ber bermahîyên betrolê ye ku ew jî encama topbarana domdar a Tirkîyê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê re ye. Dîroka weşanê: 29.1.2024. lînk:
https://npasyria.com/179593

10. Desteya Hundirîn/Komara Iraqê, ji bo xurtkirina ewlekarîya sînor…wezîrê hundirîn dîwarê konkirîtî li ser sînorê iraqî-sûrî vedike, dîroka weşanê: 28. 1. 2024. Lînk: https://moi.gov.iq/?article

11. ANHA; peymana civakî ya Rêveberîya Xweser a herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê, dîrok: 13ê kanona pêşîn 2023. Lînk:
https://hawarnews.com/ar/العقد-الاجتماعي-الجديد-للإدارة-الذاتية-الديمقراطية-لإقليم-شمال-وشرق-سوريا

12. Ensae Ozdemir, Tirkîye hema hema dîwarê welahîyê yê bi Sûryê re bi dawî dike, weşanger Ajansa Anadolê, dîrok: 17.11.2017. lînk:
https://www.aa.com.tr/ar/pg/معرض-الصور/تركيا-تضع-اللمسات-الأخيرة-على-الجدار-الأمني-مع-سوريا/146/447863

13. SWI swissinfo: Qeyrana seqayê (li gor pisporan) gefan li welatên Rojhilata Navîn ên têrbetrol dixwe, dîrok: 17ê cotmeha 2021. Lînk:
https://www.swissinfo.ch/ara/أزمة-المناخ-تهدد-بتوجيه-ضربة-قاسية-لبلدان-الشرق-الأوسط-الغنية-بالنفط-وفق-خبراء/47035280

14. SWI swissinfo: Germbûna li Rojhilata Navîn bi du caran ji rêjeya cîhanî zûtir e (lêkolîn). 9ê îlona 2022. Lînk:
https://www.swissinfo.ch/ara/الاحترار-في-الشرق-الأوسط-أسرع-بمرتين-من-المعدل-العالمي-دراسة/47888518

# QIRÊJÎYA JÎNGEHÊ Û ASOYÊN WIZEYA BERDÊL

Cîhan di roja me ya îro de dîlê li ber destê pêşketinên şaristanî ye û ji ber pêşketin û serkeftinên xwe yên zanistî binkeftî ye; hemû jî ji ber ramana afirîner û pêşketina bi ked û jêhatîbûnê xemilandî ku ew kiriye jankêşê çêkirîyên destê xwe. Her çi qasî jî li xweşî û kêfxweşîya ku texmîn dike dilxweş dibe jî, gava li rewş û halê ku gihiştiyê dinêre, vê rastîya xirab dibîne. Di qadên zanistî de gavin gelekî mezin avêtin û dikarîbû gelek cûreyên enerjîyên ku dibin sedema jiyaneke pêşketî, bi dest bixe. Weke gava yekem dest danî li ser enerjîya sotemenîya berdîneyî û dikarîbû bi saya wê gelekî bi pêş bikeve. Lê belê heyanî hinekî bi xweşguzarîya vê yekê dilxweş bû, êdî bû qurbanê wê; çi ku enerjîya petrolî bi bikaranînên xwe yên berfireh û gelek, cîhan tijî dûmanên pîs kir. Mîna rewşa ku li bajarê Qamişlo heye ku ji ber bikaranîna zêde ya jeneretorên kehrebeyê yên mezin ku gemar û qerebalixê belav dikin û bermahîyên ji erebeyan derdikevin, nemaze yên li ser dîzela kalîtekêm dixebitin, her roj pir xirabtir dibe.



***Yek ji dîmenên qirêjîya jîngehê li bajarê Qamişlo***

Piştî wê êdî sotemenîya jiyangîr ku bi madeya Etîlîn tê nasîn û ji hin berhemên çandinîyê derdixîne, bi dest xist. Lê diyar e ku ev vedîtin di ewlekarîya xwarinî de kêşeyekê çêdike. Piştre jî karîbû enerjîya nûklerî ya bi şiyana xwe ya tîrêjdarî pir xurt, bi kar bîne. Lê weke tê zanîn nerênîyên wê ji erênîyên wê bêtir in. Jixwe enerjîya hewayî jî heye ku dikare wizeya berdêl (paqij) vejîne, lê belê ev yek demkî û pir kêm e. Lewre jî enerjîya rokê wizeya berdêl a herî baş e ku berê mirov dide xaçerêyeke bi encamên ewle. Çi ku rok li ser rûyê goga zemînê xwedî başîyeke mezin e. Her wiha enerjîya rokê çareserîya kokdar a hemû pirsgirêkên ku ji ber enerjîyên ku me anîn zimên derdikevin e; mîna guhartina keşûhewayê ya ji ber germbûna cîhanî derdikeve û li ser jiyanê dibe metirîyeke mezin.

Destkeftîyên teknolojî yên ku dehsalên çûyî de pêk hatine, her wiha pirbûna mezin a hejmara niştecihên cîhanê hiştiye ku qaseyeke mezin a enerjîyê were mezaxtin. Êdî li gor wê jêderên enerjîya klasîk ên avî, petrolî… hwd. ku stûna bingehîn a şoreşa pîşesazî ya di sedsala borî de bûn, nema têrê dikin ku pêdivîyên cîhanê di dema me ya niha û siberojê de pêk bînin. Nemaze ku ev kereste ber bi ziwabûn û tunebûnê ve diçin û nema têra pêdivîyên jiyanê dikin. Êdî di vê rewşê de enerjîya rokê ya bêsînor û paqij pêdivîyeke jêneger e.

Gava em bixwazim hêza enerjîya rokê binasin, bi hêsanî em dikarin bibêjin ku ew hêz e; ya ku fîloya Romanî ya di sala 212 BZ de ji alîyê zanyarê Grîkî Erxemîds ve, bi rêya mirêkê şewitand. Stêrnasê fransî jî "Kasnê" sala 1747'an bi lênsa xwe ya rokê ku eşkêla wê 112 cm bû, dikarîbû pileya germahîyê ya bi qasî 1000º ku dikare metalan bipişêve, bi dest bixe. Zanyar Lavwazê jî dikarîbû firineke rokê ku pileya wê ya germahîyê digihêje 1760º ava bike. Sala 1912'an jî Şoman êstgeheke rokê ya cîhanî ku heyanî wê çaxê mezintirîn êstgeha rokê bû li Misirê ava kir û enerjîya elektrîkê bi hêza (45÷37) kîlowatt vedijand. Kompanîya Bêl a telefonan sala 1954'an şaneyên rokê ji madeya sîlîkonê ava kirin ku dikarin şiyaneke enerjîya rokê bi rêya hilavêtina rokî ava bike. Vê yekê rê ji Yekîtîya Soviyetê re vekir ku sala 1958'an yekemîn satelatyta ku li ser enerjîya rokê ya bi rêya van şaneyên kehreronahî dixebite derxîne.

Enerjîya rokê ji hemû enerjîyên din cuda ye û bi paqijbûna ji hemû gemar û ziyanan tê nasîn. Ew jî ji ber xwezaya wê ya tîrêjdarîya kehremegnetîzî ye ku dihêle bibe dahateke dewlemend a ku bi dawî nabe. Ji şeş bilyon sal ve ta niha germahî û enerjîyê dide. Bi tevî ku hîn negihaştiye lutkeya çalakbûna xwe jî, ev

qas berheman dide; ew jî ji ber pêngava şewitîna hîdrojena gelek ku mezintirîn pêkhateyên wê ye, ev yek pêk tê. Encama karlêkbûna nûklerî yên germahî ku ji ber pileyên germahîyê ku digihêjin di navebra (10÷14) milyon pileya sedanî û di navenda rokê de çêdibin, ev enerjîya tîrêjdarî ya kehretîzî ya dirêj derdikeve; ku dirêjahîya mezintirîn pileya wê digihêje 0.75 mîkron. Her wiha leza bayê rokî jî 3 milyon km\s ye. Êdî enerjîya rokê digihêje 4.2 ton di çirkeyekê de. Ev qase bi qasî $1.7\times10^{14}$ kîlowat saetî, an ku bi qasî derdora 2000 carî li pêdivîya mirovî ya enerjîyê. Ev qase salane di roja 5’ê tîrmehê de pir bilind dibe û digihêje $1.7\times10^{17}$ kîlowat saetî; êdî ev qase têra mirovan heyanî salekê dike.

Rok eberjîyê dide û li dû xwe de windabûnekê di baristeya xwe de dihêle; ku bi qasî $\%0.2\times10^{-2}$ ji eslê $2.2\times10^{26}$ ji baristeya rokê ya giştî ye. Ev windabûn wek ku tê dîtin pir kêm û paşguh e. Lewre jî rok dikare bênavber enerjîyê heyanî bilyonên salan bide.



***Jeneretorên ku gemar û qerebalexê li bajarê Qamişlo belav dikin***

Bi tevî ku rok piranîya tîrêjên xwe li ezmana derve winda dike jî û tenê qaseyeke pir piçûk digihêje zemîna me, lê belê dîsa jî em dikarin vê enerjîyê bi

rêbazên cihêreng bi kar bînin, mîna germkerên rokî (borîyên valakirî) yên germkirina avê ku bi qateke tenik ji hin madeyan mîna “Oksîda Gogirdê, Kopalt û Krom” tê boyaxkirin da ku bêtir bikare tîrêja rokê vexwe û hilîne. Ev cûreya boyaxê ji wan re dibêjin “Boyaxên bijarde”. Her wiha bi rengên tarî têne boyaxkirin da ku bêtir enerjîya ku li serê tê hilavêtin, vexwe. Êdî ev karîger xwe li hev digirin da ku taybetîya germkirina hundir bide van borîyan; ew jî bi armanca germkirina avê ye ku ji bo gelek tiştên malê û yên pîşesazî tê bikaranîn, mîna germkirina navendî.

Her wiha û weke ku me anîbû zimên, enerjîya rokê bi rêya şaneyên ku binyada wan sîlîkona nîvmetalî ye û di koka xwe de xûz e û dikare li hember karîgerên hewayî (şaneyên kehreronahî yan jî fotovoltî) li ber xwe bide, veguherîne şiyana kehrebeyî. Aniha jî lêgerîna li madeyin din tê kirin mîna Kadiyûm, Sîlînyum, Kibrîtîda Sifirê û Kibrîtîda Kadiyûmê ku li şûna sîlîkonê be û xwedî taybetmendîyên mezin in.

Enerjîya rokê ne xewnek e ku pê dilên li ruhabûnê digerin, xweş bike, lê rastîyeke ku em îro tê de dijîn e. Pêşketinên ku aniha li dewletên rojavayî pêk tên, li ser pişta vê wizeya berdêl pêk tên; bi tevî ku tîrêja wê li wan deveran kêm e jî. Vaye Almanya mezintirîn makîneya deryayî ya ku li ser enerjîya rokê dixebite pêşkêş dike ku dikare 40000 km bimeşe û heyanî sê rojan bê ku ji rokê tiştekî wergire, di deryayê de bimeşe; çi ku dikare enerjîya rokê di nava baterîyên xwe de hilîne. Her wiha plan hene ku torên girêdanê bi dewletên bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn re çêbikin ku bi rêya wan kehrebeya ji enerjîya rokê hatiye wergirtin, bi rêya kabloyan veguhezînin Ewrûpayê.




Aniha ramaneke nû heye ku êstgeheke kehrerokî ji sîlîkona bêserûber li qûmistana Nîvadayê were avakirin ku şiyana wê digihêje 100 mega watt. Lêçûnên projeyê 150 milyon dolar e, an ku serê her kîlowateke saetî 5.5 sint e. Lêçûna vê yekê bi qasî lêçûna ku ji bo avakirina dara sersalê ya li Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî ya sala 2011’ê hatibû avakirin e.

Balafira Siwêsrî “SOLAR IMPULSE” yekemîn balafir e ku li ser enerjîya rokê dixebite û dikare heyanî bi şevê jî bifire. Heyanî bîst û şeş saetan jî kariye li ezmên bifire û piştre bê pirsgirêk vegeriya erdê. Ev yek dê yekemîn gav be ku pirsgirêkên hewayî yên jîngehê ku ji ber bikaranîna enerjîya genî derdikevin û gihiştiye asteke pir xirab, çareser bike. Tişta ku aniha em bi hemû hestên xwe bi diyardeyên guhartina avhewayê dihisin, di her kêlîyekê de hişyarîyê dide me ku em li guhartinê bigerin û xwe bispêrin alternatîvan. Di lekolîneke nîjen de tê diyarkirin ku bermahîyên Karbondiyoksîdê û gazên din ên ku ji ber tevgera hewayî derdiekvin, heyanî sala 2050’î dê du sê caran bêtir bibin. Ev jimar gelekî metirsîdar e û ji şiyana mirovan mezintir e; ji ber ku germbûna cîhanê bûye xwedî rehendên pir kambax. Tê zanîn ku rêjeya tevgera hewayî di dema me ya niha de ji sedî di navbera 2 û 3 ji tevaya bermahîyên karbondiyoksîdê digire, ku metirsîdartirîn gazên sedema vê germbûnê ye.



***Balafira SOLAR IMPULSE ya ku li ser enerjîya rokê dixebtite***

Kompanîya Brîtanî “Kînîtek” jî balafira “Zîfer” ku ew jî li ser enerjîya rokê dixebite, çêkir. Êdî vê yekê rekord şikand û dikaribû heyanî du hefteyan bê navber li ezman bifire. Bi vê yekê dikaribû di dîroka firînwarîya sivîl de cihekî çêbike û bibe layiqî navê “Balafira Domdar”. Tişta ku xebata enerjîya rokê li ser erdê xurt dike, bawerîyê pê çêdike û bi rêya wê bi çavekî geşbînî li siberojê tê nihêrîn, motorskilêta fransî ye ku 13 hezar km bi rêya tabloyên rokî yên pê ve, dikare bimeşe.

Rojhilata Navîn li cîhanê devera herî dewlemend di enerjîya rokê de ye, an ku wargeha rokê di her demê de ye. Li vê deverê germahî û enerjî ne lawaz dibin û ne jî kêm dibin. Naverasta rojane ya enerjîya rokê li ser her metreyeke çargoşe jê 1000 watt e û li hin cihan jî digihêje 3000 watt'î. Di destpêkê de tu girîngî ji vê stêrkê re nehat dayîn û hate paşguhkirin, her wiha lêkolînên zanistî der barê wê de kêm bûn. Lê aniha û hevdemî alozîya enerjîyê ya heyî, her wiha metirsî û rûbirûbûnên ku mirov û rêbazên wî yên jiyanê li vê deverê dikin armanc û li gor ziwahîyê û kêmbûna ava vexwarinê derketine pêş, cîhana erebî xwe li beramberî rewşeke zehmet û alozîyeke rastîn dibîne. Çi eger zevîyên li Rojhilata Navîn ji sotemenîyê ziwa bibin an ziwa nebin jî, pêdivîya wê bi qaseyên mezin a ava paqij heye da ku bikare erdên ziwa veguherîne erdên çandinîyê û bikare xwarinê pêşkêşî milyonên mirovên di bin gefa birçîbûnê de, bike. Lewre jî enerjîyên ku aniha hene tu sûdê nadin çareserkirina pirsgirêkên ku ji ber rewşa keşûhewayê ya li devera erebî çêbûne. Lewre jî tu çare ji bilî peydakirina rêbazin aborî ji bo şêrînkirina ava deryayê û vejandina alîyên jiyangîr ên din tune ye, ew jî bi rêya bikaranîna enerjîya rokê. Lewre jî ji dewletên Rojhilata Navîn tê xwestin ku bernameyeke pêşketî deynin ku li gorî wê teknolojîya enerjîya rokê li pêş bixin. Mercê biserketina vê yekê jî ew e ku dûrî bîrokratîya serdest û pirsgirêkên rûtînî û rêveberî bin, her wiha kadroyin zanistî yên di vê babetê de pispor amade bibin û destekdayîneke diravî ku têra pêkanîna lêkolînên zanistî yên rastîn bike, were pêşkêşkirin. Lê gava ku jêderên enerjîya berdîneyî ziwa bibin, êdî dê mezêxer û sûdmendên enerjîyê yên li ser asta cîhanê neçar bimînin ku li wizeya berdêl bigerin, ku ew bi xwe di nava destên wan de ye û wargeha wê Rojhilata Navîn bi xwe ye. Lewre jî divê li ber vê yekê bikevin û hêz û şiyana zanistî û teknolojî amade bikin, bi taybetî di qada enerjîya rokê de; da ku siberoja xwe misoger bikin, xwe li beramber metirsîyên derveragirin û wek hêzeke zanistî rola xwe bilîzin. An na, dê statuya xwe, herî kêm bi benên peryrewîya zanistî ve girêdayî bibînin. Lê eger baş ji vê bernameya navborî re plan bikin û di bicihanîna wê de şareza bin û girîngîya wê binasin, dê bikevin nava xweşîyeke mezin de.

## Jêder

1. *Seid Kîlo, Germkirin û sarkirina bi rêya enerjîya rokê, çapa duyem, Şam: 1993.*
2. *Enerjîya Rokê – Malpera Wikipedia.*
3. *Jêderin ji ajansên Amerîkî û Brîtanî.*
4. *Design And Installation Of Solar Heating And Hot Water Systems.J.Richard Williams U.S.A 1980.*
5. *The Passive Solar Energy Book. Edward Mazria Canada 1981.*
6. *The Solar Energy Hand Book (S.E.H.) Dr. KREIDER And*